

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind



Runbêjîyê di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de

AMADEKAR

Hemn Karim M. Salih M. SALIH

14950001079

ŞÊWIRMEND

ALK.DOÇ. Dr. NESÎM SONMEZ

WAN – 2016

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



Hemn Karim M. Salih

14950001079

Ehmed Muxrat Caf'ın Şiirlerinde Söz Sanatları

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2016



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Hemn Karim M.Salih M.Salih tarafından hazırlanan “Runbêjî di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de ” adlı bu çalışma, 16/12/2016 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan (Danışman) : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Yrd. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

Yukarıdaki imzalar, adı geçen öğretim üyelerine aittir.

Prof. Dr. Mutat DEMİREL
Enstitü Müdürü



ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Runbêjyê di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de):

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Hemn Karim M. Salih

16-12-2016

Naverok

Naverok.....	I
Spasî	VII
PÊŞGOTIN	VIII
Kurte:.....	IX
Özet	XII
Abstarct:.....	XV
DESTPÊK	1
BEHSAYEKEMÎN	1
Di Warê Rewanbêjiyê de Destpêkek Giştî.....	1
1- Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rewanbêjiyê.....	1
2- Zanistên Rewanbêjiyê	1
1- Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rewanbêjiyê.....	1
1- Manendin (el-Teşbîh):.....	5
3- Nixman (el-Kînaye),	5
4- Hevtîpî (el- Cînas),	5
5- Sewdarî (el-Sicu'),	5
6- Tewriye,	5
7- Pesndan (el-Medh).”	5
1- Rewanbêjî li Cem Yunaniyan:.....	9
2- Rewanbêjî li Cem Romiyan:	10
3- Rewanbêjî li Cem Ereban:	10
4- Rewanbêjî li Cem Farisan:	11
5- Rewanbêjî li Cem Kurdan:	12
2- Zanistên Rewanbêjiyê:	13
1- Rûnbêjî:	13
2- Watanasî:.....	16
3- Ciwankarî (Ulim el-Bed’î):.....	18
BEHSADUYEMÎN	21
Jiyana Helbestvan Ehmed Muxtar Begî Caf	21

1. Mehmed Paşayê Caf (1846-1920):.....	24
2. Wesman Paşayê Caf (1947-1909):	25
3. Edîle Xanim (1859-1924):.....	25
4. Tayê Begê Caf (1875-1918):.....	26
1. Helbestên Dildariyê:.....	35
2. Helbestên Niştimanî:.....	38
BEŞA YEKEMÎN.....	41
Pênaseyên Manendin û Bingehên Wê	41
Yekemîn:.....	42
Duyemîn:	42
Sêyemîn:.....	46
Çaremîn:	46
Behsa Duyemîn	48
Cureyên Manendinê di Helbesta (Ehmed Muxtar Caf) de	48
Yekemîn:.....	49
1- Hest û Jîrî /.....	49
A / Her Du Alî Hestî Bin:	49
B /Hestê Bi Jîrî:	50
C / Jîrî bi Hestî:.....	50
D / Jîrî bi Jîrî:	51
E / Ji aliyê Hestî û Jîrî ve Wêne:.....	52
1- Hestê Dîtinê:	52
2- Hestê Bihîstinê:	54
3- Hestê Bêhnkirinê:.....	56
4- Hestê Tamkirinê:	58
5- Hestê Destlêdanê:.....	60
2- Bi Pê Sadeyî û Hevedudaniya Her Du Aliyan.....	61
A- Her Du Alî Sade Bin:	61
B- Her Du Alî Hevedudanî Bin:.....	62
C- Sade bi Hevedudanî:.....	63
D- Hevedudanî bi Sade:	64

3- Li Gor Şêwazê Her Du Aliyan:.....	65
A- Manendina Pêçraw (el-Teşbiye el-Melfuf):	66
1- Lêmanendeya Pêçraw a Rêkûpêk:	66
2- Lêmanendeya Pêçraw a Narêkûpêk:	67
B- Manendina Cihê (el-Teşbiye el-Firuq):.....	67
4- Li Gor Hejmara Her Du Aliyan:	69
A- Manendina Text (el-Teşbiye el-Teswiye):	69
B- Manendina Ko (el-Teşbiye el-Cemi'):.....	70
1- Yek Tişt bi Du Tiştan:.....	70
2- Yek Tişt bi Pênc Tiştan:.....	71
Duyemîn:	72
Be Li Gor Hatîn û Nehatina Aliyê Lêkûnê:.....	72
1- Manendina Bikitekit (el-Teşbiye el-Fesil):.....	72
2- Manendina Kurtkirî (el-Teşbiye el-Cemil):.....	73
Sêyemîn:.....	74
Be Li Gor Hatîn û Nehatina DaçekaManendinê: Dibe du beş.....	74
1- ManendinaBerbilaw (el-Teşbiye el-Risal):	74
2- ManendinaXurtkirî (el-Teşbiye el-Wekid):.....	75
Çaremîn:	76
Cureyên Din ên Manendinê:.....	76
1- Manendina Berzî (Teşbîhî Belîx):	76
2- Manendina Wêneyî:.....	77
3- Manendina Awejû/Dij(el-Teşbiye el-Qilub):	78
4- Manendina Pesendîde(el-Teşbiye el-Tefsîl):.....	80
5- Manendina Kurtkirî(el-Teşbiye el-Mecmel):.....	81
6- Manendina Wêne bi Wêneyan:	82
7- Manendina Têkra:.....	83
8- Manendina Di Nav Yek de:.....	84
Behsa Sêyemîn:	84
Girîngiya Manendin û Mebestên Wê di Helbestan de:.....	84
Yekemîn:.....	85

Duyemîn:	86
Sêyemîn:	86
Çaremîn:	87
Pêncemîn:	87
BEŞA DUYEMÎN	89
XAZE (el-MECAZ)	89
Behsa Yekemîn/	89
Yekemîn:PênaseyaXaze/	89
Duyemîn/	92
Binçîneyên Xazeyê:	92
Sêyemîn/	93
Cureyên Xazeyan di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de	93
1/ Xazeya Jîrî (el-Mecaz el-‘Eqlî):	93
2/ Xazeya Zimanî (el-Mecaz el-Lexawî):	95
Xazeya Ziman Du Cure Ye:	95
A/ Xazeya Hinartî (el-Mecaz el-Mirsal),	95
B/ Sparde (el-Îstî‘are)	95
BehsaDuyemîn/	96
1/ Pênaseya Spardeyê: Ji Aliyê Bêje ve/	97
2/Pêkhateyên Sparde:	102
BehsaSêyemîn:	103
Cureyên Spardeyê di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de:	103
Yekemîn/	104
LiGor Her Du Aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):	104
1/ Li Gor Hatin û Nehatina Her Du Aliyan:	104
A/ SpardeyaVekirî (el-Îstî‘are el-Tesrîhe),	104
B/ Spardeya Veşartî (el-Îstî‘are el-Mukniye)	104
1/ Spardeya Rêk (el-Îstî‘are el-Vefaqiye):	105
2/ Spardeya Hewdij (el-Îstî‘are el-Tecadiye):	106
3/ Cureyên Spardeya Vekirî li gor Cureyên Bêjeya Xwastraw:	107
A/ SpardeyaVekirî a Giştî (el-Îstî‘are el-Tesrîhe el-‘Ame):	107

B/ SpardeyaVekirî a Taybet (el-Îstî'are el-Tesrîhe el-Xase):.....	108
B/ SpardeyaGirtî (el-Îstî'are el-Mukaniye):	108
2/ Li Gor Hestî û Jîriya Her Du Aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):	109
Her Du Alî Hestî Bin (el-Îsti'are Mehsûs el-Mehsûs):	110
BehsaÇaremîn:	111
Girîngiya Sparde û Mebestên Wê di Helbestê de:.....	111
BehsaPêncemîn:.....	112
Berawirdkirina Sparde û Manendinê:	113
BEŞA SÊYEMÎN/	116
NIXMAN(el-KÎNAYE)	116
Behsa Yekemîn:	116
Pênaseya Nixman û Binemayên Wê:.....	116
Yekemîn:	116
Pênaseya Nixmanyê.....	116
Duyemîn/	120
130A: Dirkpêkiraw (el-Mikuniye):	120
B:Dirkbokiraw (el-Me'nî 'Ene):.....	121
C:Nîşane (el-Qerîne):.....	121
Behsa Duyemîn:	121
Cureyên Nixman di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de	122
Yekemîn/.....	122
NixmanRengdêrî (el-Kinaye En Sifet).....	122
A/ Nixman di Sifetê Nêzîk de.....	123
B/ Nixman di Sifetê Dûr de:.....	124
Duyemîn/	124
Nixmana Pir-rengdêrî(el-Kinaye 'En Mewsûf):.....	124
A/ Nixmana Pir-Rengdêrî aNêzîk:.....	125
B/ Nixmana Pir-Rengdêrî a Dûr:.....	126
Sêyemîn/.....	127
Nixman di Hevgirî de (el-Kinaye En Nisbet):.....	127
Behsa Sêyemîn	128

Girîngiya Nixman û Mebestên Wê di Helbestê de:.....	129
Behsa Çaremîn:	130
Berawirdî di Navbera Nixman û Xaze de:.....	131
ENCAM:	132
ÇAVKANÎ:.....	135
Qurana Pîroz:.....	135
Çavkaniyên Kurdî:	135
KOVAR:	138
Çavkaniyên Erebî:	139
ÇAVKANİYÊN FARİSÎ:.....	141
ÇAVKANİYÊN KİRMANCÎ:	141
TEZÊN AKADEMÎK:	143
FERHENG:	144

Spasî

Ez wek pêwîstiyekê dizanim spasî li Alk. Doç.Dr. Nesim SÖNMEZ bikim ku di destpêka vê xebatê heta dawiyê wê de, wek şewirmend û serperîşt di hemû waran de alîkariya min kir û di her kend û kospekê de ji min re bû rêxweşker, ta ku bikarim vê xebatê bi şeweyek serkevdiyane encam bidim.

Spas li bav û dayîka xwe a ezîz, hevsera xwe a xoşdivî, kurê xwe ê xweşik û hemû wan kesên ku di vê xebatê de alîkariya min kirine, dikim. Spas li wan mamosteyên ku di dema xwandinê de wane bi min gotine, dikim û bi taybetî spasî li mamoste Feqê Silêman û mamoste Dilawer dikim ku di amadekirin û encamdana vê xebatê de rolekî serekî listin û yarmetiyek êcgar bi min dan.

PÊŞGOTIN

Rûnbêjî di helbesta Ehmed Muxtar Caf de lêkolînek rexneyî a rewanbêjîyê ye. Me di vê lêkolînê de hewl daye em cure û şeweyên rûnbêjîyê ên di helbestên Ehmed Muxtar Caf de hene peyda bikin û rave bikin. Her wiha em hewl didin diyar bikin ku bi giştî bikaranîna hunerên rewanbêjîyê û bi taybetî jî bikaranîna hunerên beşa rûnbêjîyê tenha taybet nîn in bi helbestên kevn û klasîk, belkû wek helbesta klasîk a kurdî û li gel helbesta neteweyên din, di helbesta kurdî a nûjen de jî xwedî erk û rol in û hatine bikaranîn. Bi watayek din helbesta kurdî a nûjen jî ji van hunerane bêpar nîn e. Ehmed Muxtar Caf di her du serdemên klasîk û nûjen de helbest nivîsîne, boye em qala helbesta kevn û nûjen dikin.

Ehmed Muxtar Caf, xwe wek helbestvan tenha di zanista rûnbêjîyê de neceribandîye, belku di çeweya lêkolîn, ravekirin û dahurandina helbestên wî de derdikeve her du zanistên din ên rewanbêjîyê, wate hunera (ciwankarî û watanasî) jî, baş zaniye û di vî warî de jêhatî û serkevî bûye û şiyaye hunerên van her du zanistane jî bi kar bîne. Sînorê lêkolîna me rûnbêjî û her sê hunerên wê, manendin, xaze û sparde û nixman e ku di helbestên kurdî ên Ehmed Muxtar Caf de hatine bikaranîn. Wate helbestên Ehmed Muxtar Caf di çeweya van hunerane de tîrêşîrovekirin û ravekirin.

Hemn Karim M. Salih

Van 2016

Kurte:

“Rûnbêjî di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de” navê vê lêkolînê ye û ev lêkolîne jî li ser zanista rewanbêjî hatiye kirin ku zanista here girîng, diyar û bilav a rûnbêjiyê ye di helbestên Ehmed Muxtar Caf de. Ev zaniste jî her sê hunerên manendin, xaze di nav xazeyê de bi taybetî sparde û huneranixmanê li xwe digire. Her yek ji van hunerane bingehê e ji bo dirustkirina wêneyên hunerî û her wiha ev hunerene di deqên wêjeyî û helbestî de tama helbestbûnê didin van wêneyane. Ehmed Muxtar Cafê helbestvan di helbesta kurdî de hem wek helbestvanek kurd ê klasîk û hem jî wek helbestvanek kurd ê nûjen tê pejirandin. Wate di her du qonaxên kevn û nûjen de xwediyê rol û dewrek girîng e.

Ehmed Muxtar Caf wek kesek zana û têgihîştî ev hunerene piştguh nekirine û di helbestên xwe de bi şêweyek hûr û kûr û hunerane bi kar anîne û bi vî awayî dîwana xwe pê dewlemend, bihêz û bi bandortir kiriye û ev yeke jî bi riya helbestên wî derdikeve, çunke wî bi alîkariya van hunerane gelek wêneyên ciwan, balkêş û nayab di helbestên xwe de dirustkirine.

Ev lêkolîne ji bilî vê pêşekiyê ji destpêkek û sê beşan pêk tê:

Destpêk: Ev yeke dergeh an destpêkek e ji bo çûna nav vê lêkolînê de û her wiha ev lêkolîne ji du behsên serekî pêk tê. Di behsa yekemîn de ku bi navê, Destpêkek di Warê Rewanbêjiyê de bi Giştî, ye, di vir de qala destpêk, têgeh, pênasayên rewanbêjî û bîr û boçûnên rewanbêjnasan hatiye kirin. Her wiha li gel vê yekê her sê cureyên din ên rewanbêjiyê (Watanasî, Rûnbêjî, Ciwankarî) hatine nasandin û li cem yunaniyan, roman, ereban, farisan û kurdan mebest û armanca rewanbêjiyê çî ye, hatiye ravekirin. Di behsa duyemîn de jî qala jiyana Ehmed Muxtar Caf hatiye kirin û tê de qala nav û paşnavên wî hatiye kirin. Her wiha bîr û boçûnên cihê cihê ên di warê jiyana û mirina wî de hene û cihê wî ê di nav wêjeya kurdî de, di qonaxa klasîk û nûjen de kuder e, hatiye bedîkirin.

Beşa Yekemîn: Ev beşe ji sê behsan pêk tê û bi navnîşanên Pênaseya Manendin û Binemayên Wê, Cureyên Manendinê di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de û Girîngiya Manendin û Mebestên Wê di Helbestê de, hatine diyarkirin. Di behsa yekemîn de pênasaya manendinê hatiye kirin û bîr û boçûnên zana û nivîskaran hatine wergirtin û her wiha bi mînakên helbestên Ehmed Muxtar Caf binemayên wê

hunerê hatine arastekirin. Di behsa duyemîn, ku mijara serekî a vê lêkolînê ye, de qala cureyên hunera manendinê tê kirin. Di vir de hewl hatiye dan, di çêweya her çar aliyên manendinê ên ku ji, Li Gor Her Du Aliyan (Manende-Lêmanende), Hat û Nehatina Hêla manendeê, Li Gor Hat û Nahatina DaçekaManendinê û Cureyên din ên Manendinê, pêk tên, bi pê nimûneyên helbestên Ehmed Muxtar Caf hemû cureyên manendinê bêne bikaranîn, ku ji bîstan zêdetir in. Di behsa dawîn de jî qala girîngiya manendin û mebestên wê di helbestê de, tê kirin. Di vê behsê de jî bi riya nimûneyên helbestên Ehmed Muxtar Caf çend girîngî û rolên hunera manendinê hatine nîşandan û rûnkirin.

Beşa Duyemîn: Ev beşe jî ji pênc behsan pêk tê, di behsa yekemîn de pênaseya xaze û binemayên wê û cureyên wê digire ku ji xazeya zimanî û xazeya jîrî pêk tê û her wiha ji bo van binema û cureyane nimûneyên helbestan hatine bikaranîn; di behsa duyemîn de bi riya nimûneyên helbestan pênaseya sparde wek beşek berbiçav a xazeya zimanî li gel destnîşankirina binemayên wê, hatiye arastekirin; di behsa sêyemîn de, ku behsa here girîng a beşa duyemîn e, qala sparde û cureyên wê hatiye kirin û ev curene bi riya helbestên Ehmed Muxtar Caf hatine bercestekirin û li gor her du aliyan (boxwastraw-lêxwastraw) hatine dabeşkirin û her wiha di helbestên Ehmed Muxtar Caf de nêzîkî yanzde cureyên hunera spardeyê hatine diyarkirin; di behsa çaremîn de ku bi navê, Girîngiya Sparde û Mebestên Wê di Helbestê de, hatiye darijtin, qala girîngî û mebestên hunera spardeyê dike. Ev hunere ji bo dirustkirina wêneyên hunerî ên pir binirx û qîmet di nav rewanbêjî û rûnbêjîyê de wek diyartirîn, bihêztirîn huner hatiye destnîşankirin; di behsa pêncemîn de jî her du hunerên sparde û manendinê, ku hunerên rûnbêjîyê ên xwedî rol û bandor in, hatine berawirdkirin û ciyawazî û lêkçûnên wan hatine destnîşankirin.

Beşa Sêyemîn: Ev beşe beşa dawîn a lêkolînê ye û ji çar behsan pêk tê. Behsa yekemîn ji bo pênase û bîr û boçûnên ku di warê hunera nixman û binemayên wê de hene, hatiye terxankirin; di behsa duyemîn de qala cureyên hunera nixman di helbestên Ehmed Muxtar Caf de tê kirin ku pêk tên ji, nixman di sifet de, nixman di xûd de, nixman di hevgerî de; di behsa sêyemîn de, rol û girîngiya hunera nixman di helbestê de, hatiye destnîşankirin; di behsa çaremîn de jî her du hunerên nixman û xaze hatine berawirdkirin û ciyawazî û lêkçûnên wan hatine diyarkirin.

Di dawiya lêkolînê de jî komelek encam hatine bidestxistin ku ji naveroka lêkolînê hatine derxistin û bedîkirin. Paşan jî ew çavkanî û jêderên ku di lêkolînê de hatine bikaranîn û sûd jê hatine wergirtin, hatine nivîsîn û bercestekirin.



Özet

Bu çalışma “Ehmed Muxrat Caf’ın Şiirlerinde Söz Sanatları” adıyla yapılmış ve söz sanatları bilimi üzerinedir. Bu bilim Ehmed Muxrat Caf’ın şiirlerinde hem çok büyük bir öneme sahip, hem çok ön plandadır, hem de geniş bir alanı kaplamaktadır. Bu bilim teşbih, istiare ve kinaye adlı söz sanatlarını kapsamaktadır. Bu söz sanatlarının her biri şiirlerde sanatsal yada edebi bir manzara veya çerçeve oluşturmanın yanısıra şiir ve edebiyata sanatsal bir tat kazandırmaktadır. Ehmed Muxrat Caf bir Kürt şairi olarak hem klasik dönemin hem de çağdaş dönemin şairi kabul edilmektedir. Başka bir deyişle hem eski, hem yeni dönemde büyük bir etki yaratmış ve önemli bir rol oynamıştır.

Ehmed Muxrat Caf bir bilim adamı, kültürlü ve bilge biri olarak bu sanatı kulak ardı etmemiş, şiirlerinde ince, ayrıntılı ve sanatsal bir şekilde kullanarak şiirlerini zenginleştirmiş, daha güçlü ve etkili yapmıştır. Bu özellikler şiirlerinde de kendini göstermektedir, çünkü bu söz sanatlarının yardımıyla güzel, dikkat çekici ve eşsiz manzaralar resm etmiş şiirlerinde.

Bu çalışma önsöz, giriş ve üç bölümden oluşmaktadır:

Giriş: Bu bölüm araştırılan konunun içine girilen kısımdır ve kendi içinde iki alt bölüme ayrılmaktadır. Birinci alt bölüm Söz Sanatları Hakkında Genel Bir Giriş adlı başlık altında incelenmektedir. Bu başlık altında giriş, kavramlar, söz sanatlarıyla ilgili tanımlar ve söz sanatları üzerine çalışanların fikirleri hakkında bilgi verilmiştir. Aynı zamanda bu bölümde söz sanatlarının diğer üç bölümü olan (Anlam Bilgisi, Beyan Sanatı ve Güzel Sanatlar)’ın da tanımı yapılmış, haklarında bilgi verilmiştir ve Yunanlılarda, Rumlarda, Araplarda, Faraslarda ve Kürtlerde söz sanatlarının amaçlarının ne olduğu açıklanmıştır. İkinci alt bölümde ise Ehmed Muxtar Caf’ın hayatı, adı ve lakabı hakkında bilgi verilmiş; onun hayatı ve ölümü ile ilgili varolan farklı yaklaşımlar ve onun klasik ve çağdaş Kürt Edebeyatı’ndaki yeri ile ilgili bilgiler verilmiş.

Birinci Bölüm: Bu bölüm üç alt bölüme ayrılmaktadır ve bu alt bölümler de; Teşbihin Tanımı ve Temel Yapıları, Ehmed Muxtar Caf’ın Şiirlerinde Teşbih Çeşitleri ve Şiirde Teşbihin Önemi ve Amaçları adlı başlıklardan meydana gelmektedir. Teşbihin Tanımı ve Temel Yapıları adlı bölümde, teşbihin tanımı

yapılmış, bu konu üzerine çalışanların fikirleri ve düşünceleri alınmış. Ayrıca Ehmed Muxtar Caf'ın Şiir örnekleriyle bu sanatın temel yapıları açıklanmaya çalışılmıştır.

Bu çalışmanın temel konusu olan Ehmed Muxtar Caf'ın Şiirlerinde Teşbih Çeşitleri adlı bölümde teşbih sanatının çeşitlerinden bahsedilmektedir. Bu bölümde Ehmed Muxtar Caf'ın şiir örnekleriyle yirmiden fazla olan teşbih çeşitleri, teşbihin benzeyen, benzetilen, benzetme yönü ve benzetme edatı çerçevesinde gösterilmeye çalışılmıştır. Şiirde Teşbihin Önemi ve Amaçları adlı bölümde ise teşbihin şiirdeki önemi ve amaçlarından bahsedilmektedir. Bu bölümde de Ehmed Muxtar Caf'ın şiir örnekleriyle teşbih sanatının önemi ve görevleri gösterilmeye çalışılmıştır.

İkinci Bölüm: Bu bölüm beş alt bölümden oluşmaktadır. Birinci alt bölüm mecaz, mecazın temel yapıları ve çeşitlerini, dil mecazı (el-mecaz el-lugat) ve behremecazı (el-mecaz el-'eqlî), kapsamaktadır. Ayrıca bu temel yapılar ve çeşitler şiir örnekleriyle gösterilmiştir. İkinci alt bölümde ise şiir örnekleriyle istiare sanatı ve dil istiariesaçıklanmaya ve tanımlanmaya çalışılmıştır. Üçüncü alt bölümde sparde sanatı ve onun çeşitlerinden bahsedilmekte ve Ehmed Muxtar Caf'ın şiir örnekleriyle somutlaştırılmaktadırlar. Ayrıca benzeyen ve benzetilenegöre iki bölüme ayrılıyorlar ve Ehmed Muxtar Caf'ın şiirlerinde sparde sanatının yaklaşık onbir çeşit tesbit edilmiştir. İstiare Sanatının Şiirde Önemi ve Amaçları başlığını taşıyan dördüncü alt bölümde istiariesanatının öneminden ve amaçlarından bahsedilmektedir. Bu sanat, söz sanatları içinde şiirlerde çok değerli ve sanatsal anlamlar oluşturan en güçlü ve en önde gelen sanat olarak kabul edilmektedir.

Beşinci alt bölümde ise beyan söz sanatının en önemli ve en etkili sanatları olan istiare ve teşbih sanatları karşılaştırılmış ve farklılıkları ve benzerlikleri belirlenmiştir. Üçüncü Bölüm: Bu bölüm bu çalışmanın son bölümüdür, dört alt bölümden oluşmaktadır. Birinci alt bölüm kinaye sanatı ve onun temel yapılarına ile ilgili var olan tanım ve değerlendirmelere ayrılmıştır. İkinci alt bölümde Ehmed Muxtar Caf'ın şiirlerindeki kinaye sanatının çeşitleri olan sıfat kinayesi, vesf kinayesi ve nisbet kinayelerinden bahsedilmektedir. Üçüncü alt bölümde kinaye sanatının şiirdeki rolü ve önemi belirlenmiştir. Dördüncü alt bölümde ise kinaye ve istiare sanatları karşılaştırılmış, farklılıkları ve benzerlikleri ortaya konulmuştur.

Bu alıřmanın sonunda bazı sonuçlar elde edilmiř ve yazılmıřtır. Daha sonra da yararlanılan kaynaklar sıralanmıřtır.



Abstract:

Fluency in poems of (AHMAD MUKHTAR JAFF) is the title of the study of the most important, phenomenal and popular science of rhetoric. This science includes the three important parts of figure of speech (simile, metaphor and Metonymy). Each on of this parts plays an important role in forming images in literatures texts and specifically poems. Ahmad mukhtar is known as the poet of two stages of literature (classic and new stage), which using this figures in his poems is very precisely and frequently which he used them with a lot of experience. Clues for this is that he has formed a lot of images in his poems.

This study is divided into three chapters with an introduction:

Introduction:

This chapter is an access to the very study. It is made of two essential parts. In the first part, a study of rhetorical analysis in general is done which talks about the beginning, items, the definitions and the opinions of the researchers about rhetoric discussed, Also with explaining the three parts of rhetoric (semantics, fluency and beautification) and the study of rhetoric in ancient Greeks, the romans and Arabic and Persian then in Kurdish literature with explanation of its aim and meaning is done. In the second part biography of Ahmad Mukhtar Jaff is explained, which shed light on the biography of Ahmad Mukhtar and his nicknames, also the different thoughts about the history of his date of birth and death is discussed. And his message in literature that shows to which stage he belongs to is explained.

Chapter one:

This chapter includes three subjects which are the definition of Simile and its essence, its types in his poems and last one is the importance of Simile. In the first subject the definition of simile, the opinion of researchers and writers is discussed with explaining it's essential by giving examples. In the second part which is the most important part of the study which studies the types of Simile in detail by giving a lot of examples about it which is divided in to four kinds according to the two aspects (alike and likened) with their characteristics with the other types of Simile that by giving more than twenty types of this artistic with examples explained. In the

last part the importance of Simile and its meanings can be seen, in this part importance and roles of Simile by giving examples is explained.

Chapter two:

This chapter is divided into five subjects. In the first: the definition of Metaphor, its origins and its types which are the Metaphor of language and the Metaphor of logic with examples is discussed. In the second subject definition of Metaphor and as a part of Metaphor of language is explained with its types by giving examples. In the third subject which is the most important part of the chapter, the study of eleven types of Metaphor in Ahmad Mukhtar's poems is explained according to the two parts of (the tenor and the vehicle). In the fourth subject which is the importance of Metaphor and its meanings in Kurdish texts, some guidelines of importance and meanings of Metaphor is discussed and as the most powerful and phenomenal figure of rhetoric and fluency is named for forming images. In the fifth subject the comparisons and differentiation of both Metaphor and Simile discussed.

Chapter three:

This is the last portion of the study which is divided into four subjects: the first subject is about the definition and opinions about Metonymy and its origins. In the second subject the types of Metonymy which are the Metonymy of characteristics, the Metonymy of personification and Metonymy of relative is explained. In the third subject the role and the importance of Metonymy in poems is explained. In the fourth subject the similarities and contrast of Metaphor and Metonymy explained.

Finally:

In the end of the study we came up with the aim of the study, and the sources with links can be seen at the end of the study.

DESTPÊK

BEHSAYEKEMÎN

Di Warê Rewanbêjiyê de Destpêkek Giştî

1- Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rewanbêjiyê

2- Zanistên Rewanbêjiyê

1- Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rewanbêjiyê

Sereta, di destpêka baskirina rewanbêjiyê de em dikarin çend bîr û boçûn û pênaseyên cur bi cur ên di warê rewanbêjiyê de ne diyar bikin. Yekemîn Zanista Rewanbêjî.

Rewanbêjî, yanî bilêvkirina wata û mebestê bi peyvên herikbar û guncav ji bo rewşa pêwîst a kesê ku jêre hatiye gotin. Pênaseya rewanbêjî bi vî awayî mebesta şîretkirinê a wî kurdî ye ku ji kurê xwe re gotinên herikbar dike û jêre dibêje: “Axavtinê bêjingê bide, bîbêje, bîwêje?. Wate eger te xwast tu bi axivî, dibe axivtina te, wek çawa genimî di serî de bêjing dikî ji bo ku genim pak û paqij be da li aş bidî û bikî ard, bi heman awayî dibe gotin jî pêş ku bête bilivkirin û ji dev derkeve, dibe bête pak û paqijkirin, ji bo ku gotin bişayan, ciwan û guncav be. Li cem kurdan gotin bi vî awayî ye. Gotina herikbar û rewan her di kon de li cem kurdan bûye mebest, wate rewanbêjî li bal kurdan her di wêjeya folklorîk de heta niha heye.”¹

“Wêjeya kurdî di asta yekemîn de folklorê kurdî ye.”² Tiştê di vir de şayanî gotinê ye, di vê pênaseyê de bo me derdikeve dibe her cure amajekirin û gotinek bi şêweyê rewanbêjî be, darijtina wê bi peyvên pak, ron û aşkira be û têngiştina wê asan be û her wiha li ser ziman şîrîn be, alozî û tewlihevî tê de nebe û bêgirûz be, ji peywên rêzimanî û peywên zîndî pêk were.

¹ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 11.

² Ebdulsalam Salar, *Hunerî Rewanbêjî le Şîrî Nalî de*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatîye Weşandin), 2010, 27.

Hunera rewanbêjî, wate hunera bikaranîna bêjeyan. Her ji vir ve em dikarin bibêjin hunera bêjtin yan hunera rewanbêjîpêktê ji; “Hunera ciwanbêjî (gotarsazî). Ji kesekê hat pirsîn wata û mercê rewanbêjî çî ye? Got: Bilindahiya bejnûbal û panbûna dev û şevîlke û dengê mezin û bilind; wate paniya dev û şevîlke rê xweş dikin, ji bo ku gotin û bilêvkin ron, aşkera û diyar bin. Dengên mezin û bilind jî alîkariya vê yekê dikin ku deng bigehe bîster an guhdaran.

Her wiha em dikarin hunera rewanbêjiyê wiha jî pêname bikin; ku hunera pêşxistina deng û gotinê ye û hunera bilêvkirina kurahiya giyanê ye. Bi livandina ziman û hêma bi giştî di yek demê de ji bo bidestxistina têgihîştin û bandorkirinê li guhdar û bîner.”³

Di vir de derdikeve rewanbêjî ew hunere ye, ji bo ku bêjeyên pak û bêgirûz ji yê din cihê bike, hewl dide xwe ji wan çewtiyên di wata û peyvan de derdikevin, biparêze. Her wiha destpêka zanista rewanbêjiyê; wek zanistên din, huner, bîrokeyên felsefî û metafîzîkî û di gelek warên din de, wedigere ji bo serdema yunanan, ku di nivîsarên Erîsto de ber çav dikeve. Her wiha rêkxistin, komkirin jî her ji aliyê Erîsto ve hatiye kirin.

Dibe ev jî bê gotin, rewanbêjî; “Wek hunerê ye, ji bo dahênana gotaran, paşan jî ji bo hemû bilêvkirinek zimanî sûd jê hatiye wergirtin. Tenanet rewanbêjî wisa lêhatiye bi hevbeşî li gel hunerên din ên helbestvaniyê de şiyaye di nav hemû wêjeyê de cî bigire.”⁴

Rewanbêjî ji aliyê zimanevanî ve: “Têgeha rewanbêjî yek ji wan têgehe diyar û aşkerane ye pê rexney edebî, têgehek e em dikarin bibêjin di kevn û niha de pêkhatyek hunerî û bingehek helbestê bûye. Dîroka vê têgehê gelek kevn e û her wiha gelek pê çûye ta bi vê wataya, ku niha di çavkaniyên belaxatê de heye, biçespe an birûne. Bêjeya belaxeyê bi çend watayek û bi çend şîretekê hatiye û ev kurte guftûgoye li ser bêjeya belaxeyê ye di ziman de. Her wiha hatiye hewildan bêjeya belaxe zêdetir bi ferhengiyane bête arastekirin.”⁵ Xetîbê Qezwînî Yişîr di pirtûka El-

³ Samî Ebdalhamîd-Bedrî Hesun Ferîd, (W.:Zahîr Mahmud Koy), *Hunerî Rewanbêjî-Watasazî*, Hewlêr, 2007, 8.

⁴ Îdrîs Ebdula, *Ciwankariy Şîrî Klasîkî Kurdî*, SaziyaVekolînan a Mukiryar, Hewlêr, 2012, 9.

⁵ Merîwan Husên Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayî da*, (Teza Lîsansa Bilind), Silêmanî, 2015, 5.

Telxîs de, di pênaseya rewanbêjî de dibêje: “Rewanbêjî wate di gotinê de guncandina li gel dem û gava axavtinê ye. Li gel ravekirina watayan de rewanbêjî wedigere ji bo wan derbirînên ku di gel bêjeyek din de watayê didin dest.”⁶

Rewanbêjî di zimanê kurdî de li gor ferhenga Xal tê wataya (Ciwanî û rewanî di nivîsîn û giftûgoyê de). Ev yeke jî nîşan dide ji aliyê zimanewanî ve a baştir ew e em peyva rewanbêjî li hember peyva El-Belaxeya erebî bikar bînin. Her wiha li gor ferhenga Hembaneya Borîne peyvael-fesahe erebî di zimanê kurdî de tête wataya; her tiştek ku di dema birêveçûnê de ji nişka ve rawestîne wê nebe, rehwanîya hespan, xwandina herikbar...hwd. Wate di her sê zimanên kurdî, erebî û farisî de peyvên fesahet û belaxet, ji aliyê zimanewanî û bêjeyî ve hemwata û hevbeş in û ji bo rûnkirina gotin û nehiştina şêlûbûnê di nivîsîn û axavtinê de tên bikaranîn.”⁷

Di warê mebest û nêrînên rewanbêjî de, di wêjeya ingilîzî de, piştî hewlek mezin bo me derket, ku du têgeh ji bo rewanbêjîyê hatine bikaranîn ew jî têgehên; Figure of Speech û Rhetoric in û her wiha her cureyek ji wan bi serbixweyî û cihê hatiye û wek rewanbêjîya erebî nehatine komkirin.

Em dikarin di wêjeya kurdî de destpêka praktîzekirin an nerîtdandina rewanbêjî û hunerên wê di wêjeya klasîk a kurdî diyar bikin, çunke helbestwanên kurd ên klasîk di wê serdemê de bi riya wêjeya erebî ji rewanbêjî û hunerên wê agahdarbûn.

Eger di kurmanciya jorîn de Melayê Cizîrî, di kurmanciya xwarê de jî Nalî, di warê vê hunerê de, di wêjeya kurdî de wek nawend hatibine nasîn û wisa jî bîr pejirandin, bo me di helbestên wan de derdikeve ku wan agahdariyek baş û zanabûnek gelek baş di warê vê hunerê de hebûye. Çunke van helbestwanan di warê wêjeya erebî û farisî de xwediyê şarezaiyê baş bûne. Her wiha lêkolîn û keşîfkirina hunera rewanbêjî û anîna çend helbestekan di vî warê de, ji aliyên nivîskarên wê serdemê ve, wek xebatên pir bi nîrx hatine dîtin, ku her niha jî me wek kesên diyar ên destpêka wêjeya kurdî danane, wek; Şêx Nûrî Şêx Salih, Eladîn Secadî, Ezîz Gerdî, Kamîl Besîr û xebatên Mamoste yanî Mûderîs Mela Ebdulkerîm, Fatîh Ebdulkerîm û Mihemedê Mela Kerîm ji dîwana helbestwanan. Her wiha li piştî

⁶ Telxîf El-Fetah El-Qazwîni, *Şerh El-Rîqûqî*, Qahîre, 1940, 33.

⁷ h.ç., 8.

raperînê jî di warê rewanbêjiyê de çend tezek ji lîsansa bilind û diktorayê ku hejmara wan hindî hejmara tiliyên destan e, hatine nivîsîn û tîn dîtin. Min jî wek pêwîst zanî, li gor erk û şiyana lêkolînek wêjeyî, ez li ser vê mijarê vekolîne bikim.

Têgeha rewanbêjî, di ferhenga El-Mencî de jî bi wan watayana tê bikaranîn: “Bikaranîna peyvê an gotinê di cihê xwe de, tê wataya zanîna hunera axavtin, bibandorbûn û bawerpêkirinê, bilêvkirinekî rasteqîne ye, an arastekirina mebestekê ye bi şêwek ciwan. Ev têgehe di zimanê kurdî de bêjeyek hevedudanî ye, ji (rewan + bêj + î) pêkhatiyê. Peyva (rewan) tê wataya rewanî yanî herikbarî, ji aliyê wata ve li hember peyva paqiz diweste. Peyva (bêj) ji rega çawiga (gotinê) ye û di gel paşgira (-î) de û (rewanbêj) ji pola rengdêran e û ji bo pola navan weguheziye, (rewanbêjî).”⁸

“Di derbarê pênase û mebesta têgeha rewanbêjî de, gelek bîr û boçûnên ji hev cihê hene, ku her yek ji wan bo gav û wextekê wedigere an em dibînin her nivîskarek li çavê xwe lê dinihêre û pênase dike an di gel gelek têgehên din de tîkel bûye û ji wan nayê cihêkirin, ew jî ev in: Fesaet, beraet, beyan, hunera helbestê û hunera axavtinê.”⁹ Ebû Hilal El-Esrî jî dibêje: “Rewanbêjî hemû ew tiştên ku watayan radigihînin, guhdar bi wan tiştan bi dilê xwe, di deruniya xwe de bi şêweyek baş wêneyek pesend pê dirust dike.”¹⁰

Di vir de eve derdikeve holê, “Ziman bi bandortirîn pêkhate ye, ji bo diyarkirina rewanbêjiyê. Eger em di derwazeya hunera axavtinê de biçine jûr, dibe em yek ji van stunên here girîng ên wê derwazeyê binasin, ew jî peyv e. Ca dibe peyvên wisa bêne bikaranîn ku di asta wê yekê de be, sûd û mebesta axavtinê bigihîne û di hevokê de cihê xwe bigire û cîgir be.

Ji bo vê mebestê eger zanyariyên wiha ên zanistî di rewanbêjiyê de hebin û ji bo karên hunerî girîn û sûdmend bin ew jî ev in:

⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 23.

⁹ Rokan Gurîl Şîa, *Hunerekanî Rewanbêjî le Şîrî Folklorî Kurdî*, (Teza Lîsansa Bilind), Silêmanî, 2014, 11.

¹⁰ Ebû Hilal el-‘Esrî, *Kîtab el-Sîne ‘teyn*, Çapxaneyaya Heya, Qahîre, 1952, 10.

1- Manendin (el-Teşbîh):

Dibe di vir de peyvên wisa bên bikaranîn, bi hemû awayakî xizmeta mebestan bike. Wek bibêjî;

To bihêz î wek piling û şêr...

2- Xaze (el-Mejaz),

3- Nixman (el-Kînaye),

4- Hevtîpî (el- Cînas),

5- Sewdarî (el-Sicu’),

6- Tewriye,

7- Pesndan (el-Medh).”¹¹

Mebest û nêrînên rewanbêjî: Ezîz Gerdî jî di warê rewanbêjiyê de dibêje: “Her axavtinek tê kirin an tê nivîsîn dikeve jêr alaya rewanbêjiyê de û deng vedide ji bo ku biçê guhê guhdar û guhdarî ji aliyê hest û soz ve bixête jêr bandorê de ku a bêjer e. Eger wisa nebe rewan nîn e û ji coş û dilxweşiyek mezin serhilnedaye.”¹²

Rewanbêjî, yek ji wan mijarên edebî ye, ku nivîskar û helbestwan wê bi kar tînin ta ku xeyal û hestên xwe di qalibek ciwan û guncaw de bi riya hevokan derbibirin û tenanet gava kesek guhdar dike bi bihîstina wan xeyal û wan hestan, ku bi riya peyvên xemilandî ên bi bandor hatine darijtin û eger tamê jê werbigire, bizanin ew berhem ji aliyê ziman ve hêja ye. Di gel wê yekê de her gelekê wataya rewanbêjiyê bi şêweyek çiyawaz pênasekiriye. (Ebû Usman El-Cahz 255’ê koçî) miriye, zanayê rewanbêjiya erebî ye û xwedanê her du pirtûkên (El-Beyan û El-Tebyîf) û (El-Hiwan) di vî warî de dibêje: “Rewanbêjî li bal farsan zanîna demê axavtin, rawestan û berdewambûnê ye. Li bal yunaniyan rastkirina çewtiyan e. Li cem rûman kurtkirin e yan dirêjepêdana axavtinêye li gor kesê/a ku axavtinê dike. Li cema hîndiyan aşkerayiya mebest, dirustkirana derfetê ye û amajepêdan e ji bo ciwaniyê. Yanî her gelekê girîngî daye aliyekî raewanbêjiyê. Farisan girîngî daye

¹¹ Samî Ebdulhemîd – Bedrî Hesun Ferîd, *Hunerî Rewanbêjî Watasazî*, (W.:Zahîr Mehmûd Koy), Hewlêr, 2007, 26.

¹² Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda-Rûnbêjî – el-Beyan* (Teza Lîsanasa Bilind), I, Bexdad, 1972, 17.

dem û gavên axavtinê, yunaniyan girîngî daye rastiya watayan, rûman girîngî daye wê yekê axavtin di cih û demê xwe de bête kirin, hîndiyan jî girîngî daye aşkerabûn û bilêvkirina wataya ciwan.”¹³

“Rewanbêjî di hemû wêjeyekê de, wate di wêjeya hemû gelekê de heye. Her çende ewe heye û zimanê nivîsînê ye û em mînakan digorin, eger na gewhera zanyariyan her yek e û wek her zanyariyekî din destpêka ji bo aliyê yunaniyan, çunke yunanî di wêjeyê de xwediyê pileyek bilind in.”¹⁴

Di warê rewanbêjîyê de Dilşad Elî sedema wan nêrînên çewt ên ku di wêjê û rexnegiriya wêjeya kurdî de li hember rewanbêjîyê heye, digêrîne û dibêje: “Di warê dahênana helbestê de hemû ew hunerên rewanbêjî bi giştî û hunerên rûnbêjî bi taybetî ku bi xwe jî bingeha binyatdanana wêneyê helbestê ne, hîç wextekê ji zimanê helbestê nepiçiyane û wêne her bi xwe jî zimanê helbestê berceste dikin, lê belê bi wî çavî li rewanbêjîyê tê temaşekirin, ku bes hunera xemilandinê ye û erka wê tenha erkekî ciwankarî a rût e û bi xwe jî zanistekî ziman û wêjeya erebî ye û ji ziman û wêjeya kurdî re xerîb e. Rewanbêjî bila zanistek erebî be, lê belê wek huner di nav zimanê gelan de heye. Ev nêrînên çewt ên ku gelek car bi enqest bûne û neşarezayî û nezanîna nivîskar a di warê rewanbêjîyê de pê hatiye dapoşîn, bûye sedema wê yekê ku lêkolînên di warê zanista rewanbêjîyê de bi giştî lawaz û nezanistî bin. Her wiha ew çend xebatên kêr ên li ser rewanbêjîyê hatine kirin jî, diyar in.”¹⁵

“Di serdema yunaniyan de hêdî hêdî ew hunerên (rewanbêjî) hatine destnîşankirin, bi saya wê gotar ji sadeyîbûnê rizgar dibe û nivîsarên wêjeyî jê berhem tî, jê dirust dibin. Di destpêkê de li cem yunaniyan rewanbêjî wek hunerekê ji bo dahênana gotaran bi kar dihat. Paşan ji bo hemû derbirîn û bilêvkirinekî zimanî ji vê zanistê sûd hat wergirtin. Tenanet ji wê jî zêdetir, wisa lê hat rewanbêjîyê şîya wek hewbeşîbûn di gel hunerên din ên helbestê de di nav hemû wêjeyê cî bigire, an bilav bibe. Paşan ev hunere hêdî hêdî berfireh bû û bû xwedanê gelek hunerên ji hev cihê, ku her yek ji wan ji bo dahênanê, binema û destûrên xwe ên taybet hebûn. Ji ber wê yekê jî wisa lê hat çî kesên siyasî, dînî û çî kesên gotaran dixwînin, şanoyan

¹³ Merîwan Husên Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayî da*, (Teza Lîsansa Bilind), Silêmanî, 2015, 9.

¹⁴ Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rewanbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyasedekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 51.

¹⁵ Serdar Ehmed Gerdî, *Binyadî Wêney Hunerî le Şîrî Kurdîda (1970-1991)*, Silêmanî, 2004, 55.

dinivîsînin û çî kesên helbestwan in, kê m an zêde nekarîn xwe ji hunerên rewanbêjîyê dûr bigirin û bi bê wan hunerane mijarek pir bi bandor û bi hêz pêşkeş bikin.”¹⁶

Rewanbêjî, pêk tê ji kurbûnê bêyî ku kêmasî tê de hebe, pêk tê ji dirêjî bêyî ku zêdeyî tê de hebe. Em dikarin vê pênaseyê ji bo rewanbêjîyê diyar bikin, ev pênaseye felsefeya hemû dahênanekî zimanî derdixe holê an berbiçav dike. Di wêjeya kurdî de (Ebdulqahir Circanî 471 koçî) zanay mezin ê ereb di pirtûka (Dla’l El-Îcaz) de ciyawaziyê di navbera (mesahe û belaxe) yê de nake û wiha basî dike: “Ji aliyê axavtinê ve, ciyawazî di navbera wegêran de heye, hin ji wegêran ew tiştên ku di dilê wan de ne dikarin ciwantir weguhezî ji bo kesê li hemberê xwe. Vî cure wegerandinê re jî ziman paqij (rûnbêjî-rewanbêjî) tê gotin.”¹⁷

Di pirtûka Cewaher El-Belaxe de tê gotin: “Rewanbêjî bi pê peyvên pak û dirust derbirîna wataya bilind û aşkera ye ji bo ku bandora wê li ser derûnê hebe. Ev pênaseye yek ji wan pênaseyane ye ku gelek nêzik bûye ji mebest û armanca rewanbêjîyê, lê belê di vir de pirsyar ev e; gelo wataya bilind û aşkera heye û pêwîst e helbestwan lê bigere û bibêje, an helbestwan kesê dirustker e û paşan bi peyvên dirust û pak bilêvkerê watayên nû ye. Paşan cureyê rewanbêjîyê a ku bi bandor e li ser derûnê, bi wê wataya ku li pişt derbirîna wataya bilind e, diyar nîn e.”¹⁸ Her wiha Eledîn Secadî jî di pirtûka xwe a bi navê Xoş Xwanî de wiha pênaseya rewanbêjîyê dike: “Rewanbêjî pêk tê ji bilêvkirina komek gotinên berfireh ên di qalibên çend peyvekî kê m de.”¹⁹

Yekemîn kesê ku qala rewanbêjîyê kiriye, Arîsto bû, wî jî di her du pirtûkên xwe ên (Hunera Şîr û Hunera Bêjeriyê) de bas kiriye. Dema Arîsto hat nivîsarên wêjeyî û siyasî ên serdemên xwe wekolî (Şanoname û Xîtabe) jê re peydabûn û ji van nivîsaran sîd wergirt ta ku hunerên rewanbêjîyê bihêztir û ciwantir bibin. Her wiha piştî Arîsto, Horasê yunanî hat û wî jî di pirtûka xwe bi navê Hunera Şîr de bal kêşa ser girîngiya hunerên rewanbêjîyê, piştî van ereb hatin û yek ji van (Fera) û Cahz,

¹⁶ Îdrîs Ebdûla, *Ciwankarî le Şîrî Kurdîda*, Çapa 1., 2012, 9.

¹⁷ Ebdalqahir el-Circanî, *Dla’l el-Îcaz*, (Tehqîq: Mihemed Reşîd Riza), Qahîre, 1372 Hicrî, 35.

¹⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi*, Silêmanî, 2014, 24.

¹⁹ Eladîn Secadî, *Xoş Xwanî (Guzarekarî, Xoş Xwanî, Xoş Ciwanî, Riwanî)*, Çapxaneya Mearif a Baxdayê, 1978, 7.

(Sekakî), Ebû Ubeydê kurê Musena... û dehan kesên din girîngî dane hunera rewanbêjîyê. Wate bi riya zanista rewanbêjîyê bo me zîrekî, hostayî û şarezabûna helbestwanên me derdikeve, her wiha em dikarin di warê zanista rewanbêjîyê de hemû zanistên din ên rewanbêjîyê diyar bikin û nivîsarên helbestên xwe ciwantir û têr û teseltir binirxînin.

Rewanbêjî zanistek gelek berfireh e û di wêjeya hemû cîhan û zimanê wêjeyên biyanî de jî hebûye. Ew hunere zêdetir hatiye pêşxistin û her wek di wêjeya kurdî de hatiye baskirin û her wiha Îdrîs Abdula di pirtuka; Ciwankarî le Edebî Kurdî da, di sala 2003'yan de nivîsiye. Ji bilî wan jî hin tezên doktora û tezên lîsansa bilind di vî warî de hatine nivîsîn û lêkolîn li ser hatine kirin û her wiha di kovarên kurdî de jî girîngî pê hatiye dan. Tenanet her di destpêkê de ew wêneyên helbestane ên di helbestan de hatine bi hev re girêdayî bûn û wê yekê; "Zêdetir xwe di çeweya rewanbêjîyê de dîtiye, lê belê wek tewgerek edebî di destpêka sedsala bîstan de ber bi qonaxek zanistî ve pêngav avêtiye û peywendiyên wê berfireh bûne. Berfirehbûna peywendiyên jî di encama wan pîvanên rexnegir ên ku tiştên nihênî di hundirê cîhana nivîsan de peydakirin, bû."²⁰

Her wiha em dikarin hunera rewanbêjîyê wek hunera pêşxistina deng, bilêvkirin û derbirîna kurahiya giyanê bizanin. Rewanbêjî di yek gavê de liwandina ziman û hêmayê ye, ji bo ku guhdar û bîner têbigihe, di bin bandorê de bimîne an bandor lê bê kirin. Cudahiya di navbera axavtina rewanbêjîyê de ew e; ku a yekemîn pêk tê ji çewtî û xeletiyên, axavtinên çewt, bilez û xelet; lê belê a duyemîn rêk û pêk e, paqij e, hatiye çerxkirin wate rûn e û têgihiştina wê ciwantir û paqijtir e. Her wiha hunera rewanbêjî di pêkhatiya helbestê de rolek serekî û bi bandor digêrîne an dibîne. "Ji aliyekî din ve ji bo ku li pey karê rewanbêjîyê bikevin, hinek ji çavkaniyan li ser wê yekê hemfikir in, ku cudahiyeke hin zêde di navbera rewanbêjî û wênekêş de nîn e, tenha eve nebe; wênekêş ji bo balkêşana bîner pişt bi reng û şeweyê dibeste. Eger ev jê bîn derxistin her du her wek yek in. Wênekêş dema bixaze nîgarekê bikêşe an dirust bike, bîr li rengên guncaw dike, ku wisa bin bandorê li hestên bîner bike; lê belê rewanbêjî gava bixaze helbestekê yan gotarekê binivîse, bîr li beşên wan dike û paşan pena dibe li ber wan peyvên ku bi asanî ber guh dikevin

²⁰ Ebdulqadir Mihemed Emîn, *Wêney Şîrî le Rêbazî Romansî Kurdî de*, Silêmanî, 2002, 6.

û bandorê li kesê hember dikin. Ev yeke jî derdixe ji bo wan beşên rewanbêjî, peyv, wata dirustkirin, pêdana hêz û karîgeriyê ciwanî ye.”²¹

Dîroka rewanbêjiyê li cem gelan: Bingeha rewanbêjiyê wek zanistekê ji bo xwezaya mirov wedigere. Hemû mirov bi hemû kevneşopî, çand, zayend û zimanên ciyawaz li her goşeyek vê cîhanê de dema bixaze bi şêweyek bi bandor gotinekê bike, neçarê hunera rewanbêjiyê dibe. Yanî “Rewanbêjî rêk eve ye; axavtin û watayê li xwe bigire, gotinê hilibijêre û awazxweş be û bi şêweyekî wisa be peyv li gel peyvê wekhev be.”²² Rewanbêjî di ziman û wêjeya hemû neteweyekê de tê dîtîn. Ji bo ku em bikarin zêdetir li ser bingeha rewanbêjiyê biaxivin, dibe em wegerin bo layê yunan û roman:

1- Rewanbêjî li Cem Yunaniyan:

“Li gor wan zanyariyên heta niha li ber destan in, sereta û destpêka vê zanistê jî her wek gelek ji wan zanist û hunerên din bo yunaniyan wedigere. Li pêş zayîne nêzîkê sedsala 5’an, ku hikûmet û dewletdarî nêzîkî demokrasî û komariyê bû. Kesên xwazyar û ên xwediyê pile û payeyên bilind ji dil ve xwe bi nîqaş û gotûbêjên siyasî ve mijûl dikirin. Di vê qonaxê de serketin û serfirazî a wan kesan bû, ku bikarin bi rewanbêjiyek bi hêz û bi zimanzanînek mezin bipeyvin û bi vî awayî li hember dijberên xwe serkevtî bin. Di vî warî de hunera wata û rewanbêjiyê xwediyê cihekî bi nirx bû. Komek feylesofên yunanî ên ku wek komek sofistîkî tên hesibandin, peyda bû û: Piştî vê koma sofistîkî fêrgeh û dem û dezgahên gotûbêjiyê xistin jêr deshilatdariya xwe û piştî serketina yunaniyan li hember farisan û rizgarbûna welatê wan, rewanbêjiya gotûbêjiyê bû pêdawîstiyekî netewî. Her di van şert û mercane de komek rewşenbîrên mezin peyda bûn û meydana nîqaş û rexneyan xweşkirin û serkêşiya fêrkirina rewanbêjiyê girtin destê xwe ku ev kome bi navê koma sofistîkiyan tê zanîn.”²³

²¹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 27.

²² el-Bilanî Elbî el-‘Ebas Mihemed Bîn Yezîd el-Berd-Remezani Ebdultewab, *Seqafe El-Dîniyê*, Weşanxaneya Qahîre, Misir, Çapa 2., 1995, 6.

²³ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 17.

2- Rewanbêjî li Cem Romiyan:

“Di sedsalên yekemîn û duyemîn ên pêş zayînê de, ji ber ku destura rewanbêjîyê pêwîstî bi hunera rewanbêjîyê hebû, li Romayê girîngiyek mezin hatiye pêdan. Sîsron (piştî z. 24) komek binema û yasa ji bo gotarên rewanbêjiya dana, ku piştî hingî ji aliyê feylesofê romî Sînka (piştî z. 65) ve hatin redkirin, lê belê paşan feylesof û wêjenasek bi navê Markos Kwênt Îlya (piştî z. 95) ji bo pesendkirina bîr û boçûnên Sîsron û bersivdana rexneyên Sînka xebatek ku ji danzde bergan pêk tê û navê wê *Rewanbêjî Çawa Bête Fêrkin*, nivîsî, lê belê piştî wî heta destpêka ronensansê hat piştguh xistin û paşan dubare lê wegeriyan.”²⁴

3- Rewanbêjî li Cem Ereban:

“Bêguman pêştir bi şeweyek xemilandî pêşkeşkirina gotinan xwediye nirxekê bû û li bal xelkê gotinên ciwan û gotinên ku dihatin pêşkeşkirin zêdetir girîng û pesend bûn. Hunera rewanbêjîyê di nav ereban de cihek taybet û diyar hebû û xwedî nirxbû. Gotarên bi hunera rewanbêjîyê hatine nivîsîn wek karên şanazî û behremendane hatine hesibandin. Di pêş hatina îslamê de hinek êkolên edebî hebûn, ji van; Zehr û Binyeyê girîngî dane wêjeyê û bi taybetî jî helbestê, li gel hinek nîşe, rexne û rewanbêjî di warê helbest û helbestvanan de, di bazarên edebî de. Her çend e ev nîşene girîng jî bûn, lê dîsa jî wek zanistekê nayên pejirandin.”²⁵

Di wêjeya erebî de an li cem ereban hunera rewanbêjîyê gelek girîng e û li bal wan geşe daye û di encama têkelbûna ereban li gel çend neteweyekî din de, di nav çend ziman û eryanêkî din de bilav bûye û roj bi roj zêdetir hatiye nasîn û berfirehtir bûye. Her wiha li gel hatina îslamiyetê rewanbêjiya erebî pêşkêtiye û bi taybet di Quran û gotinên Pêxember de bi aşkere hunera rewanbêjîyê heye û diyar e. “Li gel hatina Qurana pîroz, di rewanbêjiya erebî de guhertin derkete holê, çunke hest pê kirin şewazê nivîsên Quranê çiyawaz in. Her kesekê guh li ayetên Quranê girtiba ji ber rewanbêjiya wan sersam dibû. Ji vana Umerê Kurê Xetab dema serdana xwîşka xwe kir û guh li xwandina Quranê kir, pê sersam bû û vê yekê jî wisa kir ereb hest bi wê yekê bikin ku zimanê wan guheriye. Gelek ji hunerên rewanbêjîyê di Quranê de

²⁴ h.ç., 19.

²⁵ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 19.

hatin peydakirin û têgihîştî ku dibe girîngiyê pê bidin. Di sedsala duyemîn a koçî de, ji bo têgihîştina wataya ayetan û diyarkirina cureyên rewanbêjiyê, çendeha lêkolîn li ser Quranê hatin kirin.”²⁶ Em dikarin bibêjin wan di sedsala sêyemîn a koçî de zêdetir girîngî daye rewanbêjiyê û rewanbêjiyê pêşketin û bilavbûnek berbiçav nîşandaye. Rewş û tewgerêkî felsefî serhildaye û girîngiyek mezin daye hunera rewanbêjiyê, ku ew jî dibin du kom; yek ji wan li pey erebên kon ên Sifre ketin û yekê jî felsefeya yunaniyan ji xwe re kire pîvan ji bo nirxandina wêjeya erebî. Di wê demê de, di navbera wan her du komên ku xwediyê bîr û boçûnên ji hev cihê ne de, bi zimanê erebî çendeha lêkolîn li ser rewanbêjiyê hatin kirin. Her ji vir ve em dikarin bibêjin derketina hunera rewanbêjiyê li cem ereban ji sê tiştan dirust bûye.

4- Rewanbêjî li Cem Farisan:

Wek şarezayî di warê rewanbêjiya farisî de, ew berhemên li ser rewanbêjiyê hatine nivîsîn, didin zanîn, ku hindêk hunerên rewanbêjiyê ji zimanê erebî ve hatine wergirtin û di zimanê farisî de pêşketine. ((Ew helbestên di sedsalên yekemîn, duyemîn û sêyemîn ên koçî de bi zimanên Êranî gihiştine ber dest û li ser pirtûka kîteyî ne, hinek ji wan bê serwa ne û yê din jî serwadar in.)) Ev helbestene heta sedsala sêyemîn a koçî bi vî awayî berdewam bûn û piştî ku Êran ji aliyê misilmanan ve hat dagîrkirin, helbest ber bi arasteyek din ve çû. Helbestê di wêjeya farisî de ta dawiya sedsala çaremîn û destpêka sedsala pêncemîn hîç girîngiyek bi zanista rewanbêjiyê nedaye, an hîç lêkolînek li ser vî mijarê nehatiye kirin. Tenê çend helbestvanek nebin ku di wê serdemê de hunera (Manendin)ê bikar dianîn, ew jî bi saya çavlêkirina ereban bû, ku çavkaniyê wê jî Qurana pîroz bû. Her wiha yekemîn pirtûka ku bi navê rewanbêjiyê ketiye destê me, wedigere bo sedsala şeşem a koçî û navê wê jî Tercumani El-Belaxe ez Mihemed Bîn Umer Raduyani) û êdî bi vî awayî zanista rewanbêjiyê geşe daye û ji sedsala heftem, heştem û ta dawiya sedsala danzdeyê zanista rewanbêjiyê pêşketinek yekjar serkevtî û berfireh bi dest xistiye û mijarên wê bi şeweyê zanista edebî û hunera rewanbêjiyê ta radeyek baş ber bi pêş ve çûne. “Şarezaiya helbestvanê wêjeya farisî di warê cureyên hunera çûwandinê de, di sedsalên çaremîn û pêncemîn de gelek baş bû û ji helbestvanên din zêdetir hevî

²⁶Mihemed Rebi’, *‘Ilûm el-Belaxe el-‘Erebîye*, Weşanxaneya Fikir, Urdin, Çapa 1., 2007, 40.-41.

dane pêkhatayên çûwandînên xwe ji cîhana der ve werbigirin. Ji ber vê yekê çûwandînên wan zêdetir çûwandînên hestî û têkel bûn.”²⁷

Wêjeya farisî di sedsala danzde û dawiya wê de girîngiyek mezin da helbesta farisî û her wiha girîngî da rewanbêjiya farisî li ser vê yekê jî pirtûkên bi navên: (Usulê El-Ulmê Belaxat, Der Zibanê Farisî, Xulam Hiseyn-Biyânî Mihemed Ulwî Miqedem) nivîsîn.

5- Rewanbêjî li Cem Kurdan:

Wek hemû zanistên din ên edebî, di zimanê kurdî de jêderka hunera rewanbêjiyê jî her dîsa folklorê kurdî ye. Bi taybetî eger em li gotinên pêşiyên ên kurdî binêrin, emê bibînin bi çend peyvekan tewger û çalakiyên vî gelî pê derdikevin holê. Her wiha bi çend peyvên pir watayî, serpêhatiyên dûr û dirêj jî hatine tomar kirin û tenanet ji bo ku rewanbêjî di warê têgihiştina ziman de alîkariya wan bike, ji rewanbêjiyê sûd jî wergirtine.”²⁸ Her wiha di dîroka wêjeya kurdî de, Eladîn Secadî bi mebesta şîretkirinê di gotinek pêşiyên akurdî de dibêje: “Gotinê bîgêje, bîbêje, bîwêje.”²⁹ Dema em bi hûr û kûr li hunera rewanbêjiyê dinêrin, em dibînin ku ev hunere tenha bi wêjeyê ve têkildar nîne, belkî hunerek e hemû ziman tê de hevpar in. Kurdan jî wek her gel û neteweyekê, li gor wan taybetmendiyan ku di vî zimanî de tên bikaranîn, cihê xwe di vê hunerê de kiriye. Ji bo vê yekê jî em dikarin folklor û beşên wek biwêj, çîrok, helbest, efsane û gelek tiştên din nîşan bidin. Her wiha edîb û helbestvanên me gelek jêhatî û zîrek in û şiyar helbestên xwe bi vê hunerê bixemilînin.”³⁰ Helbestvanên mezin ên wek Xanî, Cizîrî, Nalî, Salim, Mewlewî, Mehwî, Ehmed Muxtar Caf û ... hwd. di zanista rewanbêjiyê de bandorek mezin hebûn û tenanet ev helbestvanene mela û zanayên zîrek bûn, di warê wêjeya farisî û helbestvanên farisî û ereb de xwediyê şarazayiyek gelek baş bûn. Vê yekê wisa kiriye ku wan şarazayiyek baş di warê pêşxistina hunera rewanbêjiyê de hebe.

²⁷ Ebdul Selam Salar, *Hunerî Rewanbêjî le Şîrî Nalî da*, 24.

²⁸ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 23.

²⁹ Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 118.

³⁰ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr 2013, 7.

Di wêjeya kurdî de peydabûna hunera rewanbêjîyê karek hin asan nebûye, boye ji bo vê yekê pêwîstî bi betilîn û kedek gelek mezin hebûye û vê yekê xebatek pir bi nirx xwastiye. Her wek me got ev hunere di folklorê kurdî de bi riya gotinên pêşiyên û biwêjan bi şeweyek pir ciwan hatiye bercestekirin û berbiçavkirin. Her dîsa di wêjeya klasîk a kurdî de jî helbestvanan, ji ber ku ew di derheqê wêjeya rojhelat, faris, ereb û bi taybetî jî di warê Qurana pîroz de xwediyê zanist û zanyariyan bûn, şiyar berhemên xwe bi hunera rewanbêjîyê ciwantir bikin, ta ku xwîner zêdetir tamê ji berhemên wan werbigirin. Helbestvanên kurd jî wek helbestvanên gelên din hunerên rewanbêjîyê ji bo bilêvkirin û pêşkeşkirina bîr, hest û reseniya xwe bi kar anîne, hemû ew wêneyên dilrakêş û balkêş bi hunerên rewanbêjîyê berceste kirine.

2- Zanistên Rewanbêjîyê:

Rewanbêjî wek zanistekê di nav xwe de, di ser sê beşên serekî de dabeş dibe û her yekê jî erk û cureyên taybet bi xwe ve hene. 1- Rûnbêjî, 2- Watanasî, 3- Ciwankarî

1- Rûnbêjî:

Navê beşek lêkolîna me, (Rûnbêjî di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de) ye. Yek ji taybetmendiyên helbesta klasîk ew bû; gelek girîngî dida hunera rewanbêjî û bi taybetî jî hunera rûnbêjîyê, boye wan huneran di nivîsarên helbestî de zêdetir û ciwantir rengvedan. Ji aliyekî din ve ramanên nivîsaran derxistin holê, ku vê yekê zirxê nemiriyê li helbesta klasîk a kurdî kir. Vê diyardeyê jî wek rastiyeke di helbestên Ehmed Muxtar Caf de reng vedaye û gelek nivîskar û rexnegir jî ji vê yekê re şahid in. Boye me wek pêwîstiyekê zanî em mijara (Rûnbêjî di Helbestên Ehmed Muxtar de) bikin bingeha lêkolîna xwe. Gelek pênase û lêkdaneve ji bo wata û têgeha vê zanistê hatine kirin. “Di zanista rewanbêjîyê a kevin de, ji her sê beşên watanasî, rûnbêjî û ciwankariyê re rûnbêjî hatiye gotin. Di vir de bi mebesta navlêkirina giştî ji bo hemûyan navê beşek ji wan hatiye bikaranîn, lê belê paşan rûnbêjî wek watanasî û ciwankariyê wek beşek ji rewanbêjîyê hat destnîşankirin û çend hunerek din ên girîng li xwe girtin, ew jî; Manendin, Xaze û Nixman ye, her

wiha hunera sparde jî, ku niha wek diyartirîn, girîngtirîn û bi hêztirîn huner tê hesibandin, hunera rûnbêjîyê ye.”³¹

Rûnbêjî çalaktirîn beşa rewanbêjîyê ye û rolek diyar û bandorker di bingeha wêneyê helbestê de dibîne û ji wan têgehan e, ku ji wataya wêneyê nêzîk dibe; boye helbestvanan di hemû serdeman de her tim girîngî pê dane û bi kar anîne û kirine alav an amûrek ji bo ku mebestên xwe bigihînin xwîneran. Wate ew zaniste ye, ku çendîn riyên ji hev cihê ne, bi yek watayê bo me derdibire û li ser wataya ku mebest e jî ji me re zanyariyan dide û di vê pênaseyê de; “Rûnbêjî wek zanist, li ser çend bingehan dirustbûye û hewl dide bi riyên cur bi cur, ên ku hinek ji hinekan rûntir û aşkeratir in, takewatayê bilêvbikin.”³² Her wiha em dikarin bibêjin rûnbêjî ew amûre ye ku ew nepeniya li ser watayan heye jê dibe û ew mebestên ku hen aşkira dike, an mebest ew binema û bingehene ne, ku ji bo zanîna takewatayê bi çend şewazên cur bi cur tê bikaranîn, wek binemayên; Manendin, Xaze an Sparde û Nixman.

“Rûnbêjî diyartirîn û girîngtirîn zanista rewanbêjîyê ye, çunke hunerên rewanbêjîyê, ku ji xaze/sparde, nixman û manendinê pêk tên, pêkhateyên here kevin ên wê hunerê ne û her wiha ev pêkhatene ne di helbestê de bingeha wêneyên hunerî dadirêjin. Wê jî wek zanista rewanbêjîyê, di warê têgeh û pênaseyê de çend bîr û boçûn hene.”³³ “Rûnbêjî mijareke gelek berfireh e û rola wê ew e, hemû ew perdeyên li ser gotinan de hatine kêşandin, rabike û wataya wan rayêxe ber çavan, yan bîr û baweriyekê li xwe digire û wan berbiçav dike, heta ku guhdar an xwendewan bikare bigihe bingeh, binema û mebestên wan, ji bo ku têbigihe.”³⁴ Her wiha rûnbêjîyê di helbestê de ji bo kêşan an dirustkirina wêne rolek mezin heye û di warê berhemana helbestê de jî xwediyê peywirek berdewam e, ji xwe hemû hunerên rewanbêjî û rûnbêjîyê jî binema û bingehên helbestê ne û hîç wextekê ji zimanê helbestê danabirên û her wêne bixwe jî zimanê helbestî berbiçav dikin. Ji ber ku rola hunerên rewanbêjîyê ewqas zêde dibe, di hin cihan de hunerên rûnbêjîyê li gel têgeha wêne de têkel dibin. Wataya têgeha Ulim El-Beyanî; ev e: “Mebest û armanca, bi

³¹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 31.

³² Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 118.

³³ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 26.

³⁴ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda - Rûnbêjî – el-Beyan* (Teza Lîsansa Bilind), I, Bexdad, 1972, 18.

ciwantirîn gotûbêj an bilêvkirinên rewan derdixe û radigihîne û di warê axavtinê de jî tê wataya têgihiştin û zîrekiyê.”³⁵

Her wiha di Qurana pîroz de jî qala rewanbêjîyê hatiye kirin û girîngî pê hatiye dan û di suretê El-Rehman (Rehman) de derketiye. “El-Rehman ulim el-Quran xaliq el-insan ulme el-beyan.”³⁶ (wataya vê ayetê bi kurdî binivîse.) Her wiha di El-Wazi’ fî belaxe el-erebiye de bi vî awayî pênaseya rûnbêjîyê tê kirin: “Komek rê û rêbazan e, ku tê de bilêvkirina yek watayê bi çend riyên cur bi cur dide destê me.”³⁷ Her wiha Şêx Ebdulkerîm ku xwedanê pirtûka El-Tebîyan e, di pirtûka xwe a bi navê El-Graz de, di derbarê pênaseya rûnbêjîyê de bîr û boçûnên xwe wiha derdibire: “Wênekirina rasteqîneya tiştêkê ye û wisa li te dike, heçko tiştêk e û tu temaşe dikî. Her wiha di vê pênaseyê de Ebdulkerîm dibêje; rola serekî a rûnbêjîyê kêşana wêne û pişandana mijarên ku nayên hestkirin e. Wate em dikarin bibêjin rûnbêjî diyartirîn û bihêztirîn zanista rewanbêjîyê ye jî komek rê û rêbazên hatine diyarkirin, pêk tê û her wiha jî ber sedema ku her sê hunerên manendin, sparde û nixmanyê li xwe digire, şarezayên rewanbêjîyê li ser wan rêkevtine û ev hunerene jî di pêştir û niha de bûne hêvên û hêmana dirustkirina wêneyê hunerî, her wek S.Dî. Luis dibêje: ‘Wesif, xaze û lêkçûn wêne dirust dikin.’”³⁸

Tiştê di vir de bo me derdikeve ev e, em dibînin zanista rewanbêjîyê jî çend bingehan pêk tê, ku rêxweşker e jî bo rakirina perdeyê li ser wata û mebestê. Wate girîngiya vê zanistê ev e; bi riya binemayên rewanbêjîyê, manendin, xaze, nixman, hûrgilî tên aşkirakirin. Li gor vê pênaseyê, ev wataya hunerî a jî bo ragihandin, diyarkirina mebest û wataya di nav dil de ye, derbirîneke herikbar e. Her di vê pênaseyê de eve jî bo me derdikeve, rûnbêjî wek zanist, têgeheke giştî û kurt e. Hemû van mijaran li xwe digire ku ragihandina wan bi şeweyên cur bi cur in. EbûYaqûb El-Sikakî, ku xwedanê pirtûka Miftah El-Ulum e, yekemîn kes e zanista rewanbêjîyê dabeş kiriye bi ser rûnbêjî û watanasiyê de. Dabeşkirina ciwankariya axavtina ku bi ser wata û bilêvkirinê de dabeş dike, wiha pênase dike: “Anîna tenha yek watayê bi çend riyên cur bi cur, her wiha jî bo rûnkirina zêdetir a wan watayane

³⁵ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 26.

³⁶ Suretê El-Rehman, Ayeta 1.2.3.4.

³⁷ Mihemed el-Rizqan el-Ferh, *el-Wazi’ fî Belaxe el-Erebiye (el-Ma’ni – el-Bedî’ – el-Beyan)*, 18.

³⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 33.

bi pê pênaseya El-Sikakî, rûnbêjî ji bo ku bi riyên ji hev cihê, bi şêwazek ciwan nepeniyên bêje, wata û mebestan aşkira û rûn bike, wan hemû riyên cur bi cur dide ber xwe.”³⁹

Her wiha Ezîz Gerdî jî wiha qala rûnbêjîyê dike: “Hemû wan tiştan li xwe digire ku perde li ser gotinan radikî û gotinan radixin ber çavan, yan bîr û baweriyekê li xwe digirin û wê derdixin holê, da ku guhdar an xwandekar bikare xwe bigihîne bingeh û binyata mebestan û ji wan têbigihe.”⁴⁰ Li gor vê pênaseyê “Rûnbêjî aşkirakirina wataya weşartî û rûnkirina mebesta helbestvan û nivîskaran e ji bo xwendekar an ji bo guhdar bixwe. Li gor me jî rûnbêjî, bingeh û binemayek e, ji bo rûnkirin, aşkirakirin û diyarkirina wata, mebest û her wiha çend şêwazeke cur bi cur ên çend riyên ciyawaz, nek her sê hunerên, lêmanende, xaze û nixman, li xwe digire. Eger girîngiya watanasîne pitir be, ciwankarî xemilandina bêjeyê be, yek ji cureyên rûnbêjîyê têkelbûn e li gel her duyan û zêdetir jî. Rûnbêjî zanistek e, yarî li gel watayê dike, bi çend şêwazên bêjeyên ciyawaz, wate em dikarin di yek wêneyê de ji ber sedema beşên rûnbêjîyê çend wêneyên din bigirin.”⁴¹

Eger em nivîstekek hunerî a pir e li edeba rûnbêjîyê, binêrin; “Em dibînin ji çend bêjeyan pêk hatiye ku ev bêjeyene tenha wataya rastewxo û sade ranagihînin, belkû ew bêjeye ne ku nûbûn û xestîbûna rûnbêjîya li gel de hatiye û wan bêjeyan du alî hene, bi riya rûnbêjîyê bi şert û mercên rewanbêjîyê, bilêvkirina wata û mebestê bi şêweyên cur bi cur û ciyawaz. Her wiha bêje ji aliyê soz, bîr, hest û şêwazek nazik ve dibe xwedanê wêne û rûxsarekî ciwan û balkêş.”⁴²

2- Watanasî:

Bêjeya watanasî, bêjeyek hevedudanî ye, ji bêjeya (wata) û rega çawiga (nasîn) û paşgira darêjer (-î) yê pêk tê û pêk ve wataya; nasîna watayê û têgihîştina watayê radigihînin. Zanayên rewanbêjîyê girîngiyek mezin dayne zanista watanasîyê, çunke nek nivîskar û helbestvanan belkû her cure nivîskarekî ku di warê wêjeyê de nivîsiye, pêwîst bi vê zanistê bûye. Ji bo darijtina nivîsek wêjeyî, yekemîn kesê ku

³⁹ h.ç, 26.

⁴⁰ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 18.

⁴¹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 33.

⁴² Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 171.

bingeha watanasiyê danaye Ebdulqadir El-Cirmanî ye, ku di sala 471'an a koçî de çûye ser dilovaniya xwe. Komelek bîr û boçûn û pênase hen di warê têgeha watanasî de ku wiha dibêjin: “Watanasî zanistek e, bi pê pêwîstiya şiwên û asta kesê/a ku jê re hatiye vegotin, ji bo nasîna gotin û ragihandinê di warê rewan û derbirînê de li ser çend bingehan damezraye. Eger em bi hûr û kûr li vê pênaseyê binêrin, emê bibînin her ev her du têgehene ne di gotinên pêşyan de hatine û radigihînin; heta gotinê nebêjî, nerêjî.”⁴³ an di nivîsarên wêjeya kurdî de wek Eladîn Secadî dibêje: “Axavtinê bigêje, bibêje û biwêje.”⁴⁴

Di ciheke din de jî di warê pênaseya zanista rewanbêjiyê de tê gotin: “Zanista nasîna şert û mercên gotinan e, ku tê de derbirîn tîstî destnîşankirin. Her wiha çavdêrî li mebesta rewanbêjiyan dike, ji bo ku mebesta watayê û hemwatayên wê rabigihîne, an ew wataya ku mebest e û radigihîne, vedikole.”⁴⁵ Her wiha zanayan gelek nîqaş û gotûbêj li ser vê zanistê kirine û rawe kirine. Emê di vir de, di vî warê de bîr û boçûnên hin zanayan bixin ber destan, wek; Ebdulezîz Etîq ku şarezayê rewanbêjiyê ye û di pirtûka *Fî El-Belaxe El-Erebiye Ulim El-Me'anî* de, di pênaseya watanasî de dibêje: “Rûnkirin û guncandina gotinê ye li gel şert û mercên guhdar û ew cihê ku gotin tê de tê kirin û her wiha alikariya mirovan dide, ji bo ku di dema axavtinê de xwe ji çewtiyan biparêzin û ew yeke jî bi alikariya rengdêran tê kirin.”⁴⁶

Her wiha Ezîz Gerdî jî di warê zanista watanasî de pênaseyekê dike û dibêje watanasî: “Ew beşe ye ku erka lêkolînkirina watayê werdigire stûyê xwe, peywendiya di navbera bêje û watayê de derdixe holê, bersiva hinek pirsan dide ku peywendiyên wan bi wata, armanc, peyam û bandora bêje, hevok û axavtinê ve heye. Her bêjeyek bête bikaranîn, gelo di kîjan cihê de baştir e, paş û pêşkirina bêjeyan çawan bandorê li hevokê dike û hevokê diguhere û zextê lê dike. Her wiha ji bilî wataya dirust û berbiçav çi watayek din radigihîne û çi ravekirinek din digire ser xwe? Gelo bêje kurt bin baştir e?, Gelo ew hevoka ku çewt e, li gel şert û mercên

⁴³ h.ç., 17.

⁴⁴ Eladîn Secadî, *Deqekanî Edebî Kurdî*, 159.

⁴⁵ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 35.

⁴⁶ Ebdulezîz Etîq, *Fî El-Belaxe El-Erebiye (Ulim El-Me'anî)*, Çapa 1., Weşanxaneya Beyrût, Lubnan, 2009, 37.

guhdarî diguncê an na?, Hevok, ji bo ku mebesta axêver bi tawawî rabigihînin, di kîderê de bi hev re bèn nivîsîn, di kîderê de ji hev bèn qutkirin?”⁴⁷

Li cem kurdan jî watanasî: Zanisteke ku tê de şiyar û sînorên ziman şîrove dike û di şert û mercên ciyawaz de sûdê jê werdigire ji bo rûnkirina mijarê, bi wî şertî, axavtin li gor daxwaz û hêviyên xwandekar an guhdarî bin û guncav be li gel şiwên û dema axavtinê û her wiha gelek ji zanayan hevbîr in ku zanista watanasî dabeş dibe ser çend babetekê de, wek; El-Xeber/hewal, El-Înşa/Darijtin, El-Temena/Xwazge, El-Texsîs/Pîşandan û Handan, El-Qisir/Kurtbirî, El-Fesil û El-Wesil/Ji Hev Cihêkirin û Girêdan, El-Necaz El-Îtnab/Kurtbirî û Dirêjbirî, El-Sena/Danepîşt.”⁴⁸

Tiştê di vir de wek pêwîst dizanim ku basî bikim ev e; zanista watanasiyê jî aliyê şiyaw, neşiyaw û guncandina wê a li gel rewş û asta kesê ku jê re hatiye gotin, giyanê hestpêkirina watayê ye. Di pênaseyek din de jî dîktor Şimîsa dibêje: “Watanasî di bingeha xwe de taybete bi hunera axavtin û hunera gotûbêjê ve. Li gor vê pênaseyê watanasî her di dema derketî heta niha de, ji bo axavtin û bandorkirin li ser guhdarî, hatiye bikaranîn û paşan bi mercekê, bandora wê hebe li ser bingeş û karê xwe û bi vî awayî bûye zanistek li rê û rêbazên nivîsînê.”⁴⁹ Her di cihek din de jî di warê hunera watanasiyê de tê gotin: “Hunerek e ji hunerên rewanbêjiyê û nivîskar û helbestvanan ta radeyekê girîngiyek diyar û pir pê daye û her wiha ji ber wî şêwazê guherîna ku di hevokê de berceste dibe, peywest e bi hevokê ve û her wiha ji aliyê kurtbirî, dirêjbirî û bi yekgihandina pêkhatayan, ku bi şêweyekê axêver bikare mebest û derûna xwe li hember guhdarî derdibire.”⁵⁰ rol dibîne.

3- Ciwankarî (Ulim El-Bedî’):

Ciwankarî beşek girîng a rewanbêjiyê ye. Di erebî de ji vê yekê re (Bera’e El-Mutli’) û (Bera’e El-Îstîhlal) jî tê gotin. Yek ji van hunerên ciwan ê here girîng ev e; helbestvan bi niv hevokê kurt û asan dest bi hevoka yekemîn dike, ku hîç fişar li xwekirin tê de nebe û ji aliyê watayê ve rûn û aşkira be. Di hevokên piştê tîn de,

⁴⁷ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda-Watanasî*, Çapa 3., Çapxaneya Kakey Felah, Silêmanî, 1979, 8.

⁴⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 36.

⁴⁹ Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015, 28.

⁵⁰ h.ç., 36.

serbixwe dibe, lê belê bi amaje nek bi şêweyek raste rast, mebesta helbestvan di nîqaşkirina helbestê de li xwe digire û dibe bêje li gel wan mijarên ku basî dikin, guncav bin.”⁵¹

Tê gotin, hunera ciwankariyê di zanista rewanbêjiyê de yekeyek here diyar û ber bi çav e û eger her du zanistên rewanbêjiyê; watanasî û rûnbêjî, girîngî bi asta wata, ciwaniya wata û wataya nû biden, ciwankarî jî wate xebatkirin e li ser asta ruxsar, wataya peywê û xemilandina peywê. Di van cureyane de; “Ciwaniya rêk û pêkbûna axêver derdikeve û diyar e ev yeke jî di wê gavê de dibe, gava ku li gel çawaniya deman de tê berawirdkirin. Her wiha dibe ev yeke jî bêtê berçavkirin, dibe ev peyw û hevokene bi şêwazek aşkira û bêalozî, wate bi watayek rewan û aşkira, li gel derdbirînê de yeklayî bibin û li yek biçin.”⁵² El-Bedi’ Ciwankarî: Ew zaniste ye, piştî ku li gel şert û mercên pêwîst ên guhdar û xwîner tê guncandin, ji bo nasîna ciwaniya bêje û watayê tê bikaranîn.”⁵³

Tiştê ku di vir de ez wek pêwîstiyekê dizanim qala wê bikim ew e; kurd jî li gor taybetmendiyên zimanê xwe ji vê hunerê bêpar nemaye û gotin û nivîsînên xwe pê xemilandine. Bi taybetî helbestvanên destrengîn ên di serdemên pêşiya me de, ku gelek bi şarezaiyane û pisporane li derê vê hunerê dane û çûne nav vê hunerê de, desteyek gulên bedew ên peywên helbestên ciwan û pirwata jê re danan, bêyî ku bibetilin an kêmasiyek di wata û mebestên wan de peyda bibe. Ciwankarî di helbest, pexşan û hemû mijarên din ên edebî de gelek girîng e û dibe gelek nirxdar be li cem nivîskar û helbestvanên me.

“Zanayek girîng ê rewanbêjiya erebî, Ebû Hîlal El-Esrî 395’ê hîcrî, dibêje; eger di gotin û derbirînê de xwebetilandin û kêmasî nebe, wate eve baştirîn cureyê ciwankariyê ye.”⁵⁴ Her wiha di derbarê vê zanistê de Ezîz Gerdî dibêje: “Ciwankarî bi şêweyek giştî qala wan regez û têgehane dike, ku aliyê hunerî ciwanî ê wêjeyê rave dikin.”⁵⁵ Di Qurana pîroz de jî her bi heman wataya nû a dahênane hatiye û dema ku gotin an axavtin dête ser şîyan û desthilatdariya Xwedayê mezin û mîhreban, Xweda

⁵¹ Idrîs Ebdulla, *Ciwankarî Şîrî Klasîkî Kurdî*, Çapa 1., Hewlêr, 2012, 81.

⁵² h.ç., 33.

⁵³ Ehmed el-Haşimî, *Cevahîr El-Belaxe*, 360.

⁵⁴ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 248.

⁵⁵ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebiyatî Kurdîda (Ciwankarî – el-Bedi’)*, II., Hewlêr, 1975, 5.

dibêje: “El-samawat el-ariç waz eqçî imra fanima yequl leken fikûn.”⁵⁶ Xweda dirustkerê asîman û zeviyan e, ku bi şêweyê here ciwan in û her wiha ji bo vê yekê tenha hinde pêwîst e fermana bûn an pêşhatinê bide, êdî bi şêweyek lez û bez ev tişt an kar cîbcî dibe û encam dide. Her bi heman şêwe di fermûdeyên pêxember de jî hatiye ku dibêje: ‘Kul bîd’e zilale.’⁵⁷

Wate hemû dahênanek nû a di warê (Teşrî’ û lavakirin)ê de ye, ji riya rast derketiye. Di vir de jî bi heman wataya nû hatiye û her wiha ev bêjeye navekî watayî ye, rengdêrek hevedudanî ye û ji paşgira (-î) a ku nav darêjer e, pêk hatiye ku wek paşgir diçe ser bêjeya (ciwankar) û pêk ve bêjeya (ciwankarî) dirust kirine. Di ferhengên zimanewanî de ber çavên me ketiye û ji me re aşkira bûye, bêjeya (el-bedî’) tê wataya nû, taze û her wiha wataya wê jî ji bo demek dûr û dirêj çespî ye, heta ku paşan guhertin bi ser de hatiye û rûxsarek hunerî wergirtiye

⁵⁶ Qurana Pîroz, *Suretî el-Beqare, Ayetî*, 117.

⁵⁷ Şehîh Muslîm, *el-Reçem*, 1435.

BEHSADUYEMÎN

Jiyana Helbestvan Ehmed Muxtar Begî Caf

Ehmed Beg, yek ji wan helbestvanên bi navbang û mezin ê wêjeya kurdî a klasîk û wêjeya kurdî a nû ye û di sedsala 19. de derketiye û di wêjeya kurdî de xwediyê cihek diyar û berbiçav e. Ehmed Beg bi devoka Silêmanî û Helebceyê helbest darijtine. Di helbestên Ehmed Beg de hûrgiliya ziman, piştguhkirina hevoksaziyê û bi şarazayane bikaranîna ziman derdikeve pêş. Ji ber ku helbestvanî ev yeke bi riya helbestê di wêjeya kurdî de kiriye, bûye helbestvanek pêşkevtî û bi navbang. Helbestvanî di helbestên xwe de bi riya wêneyên ku hatine bihîstin û dîtî wêneyên hunerî û xeyaliyane dirust kirine. Paşan jî: “Helbestvan Ehmed Begî, wek rewşenbîrek şareza; zimanê erebî, tirkî, farisî û her wiha kêmek jî ji wan zimanên din ên ku cîranên zimanê kurdî ne, zaniye û bi taybetî girîngiyek mezin daye rewanbêjiya erebî û ta ku vê rewanbêjiyê jî di wêjeya kurdî de reng wedaye.”⁵⁸

Ehmed Muxtar Cafê nivîskar, şazadeyek wisa nebû ku li dîwanxanê li ser kursiyek ewrişm danîşe û biryar û fermanan li ser kesên ku di jêr desthilatiya wî de ne, derxe. Ehmed Muxtar Begê Cafî kesayetiyekek bû, xwe li karê desthilatdariyê dûr girtiye û ji diwanxanê daketiye nav kesên helbestvan, çîna rewşenbîran, kesayatiyên bi navbang ên ciwakî û niştimanperwer. Wate li dîwanxaneyê hatiye der ve û bûye heval û hevdemê wan kesên ku di riya gel û niştimanê de xizmet dikin. Ev yeke jî li der rewîştê derebeg û axayetiyekek bû. Eger wan bixwe pê xweş ba bangî xelkê dikirin û dianîne nav dîwanxanê û ji bo ku demek xweş di gel wan de bibin ser, lê belê helbestvanê mezin ê kurd ev bîr û boçûne guherî û her çend e xelkê li dîwanxanê serdana wî kiribe jî, ew dehan car çûye derê û ji bo serdan û dîtina hevalên xwe ên ronakbîr ku ji kesên wek; Mehmed Cewdet, Îsmail Heqî Şaweys, Mustafa Paşayê Mulkî, Tofiq Wehbî, Selam Azebanî, Şêx Nûrî Şêx Salih, Qanih, Muftî Pênciwênî, Natiq, Goran, Kemalî, Fayeç Bêkes ... hwd. pêk dên.

⁵⁸ Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, IV., Çapa 2., Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2010, 212.

Ev kesene di wê serdem û rojgarê de çirayê ronkirina jiyana û hişmendiya xelkê Kurdistanê bûn.”⁵⁹ Wate Ehmed Muxtar Caf di nav xelkê de dijiya û gelek caran jî ji bo xizmetkirin û pêdawîstiyên xelkê ji xelkê re pare dibexşî. Helbestvan Pîremêrd yekemîn kes e ku sê roj piştî mirina wî di rojnameya Jiyana de li ser wî nivîsiye û dibêje: Îxratî wate kesek zêde dilsaf bûye û ev taybetmendiye jî bûye sedema bextreşiya wî û her wiha camêriya wî a ku xizmet ji xelkê re dikir, zerer daye wî. Helbestvanî her di zarokatiya xwe heta dawiya jiyana xwe ji wan çend kaniyên rewşenbiriye ên ku hene, meyl, mebest û tînbûna xwe pê şikandiye, ew jî ji vane pêk tên:

1. Mamê wî Mehmed Paşa, ku serokê Cafiyên koçer bû, di gel vê erka xwe de piştgirî daye xebat û çalakiyên siyasî jî, ew jî tewgera Tealiya Kurdistanê bû, ku rêxistinek siyasî a kurd bû û li bakûrê Kurdistanê damezraye. Ev paşaye bo demekê li Stenbolê dimîne û li gel wan peywendiyên dirust dîke û dibe endamê wan û paşan ew cihê xwe radigihînin, ku gelek rewşenbîr û kesayetiyên girîng ên wek Pîremêrd di rojnameya Jiyana de li ser wan, gotar nivîsîne. Wî paşayî keşkollek raser li pey xwe hiştiye ku pir e li helbestên ciwan û bedew. Ehmed Muxtarî jî ji her du aliyên mamê xwe ên siyasî û helbestvanîyê sudek baş wergirtiye.

2. Di mala wan de pirtûkxane hebû û li gor gotinan di vê pirtûkxanê de hejmarek baş a pirtûkên farisî, erebî û çapên berdînî di tê de hebûye û li gel çend keşkolên helbestan de ku Ehmed Muxtar Caf pê hişyar û hişmend bûye. Mixabin ev pirtûkxaneyê di salên pêncyan de, di destê rejîma Be'as (Sedam Huseyîn) de bûye û hatiye linavbirin.

3. Mala paşa cihê razana ingilîzên siyasî ên ku li ser sînorê Helebce diman, bû, Ehmed Muxtar Caf jî sûd ji xwandewarî, hişmendî û ezmûnên ku wan jiyana kirine, wergirtiye.

4. Hevalên wî, wate ew kesên rewşenbîr ên ku li ser ve me navên wan nivîsîne.

5. Şêx Mihemed Duwanî, ev kesayetiyê mezine beşdarî şoreşa Şêx Se'îd dibe û piştî şikestina şoreşê, xwe wedişere û bi dizî ve xwe digihîne navçeya Biyare ku ji

⁵⁹*Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Çapa 1., Silêmanî, 2014, 59.

bajarê Helebceyê ve girêdayiye. Çunke bixwe ji şêxên Neqşîbendî ên li bakurê Kurdistanê bûye û hevara xwe ji bo şêxên Neqşîbendî ên dewera Hewramanê dibe û ew jî wî dibarêzin, lê belê ji bo ku bi asûdeyî bîjî wî dinêrine gundê Ebabeylê ku nêzîkî Helebceyê ye. Şêx Mihemed kesekî dilsoz ê kurd û Kurdistanê bû û bi ezmûna xebatên kurdên bakûr ve hatiye ber destê Ehmed Muxtar Caf û wî û helbestvanên din ên ku li ser sînorên Helebce bûn, sûdek baş jê wergirtin. Her wiha Helebce ew bajare girînge bû ku helbestvan binavbang tê de mezin bûne, ji ber wê hindê jî helbestvan Şakîr Fetah di geşta xwe a bo Helebce û Hewraman de dibêje: “Helebce derê Hewramanê ye, ew bajare ku cihê niştecihên hoza her mezin a kurdan, Cafan e, ji aliyê kesayetiyek wek Wesman Paşayê Caf, Mehmed Paşa û jinekî wek Adîle Xanimê ve hatiye birêvebirin. Di vê serdemê de Helebceyê, kesayetiyek wek Şêx Osmanê Tiwêle, bêjerê mezin Mewlewî û Tahîr Begê Wesman Paşa, ku kesek xwadas, zana, têgihîştî û rewşenbîr bûye, mezin kirine û jiyana li vir jiyane Ewrûpiyane bûye. Jin di gel zilaman de azad bûye.”⁶⁰

Şakîr Fetah di sala 16/08/1933 de, dibêje me seredana Helebceyê kir û kesek eger ji dûr ve bê bo Helebce, dê rêzek xaniyan ber çavê wî bikeve ku yek ji bajarên xemilandî ê welatên rojava tîne bîra mirov. Wate ev bîrkirine ji ber xaniyên Wesman Paşa, Tahîr Beg, Hamîd Beg û dewlemendên din ên Caf û Helebceyê dirust bû. Em çûna mala Wesman Paşa li cem kurê wî Ehmed Muxtar Beg. Her wiha li berewajî Silêmaniyê, ew kesê kêmekê li mala beg aşnayî ba, bê pirs û tirs dikarî li hemû cihên koşkê bigere. Şakîr Fetah dibêje em sê rojan li Helebceyê man û me temaşeyî kaniya jinan kir û ji mala paşa jinên gelek bedew dihatin ser kaniyê. Jinên Helebceyê xwe gelek dixemilînin tenanet her di dema kar an fermanê de jî kincên ciwan li xwe dikin. Jinên kurd ên here ciwan, jinên Helebceyê ne û gelek in, ji ber vê yekê zilamên wan jî serbest in. Ehmed Muxtar her tim li dû tûtina xwe ve bû û digot ez vê tûtîne bi hezar dînarî dikirim, ku gelek kirêkaran jê re dianî. Ji serkarên wan du jê ermanî bûn û Ehmed Beg gelek lê hişyar dibû û her wiha gelek ji kirêkarên wan jinên ciwan ên Helebceyê bûn. Her li ber vê yekê bû kar û fermanên wî zû dihatin cîbcîkirin. Ew bege di warê cilûberg, rabûn û rûniştin û muhabetkirinê de gelek keşxe bû û xwediyê rewîşteke biedeb bû. Dibe her ji ber vê yekê be Helebceyê xwediyê kesayetiyek keşxe

⁶⁰ Ehmed Seîd Elî Berzencî, *Awênêy Jînim Yadaştekanî Şakîr Fetah*, Rêkxistin û Lêkolînewe, Hewlêr, 2003, 205.

bin. Her wiha şert û merc jî guncav bûn, Ehmed Muxtar Beg ku êvarê dihat, bixwe û li gel çend hevalên xwe û stranbêjekê de, bi mey û piyaleyên meyê ve diçûne nav baxek ji wan baxên Helebceyê û ta nîveşev vedixwarin û keyf û sefa dikirin.”⁶¹

Çend kesayetiyan bi navdar ên binemala helbestvanî: Bêgûman gelek kesên bi navbang ji binemala helbestvanî derketine, lê belê emê tenê qala çend kesek ji wan kesan bikin, ku ji nêzîk ve bandorek mezin li ser kesayetî, derûn û bîrokeya helbestvanî kirine, bi taybetî wan kesên ku bi berhemên xwe jî bardor lê kirine. Ji vana emê qala Mamê helbestvanî Mehmed Paşayê Caf, bavê helbestvanî Wesman Paşayê Caf, dayîka helbestvanî Edîle Xanim, birayê helbestvanî Tayer Beg bikin.

1. Mehmed Paşayê Caf (1846-1920):

“Yek ji heft kurên Mihemed Paşayê Caf e, piştî mirina bavê wî bû serokê hoza Cafan û qaymeqamê Helebceyê. Li cem Osmanîyan bi paşa navbang bû, li cem Êraniyan pileya xan û gelek pileyan din wergirt. Demekê bû parêzgarê Rihayê û lê belê paşan dest jê kêşa çû Eşanê û çend salekan li Rusyayê ma û paşan vegeheriya bajarê Şarezûrê. Demekê ji serokeşîriyê hat dûrxistin û piştî hingî heta devrûberê şerê yekemîn ê cîhanê dîsan heman pile û paye jê re hat dan. Yek ji wan kesan e, ku girêdayî wêjeya kurdî ye. Pirtûkek ku ji helbest û wêjeya gelek helbestvanên kurd pêk tê nivîsiye û navê Keşkol lêkiriye, wate Gencineya Pirtûkan. Ev keşkole gencineyek gelek bi nirx e di wêjeya kurdî de û her wiha vê keşkolê li ser gelek helbestvanan bandor kiriye.”⁶²

2. Wesman Paşayê Caf (1947-1909):

“Kurê Mihemed Paşayê Caf e, ji bo demekê ji aliyê Êranê ve wek hakimê Ciwanro û Zehaw hatiye danandin. Paşan li gel bavê xwe û hoza xwe derbazî aliyê deshilatdariya Osmanîyan bûne. Paşî Osmanîyan ew kire serokê eşîreta Cafan û qaymeqamê Helebceyê. Nêzîkê bîst salan ev kar û erke bi rêve bir. Her wek birayê wî Mihemed Paşa, ji aliyê Osmanîyan ve pileya paşayetiye jê re hat dan. Her wiha ji

⁶¹ h.ç., 208.-209.

⁶² Ebdulkerîm Hemîd, *Ehmed Muxtar Caf Şaîr û Mirov le Kurdistanî Ew Serdemeda*, I., Bexdad, 1997, 24.-27.

aliyê Êraniyan ve jî çend carekê rêz jê re hatiye girtin û ji devera Silêmaniyê ta Erdelanê desthilatdariyek gelek mezin hebû.”⁶³ Wesman Paşa ji binemalek farisan jinek xwastiye û tirk ji wî karê Wesman Paşa hêrs bûne, çunke farisan wek diyarî şimşêrek ji Wesman Paşa re bexşîn ku nîşaneyê kêfxweşiya wan bû, ji bo ku hevsera wî ji binemala wan e. Wesman Paşa li pey xwe gelek şûnewar bi cî hiştine, ku paşan helbestvanî hem ji aliyê madî, hem ji aliyê zimanê helbestê û hem jî ji aliyê manevî ve sêdek mezin jê wergirtiye.

3. Edîle Xanim (1859-1924):

Hevsera duyemîn a Wesman Paşayê Caf e û piştî Menîce Xanimê ku ji begzadeyên Hewramanê yê, li gel Wesman Paşa zeviciye û keça Ebdulqadirê Sahib Qiran e û ji binemala navdar û resen a Erdelanî ye û malbatên wan desthilatdar û rêveber û wezîrên wê herêmê bûn. Adîle Xanim li Sine ji dayîk bûye û keseke navbang, bihêz û destdirêj bû û her wiha jinek gelek têgihîştî bûye. Desthilatdariya siyasî a hoz û eşîretê zêdetir di destê wê de bûye, gelek car dema Wesman Paşa ji bo derveyî Helebce sefer dikir, Edîle Xanimê kar û barên bajarê Helebceyê birêve dibirin û di serdema wê de ji Helebceyê re xizmetek gelek mezin hatiye kirin, bazar, xanî û benzînxaneya taybet hebûye. Gelek alîgiriya Êraniyan dikir û xizmetkarên wê hemû Êranî bûn. Di dema Edîle Xanimê de civînên gotûbêjan bi tirkî qedexa bûn, her wiha Edîle Xanim kesek gelek mirovhez bû, tenanet di navbera du birayan, Wesman Paşa û Mehmûd Paşa, de jî aşîgerî dikir; ji bo ku navbera wan baş be û biratiya wan zêdetir bibe. Edîle Xanim li cem hikûmeta Hîndîstanê kesek bi navbang bû û bi nîşaneyê pir bi nirx hat xelatkirin û kesê ku xelat kirî; “Xan Behadûr bû. Ermonds wê wek şajina Bêtîlcî a Şarezûrê bi nav dîke. Her wiha rojhilatnasên biyanî wê wek xwedanê Helebceyê dihesibînin û ji rêzgirtin û mîvandariya wê gelek razî bûn. Rojhilatnas Mecerson di gelek cihên pirtûka xwe de qala wê dîke û rêz û hurmeta wê digire û qala zîrekî û çelengiya wê dîke.”⁶⁴ Boye Ehmed Muxtar Beg gelek di jêr bandora dayîka xwe de maye.

⁶³ Ebdulkerîm Hemîd, *Ehmed Muxtar Caf Şaîr û Mirov le Kurdistanî Ew Serdemeda*, I., Bexdad, 1997, 28.

⁶⁴ h.ç., 34.

4. Tayer Begê Caf (1875-1918):

“Tayer Beg kesek navbang e û gelek helbestên wî hene, ku kurdî, tirkî, farisî û erebî ne û pirtûka wî a bi van çar zimanane heye, ku ji helbestvan (Ehmed Muxtar)î re hêlaye.”⁶⁵ Dîwana Tayer Beg ta niha çend carekê hatiye çapkirin û her wiha Tayer Beg wek kesek sivarçak, sîlehşor, zîrek û jêhatî hatiye nasîn. (rûpela 26. Wataya hevoka diyarkirî bipirse....) Gelek car hatiye Sine û çûye û her wiha car car xwe bi zimanê firensî ve mijûl kiriye û hez kiriye vî zimanî bizane. Ji ber nexweşiyê wek cara dawîn anîne Silêmaniyê û her li wir koça dawî kiriye û li goristana Ebabeylê spartîne xak.”⁶⁶

Wate ji vir ve em dikarin bêne ser kesayetîya helbestvan Ehmed Muxtar Begê Cafî û bibêjin: “Ew çavkaniyên ku qala kesayetîya Ehmed Beg dikin gelek kê m in. Di wan çavkaniyan de jî bi şêweyek kurt qala jiyana wî hatiye kirin û çend helbestekî wî hatine şîrovekirin. Ji bilî wê, tiştêk din di warî wî de, tê de nayê dîtin. (Elî Kemal Bapîr) çend carekê qala Ehmed Beg kiriye, carekê bi riya pirtûka (Guldestey Şîray Hawesrim) xwe, bi çend rûpelekê basî jiyana helbestvanî kiriye û çend mînamek ji helbestên wî nivîsîne û carekê jî di sala 1960’an de, li Silêmaniyê dîwana wî çap kiriye.”⁶⁷ Navê tamam ê helbestvanî, Ehmed Muxtar Cafê kurê Wesman Paşayê mezin ê Caf e. Di sala 1316’yan a hîcrî de, ku li gor mîladî salên 1898-1899 in, ji dayîk bûye.”⁶⁸

Her wiha Eladîn Secadî di pirtûka xwe a bi navê Mêjûy Edebî Kurdî de qala jiyana û berhemên wî kiriye û dibêje: “Di sala 1897’ê mîladî de ji dayîk bûye û wê demê bavê wî Wesman Paşa û mamê wî Mehmûd Paşa du kesên bi navbang ên eşîreta Caf bûn û ji alyê sultanê Osmanî ve pileya paşayetiye wergirtine. Ehmed Muxtar Caf li Helebceyê hakimî û qaymeqamî kiriye.”⁶⁹ Her wiha Marif Xeznedar jî di warê jiyana wî de dibêje: “Ehmed Muxtar navek hevedudanî ye, her di kon de (Muxtar) jê re wek sifet bûye û Ehmed jî yek ji navên peyamber e. Êdî her li piştî vê yekê sifetê Muxtar ji bo hemû navên Ehmed hatiye bikaranîn, bi taybetî di ciwaka Osmaniyan de. Ji bilî dirusteya (Ehmed Muxtar Caf), eger ev nave bi erebî rast bête

⁶⁵ Mihemed Emîn Esrî, *Dîwanî Tayer Beg*, Bexdad, 1969, 21.-23.

⁶⁶ h.ç., 35.

⁶⁷ Elî Kemal Bapîr, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, 1960.

⁶⁸ Îzedîn Mistefâ Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986, 7.

⁶⁹ Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Sine, 524.-525.

nivîsîn, bi şêwazê elifbêya ebced sala 1316'yan a hîcrî derdikeve holê, ku beramberê salên 1898-1899 ên mîladî radiwesta. Her bi heman dîroka dîwana wî, roja wî a ji dayîkbûnê diyar dibe.”⁷⁰ Her wiha “Em dikarin bi pê elifbêya ebced sala ji dayîkbûna Ehmed Muxtar Beg diyar bikin.

20=گ، 2=ب، 200=ج، 1=ا، 400=ت، 600=خ، 40=م، 4=د، 40=م، 8=ح، 1=ا

Piştî komkirina van hejmarên li serê ne, ji me re derdikeve di sala 1316'yan a hîcrî de ji dayîk bûye.”⁷¹

Her wiha helbestvanên kurd ên mezin û navdar jî ji aliyê ziman, hest, rewşenbîrî, neteweyî û niştimanperwerî ve bandor le Ehmed Muxtar Beg kirine. Ehmed Muxtar Beg; “Helbestvanek kurd ê jîr û jêhatî ê piştî qonaxa helbesta klasîk a kurdî ye. Dema mirov helbestên wî dixwîne, hest bi aramiya dil û derûnê dike, li hember xwe hest bi baweriyê dike. Giyanê mirov berxwedanek pir coş û xuroş dike û wisa li xwîner tê ku bi xwandina wan berdewam be û dest ji naaramî û xurtiyê berde û her wiha helbestên wî radigihînin ku mirov yekemîn car ji malbatê ve pêdigihin û fêr dibin, paşan di ciwakê de. Em bi taybetî qala edîp û nivîskarek wisa serkevtî û pêşkevtî dikin ku ne tenha di warê helbestê de, belkî di warê hemû edeb û beşên din ên jiyane de jî xwediyê cihek diyar û berbiçav e, dikin.”⁷²

Her komelek edîb û rewşenbîran di dîwanên xwe de qala wî kirine û yek ji wan jî Îzedîn Mistefa Resûl e, ku dibêje Ehmed Muxtar Caf: “Di sala 1922'yan ta sala 1924'an kirin qaymeqamê Helebceyê, wate du salan qaymeqamiya vî bajarî kiriye. Paşan peywira naîb a parlamentoya Êraqê wergirtiye û her di dîwana xwe de radigihîne ku di navbera salên 1919 -1920'an de qaymeqamiya bajarê Helebceyê kiriye. Wate du boçûm hene, a yekemîn dibêje du sal qaymeqamî kiriye û a duyemîn jî dibêje pênc sal qaymeqamî kiriye û paşan jî pileya naîbîyê wergirtiye. Lê belê ji pile û payeya naîbiya hikûmetê razî nabe û li gor gotinên xelkê dest ji hemû tiştî kêşaye û bajar terikandiye û ber bi çiyayan ve çûye. Eger em ji aliyê sirûşt û bîroke ve temaşeyî reftara Ehmed Muxtar Beg bikin, emê bibînin ev cure pile, paye û kursiyane li bal wî bînirx bûne. Ji ber vê yekê bajar bi cî hêlaye û ber bi çiyayan ve

⁷⁰ Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, V., 475-498.

⁷¹ Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm, *Lêkolînewey Edebî Mêjûy Ehmed Muxtar Begî Caf*, Silêmanî, 2000, 31.

⁷² *Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Çapa 1., Silêmanî, 2013, 93.

çûye. Ehmed Muxtar Beg çî ji aliyê malbatî û rewşenbîrî ve û çî aliyê jîr û jêhatîbûna xwe ve baştirîn kesê hoza Cafan bû, ku rejîma Beas a wê serdemê pişta xwe gelek daye wî û her wiha ji bo ku wî pêş bixin û her tim ber bi pêş ve bibin, baweriya xwe gelek bi vî helbestvanê kurd dianîn.”⁷³

Lê belê Ehmed Muxtar Caf dest ji wan pile û payeyên ku bi riya dijmin û zaliman bidest xistine, dikêşe. Li gor wî ew pêşkevtin û deskevtên bi riya zaliman hatine bi destxistin, nîşaneyên serkevtin û pêşkevtinê nîn in. Ehmed Muxtar Caf ji bilî berhemên helbestî, berhemek din a bi navbang heye ku ew jî pirtûka Meseley Wîjdan e. Li gor hin kesan ev berheme çîrok e, li gor hin kesan jî roman e. Di encamê de em dikarin bibêjin ev hunere çîrok e an novel e. Wê hunerê peywendiyekî organî bi pêşkevtina ciwak, jiyana bajarî, tenanet geşekirina bazar û bazirganî û xwendewariyê ve heye. Ji ber vê yekê em dikarin pirtûka Meseley Wîjdan a Ehmed Muxtar Caf bi çîrok yan bi roman nav bikin. Her wiha eger em li naveroka Meseley Wîjdan binêrin, ku di destpêka salên 1927-1928’an de nivîsiye. Em dikarin bi riya vê çîrokê di warê çand, kelepûr û asta xwandewariya ciwakê de şareza bibin û her wiha di wê serdemê de radeya girîngpêdana pak û temîzî û tendirustiyê, ku kêşeyek mezin bû û dibû sedema qirbûna ciwakan, zanyariyan bi dest bixin û lê şareza bibin. Di heman demê de em dikarin di warê wan fêl û direw û lêbên, eger di hemû Kurdistanê de nebûbe jî, di bajarek biçûk ê wek Helebce, ku ji sê hezar niştecihên pêk dihat de hebûn, zanyariyan peyda bikin. Bi riya xwandina çîrok û hizrên rexnegirane ên wî nivîskarê me, bêdadiya wê serdemê ku di nav ciwakê de hebû, ji me re derdikeve holê û her wiha em hest bi jîrbûna nivîskarî jî dikin.”⁷⁴

Ehmed Muxtar Caf, her di wê; “Çîrokê de tinazan bi kesekê dike ku her wek wî bûye qaymeqam, paşan naîb û parlamenter û her wiha kesekî mezintir. Di wir de derdikeve ku helbestvanî nexwastiye bi wan riyane bibe xwediyê pile, paye û kesayetiyek mezin. Naveroka vê çîrokê û naveroka helbestên helbestvanî wek yek in û her wiha di vê çîrokê de bi riya zimanê gel ve hêviyekê derdibire, çunke dibêje me hêvî heye, ku mîsoger e emê mafê stembarî/ê ji stemkarî/ê bistînin.”⁷⁵ Em dikarin bibêjin helbestvanî gelek bi şaraza û pisporane şiyaye vê çîrokê binivîse, lê belê

⁷³ Îzedîn Mistefâ Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986, 13.

⁷⁴ *Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Çapa 1., Silêmanî, 2013, 20.

⁷⁵ Ehmed Muxtar Caf, *Meseley Wîjdan*, Silêmanî, 2006.

mixabin ev çîroke bo yekemîn car di sala 1970'yan de hatiye çapkirin, wate di salên hatiye nivîsîn (1927-1928) de, nehatiye çapkirin. Her wiha Ehmed Muxtar Beg her wê demê xwastiye bidete çapkirin. Di vî warî de helbestvan Şakir Fetah di berhema xwe ku basî gešta xwe a bo Helebce û Hewramanê dike de, dibêje Ehmed Muxtar Beg ji bilî berhema Meseley Wijdan, digot min çîrokek bi bandor a ku qala xweliseriya kurdan û nareseniya biyaniyan dike, nivîsiye ku dê çavê kurdan veke. Ez guh nadim dil û daxwaziyên mîrîtiyê, ezê gotinên xwe her bi serbestî darêjim, eger wisa nebe, dê vê çîrokê li çap nadem, her wiha xebatek din jî li ber destê min e reng e vê zivistanê temam bikim. Gešta Şakir Fetah 16/08/1933'yan de bûye û mixabin ta niha ew berhemene nehatine dîtin.”⁷⁶

Ehmed Muxtar Begê helbestvan jî, “Her wek hemû zarokên din ên kurd di temenê heft salî danêne ber xwandinê û li dibistana zarokan a Helebceyê dest bi xwandinê dike. Quranê û li gel komelek pirtûkên din ên di wî warî de temam dike û li paş vê jî dest bi xwandina pirtûka Gulistan û zimanê farisî dike û kêmek bi erebî ve jî mijûl dibe û paşan dest jê dikêşe û dest bi karê mulkdarî dike, di temenê bîst salî de zeviciye.”⁷⁷ Her wiha Refîq Hîlmî di pirtûka xwe de dibêje Ehmed Muxtar Beg: “Ciwanekî xwînşîrîn, bejindirêj, sor û spî û çavşîn bû. Kesek merd û dewlemend bû.”⁷⁸ Ev zelame bi vê hemû hoşengî, dilpakî û serera jî, ji; “Binemalek navdar ên Helebceyêbûn, her wiha jê re şazade jî dihate gotin û mirovan li gel wî gelek hez li danûstandinan kiriye. Her wiha dilê gelek jinan bo wî periye û ji xwedê daxwazkirine ku dilê wî jî bo wan bipere.”⁷⁹

Her wiha Eladîn Secadî jî, di *Mêjûy Edebî Kurdî* de dibêje: “Ehmed Muxtar Beg kesekî bejindirêj, çalak, pirçsor û gotinxweş bû, wate Ehmed Muxtar Beg ji ber ku hemû ev taybetmendiyan li cem hebûne, bi rastî kesek dinyabîni, çak û çalak bûye. Bi watayek din Ehmed Muxtar Beg, li cem kes û kar, xizm, heval û dostan bi şêweyek asayî tewgeriyaye û xwe mezin nekiriye û nedîtiye. Eger bêne serê di warê

⁷⁶ Ehmed Seydî Elî Berzencî, *Awênay Jiyanîm Yadaştekanî Şakir Fetah*, Rêxistin û Lêkolîn, Hewlêr, 2003, 210.

⁷⁷ Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Sine, 524.-537.

⁷⁸ Refîq Hîlmî, *Şîr û Edebiyatî Kurdî*, I., 1988, 13.

⁷⁹ *Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Çapa 1., Silêmanî, 2013, 65.

xwandewariya wî de, kesek hin xwandewar nebûye; lê belê di gel vê yekê de jî kesekî jîr û jêhatî bûye, zimanê erebî, farisî, tirkî û kêmek jî ingilîzî zaniye.”⁸⁰

Di nawenda rewşenbiriya Başûrê Kurdistanê de, wek pêştir jî me amaje pê daye, kesayetiyek rewşenbîr, xwandewar, hişyar bûye. Her wiha her çavê xwe li dinyayê vekirîye, di aliyê rewşenbîrî ve bandora kesayetiyên lê nêzik in, destpêkiriye. Bi taybetî keşkola Mehmed Paşayê mamê wî, ku keşkolek gelek bi navbang e, ji bo Ehmed Muxtar Beg çavkaniyek gelek baş bûye û şiyaye sûdek gelek baş lê werbigire. Ev keşkole çavkaniyek gelek baş bûye, destgula helbesta kurdî bûye. Di vê destnivîsê de, gelek helbestên ku ji zaravayê Goran in, hatibûne tomarkirin, çunke ev zaravaye zimanê fermî ê serdemên pêşî ê navçeyên Şarezûr, Erdelan, Hewraman, Germiyan û herêmeke din bû. Kesayetiyên wek Nalî, Tayer Beg, Ehmed Muxtar Beg diba bi vî zaravayî helbestan raçînin, lê belê helbestvan Nalî ev sisteme têk da û bi zimanê navçeyên herêma paşayê Baban helbest darijt û bingeha zaravayê kurmanciya başûr dana; êdî piştî vê yekê zimanê helbestvanan bû zimanê kurmanciya başûr.”⁸¹ Ehmed Muxtar Beg, di wê serdemê de jî aliyê siyasî jî ve kesek navdar bûye. Dema şoreşa Şêx Mehmûd serdikeve, helbestvan bi dil û can di gel Şêx de bûye û em dikarin bibêjin Ehmed Muxtar Beg kesek gelek şoreşger bûye, lê belê piştî ku Şêx Mehmûd helwestra xwe guherî û ji hevpeymana ingilîzan peşîman dibe û dibe hevpanê osmaniyan Ehmed Muxtar Beg pê nexweş dibe, ji ber vê yekê Şêx Mehmûd biryara girtina wî dide û helbestvan ji bo maveyekê di şkevta Casaneyê a ku ji aliyê Şêxî ve wek girtîgehê dihate bikaranîn de, dimîne. Piştî ku Ehmed Muxtar Beg çend rojekan li girtîgehê dimîne, helbestekê ji Şêx re dinivîse û Şêx jî vê helbestê dixwîne û paşan biryara azadkirina wî dide. Her wiha helbesta ku Ehmed Muxtar Beg ji Şêx Mehmûd re nivîsiye ev e:

“Seba erzî xilûsî û bendegîm û hem dûa xawênî,

Bibe bo xizmatî şahî û hîtî gişt Silêmanî,

Bilê qurbanî to bim ey Selahedîbê Eyûbî!

⁸⁰ h.ç., 535.

⁸¹ Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I., 475. – 498.

Be zorî pence wek hîder be sîma Yusîfî zanî

Le dest kafîr necatman bû bey' medellîlahî welmeyinne...⁸²

Helbestvan di vê helbestê de qala zîndanîkirin û helsûkewtên xirap ên Şêx ku li gel wî kirine, dike. Her wiha helbestvan dibêje kurd her tim ji bo berjewendiyên osmaniyan dijminê serê hev bûye û boye ev yeke dête serê helbestvanek kurdperwer û şoreşgerê neteweya xwe. Di vir de derdikeve ku helbestvanî pê nexweş bûye Şêx Mehmûd xwe bi hemû dem û dezgah û desthilat ve radestî dewleta osmaniyan kiriye. Her wiha di warê van gotinên helbestvanî de, boçûnek din heye: “Di wê serdemê de her qaymeqamê Helebceyê bûye û tenanet peywendiyên wî di gel Şêx de gelek baş nebûne, boye her di wê demê de bûye, gava ku di sala 1923’yan de serdana Silêmaniyê dike, Şêx wî dide girtin û rewaneyî girtîgeha Casaneyê a li Sûrdaşê ye, dike û ji bo mayekê li wê derê dimîne. Her wiha tê gotin; sedema girtin û bendkirina wî jî nîşandana helwestên ciyawaz e, ku car piştî ingilîzan girtiye, car piştî Şêx girtiye. Wisa diyar e, dirêjiya bendkirina wî jî kêm be, çunke her di girtîgehê de helbestekê dinivîse û têde gileyî, tîka ji Şêx dike û lêborîna xwe dixaze. Ew helbeste di roja 24/02/1924’an de di rojnameya Rojî Kurdistan de tê bilavkirin û di jêr helbestê de jî hatiye nivîsîn; Qaymeqamê wisa, niha girtî Ehmed Muxtar. Di naveroka helbestê de eve bo me derdikeve, Ehmed Muxtar Beg karek kiriye, ku bi dilê Şêx nebûye yan tawanek xistîne stûyê wî. Her wiha her çend e ew xwe wisa nîşan dide ku wî hîç tiştê nekiriye û eger xirabiyek jî kire be her di wê derê de lêborîna xwe dixaze.”⁸³

Helbestvan di wê helbestê de dibêje:

“Le paş em îhtiramate bilê bew şahî dewrane,

Çî curmêkî heye Ehmed ke kirdûte be zîndanî,

Eger şayed le xizmetta xirapey ew bûwe sabît,

Be lutfî xot efûy ke çunke her xot sahebî îhsanî”⁸⁴

⁸² Îzedîn Mistefâ Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986.

⁸³ Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm, *Lêkolînewey Edebî Mêjûy Ehmed Muxtar Begî Caf*, Silêmanî, 2000, 240.

⁸⁴ *Rojnameya Rojî Kurdistan*, hj., 24., 24/02/1923, 2.-3.

“Piştî ev helbeste gihiştiye destê Şêx, biryara azadkirina wî daye û ji girtîgehê derdikeve. Ev yeke jî nîşan dide ku gelek di girtîgehê de nemaye. Êdî ji vê rojê û pê de navbera Ehmed Muxtar Beg û Şêx xweş nabe û Ehmed Muxtar Beg piştgiriya ingilîzan dike û mehek pê naçe ingilîz di meha adara sala 1923’an de bajarê Silêmaniyê bombebaran dikin û Şêx û alîgirên wî neçar dibin bajarî biterikînin û ber bi çiyayan ve biçin. Diçin şkevta Casane û li wir dimînin û her li wir jî rojnameya Bangî Heq derdixînin. Desthilatdariya ingilîzan bo demekê li Silêmaniyê berdewam bûye. Her di vê navberê de (1923) ingilîz dîsan Ehmed Muxtar Begî dikin qaymeqamê Helebceyê û her wiha her piştî vê yekê dema ku bi serperîştîya ingilîzan Rêxistina Gelan (‘Esbe ‘Alemum???) çend xalekan diyar dikin ji bo çareserkirina kêşeya kurd. Ji ber vê yekê, Ehmed Muxtar Beg bi hemû dilsoziya xwe ve piştgirî û alîgiriya ingilîzan dike û wisa dizane ku ingilîz dê alîkariya kurdan bikin û mafê kurdan bidinê. Tenanet ji ber vê yekê Ehmed Muxtar Beg, li Helebceyê ahengeke mezin li dar dixê ku dê mafê kurdan bête dan, lê belê ingilîz ji soza xwe peşîman bûn û ji ber vê helwesta ingilîzan, Ehmed Muxtar Beg hêrs dibe û li hember ingilîzan helwest digire û di sala 1935’an de artêşekê dirust dike û diçe çiyayê Balambo. Ingilîz ji vê helwesta Ehmed Muxtar Beg gelek ditirsin û ji ber vê hindê bi riya sîxurên xwe wî şehîd dikin û termê wî jî davêjine nav çemê Sîrwan.”⁸⁵

Her wiha, dibe di vir de bi kurtî qala hewlên helbastvanan ên di wê demê de, di derbarê kuştin û şehîdkirina Ehmed Muxtar Beg de ku wek lawahîkirin ji xwedê re hebûne, bikin.

“Şasadey dewran Ehmed Muxteran,
Pey rojî de’wa sefer yaren,
Her pey wîş xasen ceroj heyca,
Çenî dûjminan bikero heyca,
Daîm nexeyal malî kurdanen,
Boye arakêw le xakî Êranen,

⁸⁵ Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Sine, 524.-537.

Ji bilî vê helbesta li serê ye; kesên rihsipî, navdar, xelkê devrûberê Helebce û çend kesayetiyek din ên wî bajarî ên wê serdemê û helbestvanên kurd ên wek; Pîremêrd, Kemalî, Fayeç, ... hwd. li ser mirina wî helbest nivîsîne. Ji bo ku mijara me zêde dirêj nebe, emê tenê helbesta lawahîkirinê a helbestvan Kemalî a di vî warî de nivîsiye, wek mînak bidin.

“Dîsan felek em daxe çî bû nay be cergda,
Em agire çû bû le dilî ‘alemî berda,
Dîsan çîye em şore le nav kurdî cîhana,
‘Alem hemû xerçe le qur û şîn û çemerda,
Min dîwme le xak dête derê gul be beharan,
Bo çî gulî min mate le jîr gil û berda”⁸⁶

Helbestvan Kemal di vê helbesta xwe de radigihîne ku felek ji Xwedê re lawahiyan dike û dibêje dîsan çî bû Te ev xem û xefete ji bo min dirust kir û te agir berda dilê min û dilê gelê kurd. Ev şer û gêreye çî ye, dîsan di nav hemû kurdên cîhanê de dirust bûye. Hemû gelê kurd ji serî heta binî di herî, şîn û taziyan de winda bûye. Helbestvan di berdewamiya helbesta xwe de, dibêje min dîtiye gul û çîçek di biharan de li jêr axê têne derê, bo çî gul û çîçeka min li jêr dar beran de ye û bêdenge û nayête derê û helbestvan bi vî awayî lawahiyan ji felêkê dike ku Ehmed Muxtar Begê şehîd kirî, ji jêr axê derkeve; bi watayek din hebestvan mirina Ehmed Muxtar Beg qebûl nake, yan naxaze qabûl bike. Her wiha li ser van lawahîkirinên Kemalî, helbestvanek din ê kurd Goran wiha dinivîse:

“Ey kake Kemal şaîr xweş xwênî hunermend,
Bulbul niye toy teyrî tere niqum le seherda,
Dek xwoşbê dem û pence û nukî qelemî to,
Bo dadê ke dat kake le meydanî hunerda”⁸⁷

⁸⁶ Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm, *Lêkolînewey Edebî Mêjûy Ehmed Muxtar Begî Caf*, Silêmanî, 2000, 35.

⁸⁷ Îzedîn Mistefa Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986, 25.

Em dikarin bibêjin Ehmed Muxtar Beg kesayetiye diyar û ciwakî bû û wî peywendiyên dostane li gel helbestvanên serdema xwe de hebûn, wek; Goran, Natîq, Kemal, Şaho, Hîlmî, Şêx Nûrî, Fayeq, Bêkes, Mîrza Marif, ...hwd. Ji bilî vana peywendî li gel hin helbestvanên din de jî hebû û her wiha helbestvan Pîremêrd her çawa xebera kuştina wî dibihîse, wê di rojnameya Jiyan de bilav dike û dibêje:

“Dû mîsreh yekê Keyxusrewanî,

Duwemyan xalî rûy Erdelanî,

Bûbû be şîrî ciwan û newciwan,

Dirêxa felek xistiye naw Sîrwan”⁸⁸

Ehmed Muxtar Beg, ji aliyê bavî ve Keyxusrevî ye; ji aliyê dayîkê ve Erdelanî ye. Dilsafi, dilsaxî û kesayetiya wî a sade ji wî re bûye bedbextî û xirabî. Di nav dilê gelê kurd de wek kesek zana, jîr, jêhatî û hoşeng cî girtiye û her wiha ji ber ku di riya azadiya Kurdistan û gelê kurd de jiyana xwe bext kir. Boyedema tê şehîdkirin gelê kurd û helbestvanên kurd ên wê serdemê gelek xemgîn dibin.

Ew her du binemalên ser ve; “Keyxusrewî û Erdelanî du binemal in, ku di warê rewşenbîrî û xizmetkirin ji wêjeya kurdî re, bi navbang in. Ehmed Muxtar Beg jî di nav van her du binemalên navbang ên kurdande hatiye dinyayê. Her wiha rastiyeke din jî heye, dibe qala wê bê kirin; ku bajarê Helebce navenda rewşenbîrî, helbestvan, wêjevan û cihê mezinbûna helbestvanan bû. Çendîn helbestvanên hevçerxê Ehmed Muxtar Beg di bajarê Helebceyê de mezin bûne. Wek; Kemal, Bêxûd, Mîrza Marif, ... û çendîn helbestvanên din û wan hemû helbestvan û rewşenbîran bandor li Ehmed Muxtar Beg kiriye.”⁸⁹

Em dikarin ji vir û pê de qala dîroka koçkirina helbestvanî bikin û her wiha em dikarin bibêjin boçûnên di warê dîroka mirina helbestvanî de jî, hev digirin. Dîrokek ji bo kuştina helbestvanî, ku ji aliyê sîxurên ingilîzan ve hatiye kuştin, hatiye diyarkirin. Helbestvan di meha Sibata sala 1935’an de hatiye kuştin. Her bi heman şêwe Eladîn Secadî dibêje Ehmed Muxtar Beg: “Di sala 1935’an de şehîd bûye û cesedê wî avêtîne di nav rûbarê Sîrwan de. Piştî ku cesedê wî hatiye dîtin, ew anîne

⁸⁸ h.ç., 16.

⁸⁹ *Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, Çapa 1., 2013, 94.

Helebceyê û li avahiyê Ebabeylê, di wê goristana ku birayê wî Tayer Beg tê de hatiye veşartin de, vedişêrin. Îzedîn Mistefa Resûl jî her dibêje di temenê 35 salî de hatiye şehîdkirin.”⁹⁰

Di vir de derdikeve ku Ehmed Muxtar Begê Cafî, ji aliyê kesayetî ve; helbestvan bû, romannivîs yan çîroknivîs bû, sîyasetmedar bû, kesayetiyek bi navbang ê ciwakî bû, ... hwd. Her wiha helbestên helbestvanî ji aliyê naverokê ve du cur in: Helbestên Dildariyê, Helbestên Niştimanî.

1. Helbestên Dildariyê:

Di helbestên Ehmed Muxtar Beg ên dildariyê de, ji ber wan jinên ku dilê wî bo çûye, hestê evîndariyê di tê de heye û ji bo vê yekê tê gotin: “Ew Helebceyiyên ku mabûn û me ew dîtin, ew rastiye diselmandin ku mamoste Refîq Hîlmî nivîsiye, lawekî xwînşirîn, bejindirêj, sor û spî bûye; çavên wî şîn û porê wî zer bûye û wek helbestvan xwediyê kesayetiyek camêr bûye. Ev zilame bi van taybetmendiyane kesek lewend û şazade jî bûye, boye dilê her jinekê ji bo wî periye û hemûyan ji Xwedê xwastiye ku dilê wî jî, ji bo wan bipere.”⁹¹ Em di vir de dikarin bibêjin helbestvanî helbestên dildariyê nivîsîne û bi şeweyek narastewxo ew jinên ku wî jê hezkirine diyar in û ew xistîne di nav çarçevayahunera Qewriyeyê de. Bo nimûne di rûpela 148. a dîwana xwe de, de di beyta pêncemîn a helbesta Feslî Bihar e de, dibêje:

“Ey nîgarî bêwefa ey şoxî Hewramî neseb,

Dûr le to key meylî geştî gulşenî taranme” r.148.

Mebest ji ciwana Hewraman, xwîşkî Mela Necmedînê Saetçiyê Helebceyî, Fatme Xan e, ku paşan li gel zeviciye û ta dawiya jiyana xwe jî her li gel de hevsergîrî kiriye. Her wiha pîrên Helebceyî, Hîlmî Şaîr, Mîneyê Lengjen, Fetahê Hemeyê Şaweyî û Ehmed ku wek Ehe Keçel tê nasîn, digotin, demekê hez li jinekê kiriye ku navê wê Mîna bûye û vî navî jî di helbesta, Were Bigire be Yadî Çawî Dulber, de dibêje:

⁹⁰ h.ç., 23.

⁹¹ *Dîdarî Taybet be Şaîr Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, Çapa 1., 2013, 90.

“Ke derxa dûlberim ew gerdenî safî bilûrînî,

Le pencem mû derê, ger des dirêjkem bo milî Mîna” r.60.

Helbestvanî, bêjeya Mîna, bi du watayan bi kar aniye. Cara yekemîn di wataya piyaleya ku şerab pê tê vexwarin; cara duyemîn jî bi wataya rasteqîne bi kar tîne ku navê jinekê ye. Di vir de em dikarin bibêjin li gel hebûna helbestên wî ên dildariyê, bixwe jî kesek evîndar bûye û çend hevokan de qala dîlbera xwe dike, lê belê em naxwazim mijarê zêde dirêj bikin. Dibe em bizanîn helbestvan evîndar û dildar bûye û helbestên wî ên dildariyê hene, lê ev helbestene hîç wextekê nagihin helbestên Melayê Cizîrî, Nalî, Wefayî, Goran,... hwd. ên dildariyê. Raste nagihinê, lê di gel vê yekê de, em hin caran di nav helbestên wî de beytên wisa dibînin ku dibine nîşaneyên dahênaniya wî. Dema em bi şêweyek hûrtir helbestên wî ên dildariyê dixwînin, hinek helbestên wî ên bi wî avayî dikevin ber destê me, ku ciwaniyek baş daye edeb û hunera kurdî. Lê belê dîsa jî helbestên wî ên dildariyê hîç wextekê hindî helbestên wî ên niştimanperweriyê bi bandor nîn in. Her wiha ji bilî van gotinan hin beytên wî hene ku mirov wisa hest dike, bi ava zêr hatine nivîsîn. Wek;

“Bêstûn êsteş ke wextê laleyî lê sewz ebê,

Basî xwênî dîde û daxî dilî Ferhad eka”r. 54.

Her wiha helbestvan di cihek din de bi şêweyek pir ciwantir dibêje:

“Gulaley Bêstûn êsteş be beharan,

Elên pêt maceray Ferhad û Şîrîn” r. 108.

Ehmed Muxtar Begê helbestvan, helbestên xwe bi endazeyek pir ciwan dahênane û helbestên dildariyê ên pir nazenîn û ciwantir nivîsîne, ku di cihek din de dibêje:

“Le neşey bade wextê serî kulmî eka areq,

Bî’eynî, ew delê bergî gule ew awî barane” r. 139.

Helbestvanîşiyaye bi şêweyek edîbane yarê wesf bike. Tenanet dema ku mey û pîyale di arda bûn, ew bi xwêha yarê a li ser rûmetê wê ye, serxweş dibû. Her wiha eger em di derbarê evîn û dildariyê de li ser çend beytên din ên helbestên wî hûr bibin, emê sotin û şeydabûna wî a ji bo evînê bibînin, ku dibêje:

“Nexwoşî xoştire le lay min la saxî û sîhhet ey cana,

Eger yek hefte carê bêy bipirsî çone ehwalit” r. 65.

Helbestvan di vê beytê de dibêje: Nexweşî gelek xweştir e li ba min, li gor leşsaxî û tendirustiya baş ey canan, eger tu heftiyê carekê bêyî û serdana min bikî. Çünke helbestvan dixaze dîlbera wî heftiyê carekê serdana wî bike û rewşa wî bipirse û dibêje egertenduristiya min baş be yara min serdana min neke, nexweşbim baştir e ji bo ku yara min serdana min bike.

Helbestvan di beytek din de jî gelek ciwan wesfa evîndara xwe dike û dibêje:

“Ebê kaxez le bergî gul qelem cana le ‘enber bê,

Ke min meylim heye êsta binûsim wesfî rûxsarit” r. 64.

Helbestvan di vir de temaşe li rûyê dildara xwe dike û jê re dibêje eger bixwazim basî wesf û stayîşa ciwaniya te bikim yan ciwaniya te binivîsim, dibe kaxez ji belgên gulê bin, bênxweş û nazenîn bin; qelem ji enberê bin, wate bêhn xweşbe. Hingî ez dikarim binivîsim an wesfê ciwaniya te bikim. Her wiha helbestvanî ji bilî vê helbestê gelek helbestên din ên di vî warî de hene, lê belê di vir de radiweste û dest ji helbestên dildariyê dikêşe. Çünke temaşe dike perdeyek din di ser gel de hatiye kêşandin û jiyan gel bi renek din hatiye dorpêçkirin. Car car dengê din li ber guhê wî dikeve ku dengê nale nala cergê dayîka niştiman e. Piştî ku vî dengî dibihîse jê re xem û xefet dirûst dibe û hinek diponije û paşan ji xweşî û serxweşiya ciwaniyê dête derê û awirek tund ji helbestvanên kurd ên wê serdemê vedide û ji wan daxwaz dike êdî helbestên niştimanî binivîsin. Êdî ji vir pêde li cem Ehmed Muxtar Begê Cafî helbestên niştimanî ser hildidin û ji helbestvanên din re jî dibêje, êdî bes hinde basî ciwaniya jinan, bisk, kezî û hest û sozên dildariyê bikin û vê helwesta xwe bi vê helbestê derdibire:

“Şaîranî kurd bese bes basî zulf û çav biken,
Kem xeyalî perçem û kakolî alozaw biken,
La biden kem basî sinbul ya liqî lawlaw biken,
Êwe tedbîrêkî halî qewmî dilsûtaw biken,
Zû bezû ta îş le destde naçûwe sa hewlê biden” r. 106.

Helbestvan di vê helbestê de bangî hemû helbestvanên kurd dike û ji wan daxwaz dike ku bo yek kêlî jî niştiman piştguh neken û hemû hewl, kar û xebatên wan ji bo serxistina gelê kurd be û ji bo evîn û dildariyê xak û niştimanê ji bîr nekin.

2. Helbestên Niştimanî:

Helbestvanê mezin ê kurd, Ehmed Muxtar Beg, di helbestên xwe de gelek wesfên niştiman û ciwaniya Kurdistan û niştimana xwe kiriye. Li gor helbestên dildariya di helbestên Ehmed Muxtar Beg ên niştimanî de hestek gelek ciyawaz û ciwantir heye. Boye li gor hin çavkanî, nivîskar, rewşenbîran helbestên Ehmed Muxtar Beg ên niştimanî ji yên dildarî bandortir, nazenîntir û ciwantir in û xwediyê ramanek zanistî û îdeolojîk in û hest, bîr û baweriya niştimanî bi xwîner didin hestkirin.

Tiştta ku diselmêne helbestên Ehmed Muxtar Beg, pir in bi hestên resenên nazenînev e; di wan helbestên ku ji bo bilavkirina mebest û çespendina îdeolojiyekê raçandine û bi hestên gernasî û dîlawerî darijtine de, bi şêweyek zor ciwan ji me re qala niştimanperwerî û şoreşgeriyê dike. Bo nimûne helbestvan bi vê helbestê hestên xwe ên niştimanperweriyê derdibire:

“Le xew helsin direnge mîlletî kurd xew zerertane,
Hemû terîxî ‘alem şahîdî fezl û hunertane” r. 146.

Di vê beytê de helbestvanî gelek bi ciwanî û hûnermendane basî behremendiya kurdan a dahênane kiriye û jêhatiyane hunera rûnbêjiyê (zanista El-Bedî) di helbestên xwe de bi kar aniye. Her wiha helbesta helbestvanî ta radeyekê riya şêwazê darijtina nûjen wergirtiye. Helbestvanî bi zimanek edebî ê sade û klasîkî bêje û têgehên erebî bikar anîne. Helbestvanî di beyta jorê de bi ciwantirîn şêwaz îşaret bi niştimanperweriyê kiriye û gelê kurd di vî warî de hişyar kiriye. Dibêje ji

xevê hişyar bin, mebesta wî xev bixwe nîn e, belkû mebesta wî hişyarkirin û agadarkirina gelê kurd e, di warê wan tiştên ku dê di pêşerojê de bêne pêşyan wan. Wate hewl dide gelê kurd di warê wê bêdadweriya ku di wê serdemê de li hember wan tê kirin, agahdar bike. Helbestvanî her tim hewl daye, niştimana xwe, ramanênkurdayetî û şoreşgeriyêpêş bixe. Her wiha helbestvan di helbestek din de, ku pir e li hestên niştimanperweriyê, wiha dibêje:

“Be xorayî le destî bermeden em xake mehbûbe,
Ke tozî wek cewahîr surme û kuhlî besertane,
Be ser xaka eger nazîş biken heqtane kurdiye,
Temaşay sêberî ew şax û kêwe wa le sertane,
Be bê qedrî be serya ramebûrin hurmetî bigirin,
Gule surey em sehraye xwênawî cigertane” r. 146.

Di vê helbestê de em dibînin ku helbestvan rêzek hêja ji xaka Kurdistanê a pak re digire û xaka Kurdistanê wek xakek dagîrkirî dizane. Li gor helbestvanî sedema vê yekê jî nezanîn e, ku Kurdistan ji bo mayek dûr û dirêj, êxsîrê vê yekê bûye. Wate xelkê wê serdemê nezan, nexwandevar û paşkevî bûye, boye dibe em xwe bi zanist û zanyariyan ji vê bindestî û paşkevîbûnê rizgar bikin, bi dilsoziyek pir qewî û dengê bilind bangewaziya azadî û serxwebûnê bikin û ta ku guhê dijmin û dagîrkeran tije dibe. Helbestvan di dawiya helbestê de ji gelê kurd daxwaz dike ku hişyar, rêkûpêk û çalak bin, agah li xwe hebin û vê baş bizanin ku her kevirek van çiya û girikane bi nîrxê elmas û cewheran e. Bi vî awayî, di çerçeveya vê helbesta niştimanî de, hest û sozên helbestvanî bo me aşkira dibin, ka çend bi dilekî pak û bêgirûz helwesta xwe nîşan dide û ka çend di xema gel û niştimana xwe de ye.

Bi rastî helbestvanî dilsozî, xebat û keda xwe bi awayî niwand. Her wiha tenha ev helbeste niştimanperweriye di dîwana helbestvanî de nîn e, dema rûpelên dîwanê têne wedan, tê dîtin ku hejmarek baş a van helbestane heye û di hemû van helbestane de helwesta helbestvanî a ciwan û merdane tê dîtin. Helwesta wî wisa bû, nedibû ji ber dildarî û evîndariyê xak û ava xwe ji bîr bikin. Paşan helbestvan rewşa niştimana me pîşanî me dide û çareserkirina vê birînê ji me re dibêje. Wek:

“Niştîman birîndare wextê efsane niye,
Le ber çavan sêdare, wextî bêgane niye,
Ey cenabî pîremêrd salî dîdey germ û sard,
Bo çî to pir ekey derd? Wextê meyxane niye...”⁹²

Helbestvan di vir de qala birîndarbûna niştîman û nexweş êxistina ciwaka kurd, ji kurdan re dike, ku bi destê biyanî û dagîrkeran encam daye. Boye ji gelê kurd re dibêje dema efsaneyan nîn e, ji bo çareserkirina derdê niştîmanhewl bidin, çunke niştîman birîndar e. Di berdewamiya helbestê de dibêje nitîman pir bûye li biyaniyan û bang li rihspî û kesayetiyên girîng ên wê serdemê dike û dibêje hûn jî ji bo çareserkirina birîna niştîmana birîndar dest ji meyxaneyan bikêşin û derdê Kurdistan û niştîman çareser bikin.

Helbestvan di helbesteke din a lîrik û niştîmanperwerî debi wesifkirina xwezaya Kurdistanê lavahiyan lê dike û dibêje:

“Ey weten cenetî ya rewzeyî rîzwanî to,
Bayîsî keyfî dile bax û gulistanî to,
Tozket surmeye bo çav û ‘ebîre xakit,
Raste eger bilêm qîbley kurdanî to,
Em gulalane ke lem kêw û keje xeyme eden,
Hemû temsîlî eken xwênî şehîdanî to” r. 163.

Mebesta helbestvan di vir de ev e, baş wesfê niştîman bike ta ku Kurdistan şirîntir û xweşewîsttir bibe. Her wiha helbestvan di warê gelê kurd de geşbîne û dibêje qewmê kurd zîrek e û bi hîç şeweyekê kêmasiyên wan nîn in. Di berdewamiya helbesta xwe de dibêje hûn her tim hêviya gelê xwe ne û ez bi serbilind im û şanazî bi we dikim. Axa we gelek pîroz e, toza wê wek surmeyê, axa wê pir e bi bêhnên xweş û tenanet ew wek qîbleyê ye ji gelê kurd re; wate hinde şirîn e bo me.

⁹² Îzedîn Mistefa Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986.

Ehmed Muxtar Caf wek helbestvan di wê serdemê de ji bo pêşkevtina gelê kurd gelek girîngî daye rojname û çapxaneyê, çunkedi pêşkevtina gelekê ev tiştene gelek girîng bûn. Wê serdemê gava di kovara Bangî Kurdistan de dinivîsî û rojnameya Kurdistan di destpêka sedsala bîstan de hatibû bilavkirin, di warê vê rojnameya pir bi nirx û qîmet hestên xwe derbirîne û di rûpela 144. a dîwana xwe de basî kiriye, her bi vê yekê jî ranewestayê û bi zimanê farisî helbestek şeş beytî bo nivîsîye.”⁹³

“Bangî Kurdistan e wa diyay îhya kirdûye,
Zamî qelbî kurdî bêçare mudawa kirdûwe,
Bayîsî pêşkevtinî ev qewmeye ev metbe’e,
Elheq emro xakî Kurdistanî zêba kirdûwe” r. 144.

Wataya helbestê gelek rûn û aşkira ye, qala dezgahek çapkirinê dike ku rêxweşker e ji bo pêşkevtin û pêşdeçûna gelê kurd ê mezlûm û her wiha qala çareserkirina birîna gelê kurd dike. Her wiha di helbesta farisî a şeş beytî de jî gelek ciwan qala vê rojnameyê dike û dibêje:

“Subh çûn xurşîdê rexşan ser bêzerd ez kuhsar,
Bangî Kurdistan ma pir tufşan şad eşkar,
Çûn nesîm ‘ilm ve ‘irfan ber mişam mawezîd,
Xerab pir şub cehalet kerd ez serha fêrar” r. 73.

Ehmed Muxtar Caf, “Ev helbeste di roja 28/08/1922’an de, di 4. hejmara kovara Bangî Kurdistan a sala yekemîn de, bi navê qaymeqamê Helebce bilav kiriye.”⁹⁴

Her wiha em dikarin bibêjin Ehmed Muxtar Caf ji aliyê rûxsar ve helbestên xwe hemû li gor behreyên ‘Erûz darijtine û gelek ji wan behreyên Hezec û Rîmel in. Çend daneyek nebi ku li ser behreya Mizari’ in. Ev helbestene li gor behreyên asan hatine nivîsîn, boye awaz û rîtma helbestên helbestvanî asan û rewan têne fêmkirin.

⁹³ *Dîdarî Taybet be Şair Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, Çapa 1., 2013, r61.

⁹⁴ Îzedîn Mistefa Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986, r73.

Her wiha helbestvanîqafiye û paşqafiye li ser bingeha yekîtiya qafiyeyan danane ji bo ku em bi asanî têbigihin.



BEŞA YEKEMÎN

MANENDIN (el-TEŞBIYE)

Behsa Yekemîn:

Pênaseyên Manendin û Bingehên Wê

Behsa Duyemîn:

Cureyên Manendinê di Helbestên Ehmed Muxtar Beg de.

Behsa Sêyemîn:

Girîngiya Manendin û Mebestên Wê di Helbestê de

Behsa Yekemîn:

Pênaseyên Manendin û Bingehên Wê

Manendinyek ji hunerên here diyar û girîng a rûnbêjî û rewanbêjîyê ye, “Asantirîn cureyê wan pêkhênerên rewanbêjîyê ev e, di dahênanan de wêne dirust dikin, helbestvan jî zêdetir azad û serbest dibe û ji bo helbestvanî qadek berfireh peyda dibe. Her wiha em jî di wê baweriyê de ne ku hunera here serekî ye, ne tenê di helbestê de, belkû di zimanê rojane ê gel de jî di dema axaftinê de tê bikaranîn.”⁹⁵

Li gor boçûna rewanbêjan reng e hunera lêmanendeyekemîn hunera rewanbêjîyê be, pêş ku ew zaniste bê zanîn û hunerên wê bên destnîşankirin, yan eger bi zelaltir bê gotin; dibe pêş ku nivîsîn hatibe darijtin, her mirovên destpêkê ev hunere bi kar anîbin. Dibe ev yeke jî, ji bo ku bikaribin mebestên xwe bi wêneyên dirust, an qe nebe bi wêneyek nizîk ji wan mebestên ku di serê wan de ne, bi riya hunera lêmanendeyêbi kesên beramberê xwe re bigihînin. Êdî ji wê rojê ve ta roja îro di wêje û axaftina rojane a asayî de sûd ji wê hunerê tê wergirtin. Tenanet ta mirov bimine, ev hunere jî dê her bimîne û kes nikar wê piştguh bixe.

⁹⁵ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî*, Silêmanî, 2014, 47.

Boye hatiye gotin: “Lêmanende yek ji şeweyên here kevn ê hunera rûnbêjiyê ye, ji bo li yek têgihiştinê wesîleya xeyal û nêzîkkirina wan bi yek ve ye.”⁹⁶ Mihemed Zexlul jî di warê hunera manendin de wiha dibêje: “Manendin ev yeke ye; biryar bête dan, di hest de an di mêjî de, ji du tiştan yek cihê yekê bigire. Her wiha dibe ku manendin di gotin an di derûnê de be.”⁹⁷ Lêmanende beşeke rûnbêjiyê ye û ji bo aşkirakirina nihênîyên ziman, rêxweşker û alîkar e. “Manendin eve ye; tiştêkê bişibînî tiştêk din ku ji aliyê taybetmendiyek an zêdetir ve hevbeş bin û her wiha yek ji wan hêmayên ku qala wan hatiye kirin an nehatiye kirin, pêkhateya hevokê amaje pêbîke. Rûnbêjî bi hemû ciwaniya xwe dewr dibîne û perde li ser tiştên weşartiyê radike û bi awayî guhdar û xwendekar ji wata û mebestan têdigihin û her wiha di wê dema ku xwe bi mezinahî dişibîne an nîşan dide, rûpîvana sifetahunera manende bo me dike, çünke mebesta manendinê bêhedî ye. Bêhedî jî an pesindan e an biçûkxistin û şikandin e. Bi watayak din ji bo ku mebest û wata rûntir û aşkiratir be, dibe ji van sê halane dernekeve ta ku manendindi hemû şibandinekê de rêkûpêkî û rewaniya xwe werbigire.”⁹⁸

Qudameyê kurê Ce’fer di warê manendin de dibêje: “Tişt bi xwe ve nayê şibandin û her wiha tiştêk jî bi tiştêk din ve tê şibandin, ku di navbera wan de hiç taybetmendiyek hevpar nebe. Çünke ev du tişte eger di hemû waran de li yek biçin, hingî dibin heman tişt. Dema di vir de Qudame dibêje tişt bi xwe ve nayê şibandin; wê gotinê pêwîstî bi şîrove û ravekirinek din nîn e, çünke di vir de tenha watayek, rastiyeke, sifetek heye ku ew jî li yek neçûne. Wate taybetmendî an sifetek nîne, bibe wesîle ji bo ku manendin dirust bibe ku dibêje eger ji hemû rûyekê ve li hev biçin, eve dibin heman tişt, yanî rastî û sifet yek digirin.”⁹⁹ Her dîsa Qudame bixwe di ciheke din de di warê manendin de dibêje: “Baştirîn manendin ev e, ku her du alî di

⁹⁶ Îdrîs Ebdulla Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemî û Hacî Qadirî Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind Nehatiye Çapkirin), 2010, 75.

⁹⁷ Mihemed Zexlul, *el-Mesteleh Neqdî fî Dirasat el-Quraniye*, el-Me’arif el-Cedîd, 1988, 387.

⁹⁸ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 121.

⁹⁹ Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Hunerî Rewanbêjî le Şîrî Nalî de*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Weşandin), 2000, 40.

gelek sifetan de hevbeş bin, ta ku ji hev ciyawaz bin. Tenanet hinde ji hev bèn nêzîkkirin ta wek yek lêtên.”¹⁰⁰

“Lêmanendin peywendiyê berawirdî ye di navbera du aliyan de, çunke di vir de, du alî bi yek taybetmendî an bi yek rewşê an jî bi çend taybetmendî û rewşan li gel yektir de yeklayî û hevbeş in. Tê şîyan ew peywendiyê bidin pişt hevbeşiyekî hestî, her wiha tê karîn bidin pişt hevbeşiyek hukmî û hevbeşiyek jîrane jî ku her du alî hatine berawirdkirin û bi pêk ve hatine girêdan, bêyî ku her du alî di rûyê ceste û hemû taybetmendiyekê li hev biçin.”¹⁰¹ Ebubekir El-Razî dibêje: “Lêmanende nîşaneyê hevbeşkirina du tiştan e di hindek sal û xetan de, dîsan her bi heman mebestê (Zirkêşî) dibêje; lêmanendin; peywendî dirustkirina tiştê ye li gel tiştê din aku xwediyê sal û xet û sal û xetên wî de.”¹⁰²

“Lêmanende wek şewazek ji şewazên derbirînê xwediyê girîngiyek mezin e, çunke xelk li gel vê hunerê aşna û asûde ye, an ji ber ku di nivîsên xwe de bi kar tînin girîngiyê pê didin. Boye di hemû zimanekê de heye û zana û nivîskar di hemû aliyan de bi kar tînin û sûdê jê werdigirin, ji bo ku bigihin mebestem xwe. Eger em temaşeyî nivîsên zanistî, lêkolînên yasayî, xebatên edebî û her cure dahênanekî din em dibînin hemûyan bi rengekê ew hunere bi kar anîne.”¹⁰³ Sedema bikaranîna vê hunerê di helbestê de ev e; helbestvan, nivîskar an her nivîstekek din a edebî pisporî û jêhatîbûna nivîskaran ji bo me derdixê holê. Mirov her di kevn de hunera lêmanendeyêbi kar anîye û di gel de berdewam bûye û ta niha jî ji bo rûnkirin û asankirina zanyariyan hunerek rêxweşker e. Her wiha ev hunere ji hemû hûnerên din ên rewanbêjiyê girîngtir e, bêyî ku rexne lê bèn girtin.

Her di warê lêmanendeyê ê lewçû û lêçûde Selah Fazil dibêje: “Ew lêmanendeya ku aliyê wê ê lêmanende an ew têgeha ku tê dederdikeve, nêzîk e bibe cureyek li berawirdiyê di navbera du tiştên ku di berrahiyê de nabe wesileya bercestekirina wan di xeyalên bêjer û guhdarî de, da ku tenha pişt bi xala ji yektêgihîştinê ve girêbidin. Ji bo ku, serbixweyiya tiştan li derve diparêze, tenanet

¹⁰⁰ h.ç., 40.

¹⁰¹ Derya Cemal Hewêzî, *Wênayê Rûnbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Teya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 61.-62.

¹⁰² Mesud Yasîn Çelkî, *Rolê Hunerên Rûnbêjiyê di Çêkirina Wênê Hozanê Kurdî de*, Hewlêr, 2012, 49.

¹⁰³ h.ç., 64.

bêyî ku berahhiyek nû di navbera wan de dirust bike, ji bo wan dest ji dirustkirina qewareyek serbixweyî dikêşe.”¹⁰⁴

Diyar e ew ciyawaziya di navbera lêçû û lewçû de heye ku Mihemed Fituh jî her bi heman şêwe pênase dike û Ehmed Mera’î jî wek kesek nû, bi zimanek gelek asan dibêje: “Bestina sifetê lêçû bi sifetê lewçû, wate watayek hevbeş di navbera wan de heye, ku lêkçûn e.”¹⁰⁵ Her wiha ji ber ku cureyên lêmanendeyê pir in, hinek zana û nivîskaran pênaseyên ciyawaz bo kirine, wek: “Em dikin wiha qala lêmanendeyê bikin; ji bo rakirina perde ye li ser tiştêkî weşartî, wate ji bo ku tiştêk nihênî nemîne û her tiştêk aşkira bibe, têbikaranîn.”¹⁰⁶ Nivîskar, lêkoler û rexnegirên zanista rewanbêjiyê li ser vê yekê hevdeng in, ku hunera manendin ji çar bingehan pêktê û du ji wan serekî ne, du ji wan jî lawekî ne. Wek:

Yekemîn:

Manende; “Manende, wate şibandîna tiştêkê bi tiştêk din ku li xwe diyartir be di aliyê sifetên hevbeş ên di navbera wan de hene û her wiha aşkirakirin û zanîna heman sifetê ku di tiştê yekemîn de heye.

Duyemîn:

Lêmanende; wate ew tiştê ye dibe awêneya nasîn û aşkirakirina sifetên manende ji bo hevbeşkirin û lêmanendinê. Di wan her du pênaseyane de, manende-lêmanende, ku du aliyên hunera manendinê ne, ji me re derdikeve; ew tiştê ku derbir dixaze amaje pê bike, dibe xwediyê sifetekê be ku pêwîst bi aşkirakirin û rûnkirinê hebe û her wiha bi berawirdkirin û hevbeşkirina sifetên hevbeş û hevşêweyî ên ji xwe aşkiratir û diyartir ku pê hatine lêmanendin. Çunke di şêwazê manendinê de, dibe di navbera du tiştan de hinek alî ji hev ciyawaz bin û hinek alî jî wek yek bin, bi awayekî ku lêmanende bibe terazî û awêne ji bo zanîna çawaniya sifetên hunera manendeyê.”¹⁰⁷

¹⁰⁴ Serdar Ehmed Gerdî, *Binyadî Wêney Hunerî le Şîrî Kurdîda (1970-1991)*, Silêmanî, 2004, 229.

¹⁰⁵ Ehmed Mistefa el-Mera’î, ‘*Ulum El-Belaxe*, 205.

¹⁰⁶ *Xoşxwanî Eladîn Secadî*, Bexdad, 1978, 44.

¹⁰⁷ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 123.

Sêyemîn:

“Daçekamanendinêan daçekalêmanende: Ew daçeke ye ku manende û lêmanendeyê bi hev re girêdide. Dişê bê bikaranîn an bê rakirin.

Çaremîn:

Hêla manendeyê; Sifetê hevciwandinê ê di navbera manende û lêmanendede ye.”¹⁰⁸ Her wiha sifet an taybetmendiya hevbeş ên di navbera hunerên manende û lêmanende de hene û her duyan bi hev re girê didin, pêktên ji: “Wê taybetmendiya ku her du bingeh an pêkhate tê de beşdar bin, pêwîst e lêçû li gor lewçû bihêztir be, wate dibe lêçû ji aliyê wata û şiyane ve ji lewçû bihêztir be.”¹⁰⁹ Hêla manende, sifet an taybetmendiya hevbeş ê di navbera her du aliyan de ye ku wêneyên lêmanende li ser tîr damezrandin. Îdrîs Ebdulla jî her wek li serê hatiye gotin, difikire û dibêjehêla manende: “Sifetê du tiştên ji hev diçin e, ku tê de hunera lêçû û lewçû bi yek diçin.”¹¹⁰

Li gor zanayek din ê rewanbêjiyê mercek serekî ê ji bo hêla manendeyê ev e, “Dibe pitir taybetmendî di navbera her du aliyan de hebin ji bo ku di mebesta karê axaftinê de em hunera lêmanendeyê diyar bikin.”¹¹¹

Ehmed Muxtar Caf, di vê helbestê de her çar binemayên serekî ên hunera rûnbêjiyê bi kar anîne û dibêje:

“Be yadî çawekanî daîme min mest û heyranîm,

Le Îşqî qametî qurban weku zulfî perêşanim” r. 82.

Min/ez (Ehmed)Manende, ZulfîLêmanende,

WekuDaçekamanendinê, PerîşanHêla manendeyê.

¹⁰⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 50.

¹⁰⁹ Îbn Ebdulla Se’îb, *el-Misrî fî el-Belaxe el-Erebiye*, ‘Ulim el-Beyan – ‘Ulim el-Me’anî – ‘Ulim el-Bedî’, *Derusu el-Timarîn, el-Cezair Dar el-‘Edî ‘Eyn Milile*, 33.

¹¹⁰ Îdrîs Ebdulla, *Kowanekani Rewanbêjî*, Hewlêr, 2014, 147.

¹¹¹ Îsa ‘Elî el-Makum, *el-Mef’ul fî ‘Ulim el-Belaxe el-‘Erebiye*, Çapa 1., Weşanxaneya Qelem, Dubeyt, el-Îmarat, 1996, 369.

Helbestvan di vir de dibêje; ez bi bîrkirina çavên te her tim mest û heyran im, ji ber evîna te ku wek zulf an porê te her tim perîşan im. Helbestvanî di vê helbestê de gelek bi şarezaiyane her çar binema bikar anîne. Her di helbestek din de jî dibêje:

“Ewende min le hîcrî weslî to zarî ekem cana,

Weku dawênî elwen daîma min sûre daman im” r. 82.

Min/ez (Ehmed)Manende e, Dawênî ElwenLêmanende e,

WekuDaçekamanendinê ye, Sûr.....Hêla manendeê ye.

Helbestvanî di vê beytê de jî her çar binema bi kar anîne. Her çend e li gor hin bîr û boçûnan erger her çar binema di helbestê de bîn bikar anîn, ev dibin sedema naahengiya wataya beytê, lê belê em dibînin Ehmed Muxtar Caf di vê beytê de wêneyek hin ciwan bo me dirust kiriye, ku şibandîye damenaelwen wate damena ku wek xwînê sor bûye, yanî ji ber cihêbûn û dûrbûna yara xwe an dildara xwe ewqas giriyaye ta ku dem û çavên wî wek damena elwen sor bûne. Bi vî awayî helbestvanî di vê beytê de jî her çar binema bi kar anîne.

Behsa Duyemîn

Cureyên Manendinê di Helbesta (Ehmed Muxtar Caf) de

Bi pê gelek çavkaniyan, manendin li gor binemayan bi ser çend cureyekê de hatiye dabeşkirin, ew jî;

Yekemîn:

Li Gor Her Du Aliyan (Manende – Lêmanende),

Duyemîn:

Bi Pêy Hatin û Nehatina Hêla manendeyê,

Sêyemîn:

Bi Pêy Hatin û NehatinaDaçekaManendinê,

Çaremîn:

Cureyên Din ên Manendinê.

Yekemîn:

Li Gor Her Du Aliyan (Manende – Lêmanende):

1- Hestî û Jîrî,

2- Bi pê yekjimari û hevedudaniya her du aliyan (Manende – Lêmanende)

3- Bi pê şeweyê hatina her du aliyan (Manende – Lêmanende),

4- Bi pê jimareya her du aliyan (Manende – Lêmanende)

1- Hest û Jîrî /

A / Her Du Alî Hestî Bin:

Wate di vê cure hunerê de dibe manende û lêmanende hestî bin, “Di vê hunerê de mebest ev e; hest bi her du aliyan bê kirin û ji ber her pênc hestan yekê bikevin, ku pêktên ji hestên bînîn, bihîstin, bêhnkirin, tamkirin û destlêdanê.”¹¹²Wate dibe di vê manendinê (manende – lêmanende) de hestpêkirin hebe. Her wiha ev wêneyên di vir de tên dirustkirin, yek ji wan her pênc hestên mirov pêk tên. Helbestvan bi riya her pênc hestan, peywendiyên nû di navbera tiştên dewrûber de dirust dike û ev hestene jî bihêtirîn daçek in ji helbestvanî re ji bo dirustkirina wêneyên helbestî, “Ew şibaka ku zêhn bi riya wê ve hewayê jiyan û ceribandîne hildimije hest in. Di vî warî hest dibin girîngtirîn daçekan zêhnê ji bo wergirtin û bilavbûnê.”¹¹³û helbestvan di vê beytê de dibêje :

“Dil weku bulbul le hîcrî ew gulê efxan eka,

Narî cerg û sozî sînem alemê buryan eka” r. 56.

Dil....Manende....Hestî ye, Bulbul Lêmanende..... Hestî ye,

WekuDaçekamanendinê.

Helbestvanî di vir de bi şeweyekî gelek ciwan dil şibandiye bilbilê, ku her du wek manende û lêmanende hestî ne, yanî yek ji wanji ber her pênc hestên mirov dikevin. Wek di mînakek din de helbestvan dibêje:

“Ke derxa dulberim ew gerdinî safî bilûrînî,

¹¹² Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehî da*, Silêmanî, 2014, 54.

¹¹³ Seîd Farûq Yusif Şêx Bizinî, *Binyatî Hunerî le Şîrî Ehmed Muxtar Begî Caf da*, Hewlêr, 2011, 185.

Le pencem mû derê, ger dest dirêjkem bo milî Mîna” r. 60.

Gerden....Manende....Hestî ye, Bilûr Lêmanende..... Hestî ye.

Wate helbestvanî di vê beyta jorê de bi şêweyek pir ciwan, jîrane û pisporane bi hunerên manende û lêmanendebî riya hestekê jî bo hestek din, wêne jî me re kêşane. Helbestvan di vir dibêje; eger dildara min jî min re vê gerdena ciwan û safî derxe, ku wek bilûr saf, spî û ciwan e; jî tiliyên min mû derkevin ger ez destê xwe dirêjî gerdena Mîna bikim. Wate helbestvanî di vir de bêjeya (mîna) bi kar aniye, ku mîna di helbesta klasîk a kurdî de û destpêka helbesta kurdî a nûjen de bi wataya ciwanî, gewherî û xweragirî tê bikaranîn ku di helbesta klasîk de remz û sembol in.

B /Hestê Bi Jîrî:

“Di vê cure hunerê de manende hestî ye, lêmanende jîrî ye. Wate hestiyek bi jîriyekê tê şibandin.”¹¹⁴Her wiha Ehmed Mistefa El-M’eranîjî di warê hunera hestê bi jîrî de, dibêje: “Di vê manendinê de manende hestî ye û lêmanende jîrî ye, boyebi riya eqil jîjîriyê têdigihin.”¹¹⁵Helbestvan Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Qametit bo min wekû rojî qiyame çawekem,

(Ehmed) Îtir heşr û neşir û nefxî sûrim bo çiyê” r. 146.

Qamet....Manende....Hestî ye, Rojî qiyamet ... Lêmanende... jîrî ye,

WekuDaçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de bo me wêneyek gelek ciwan sazandiye, an dirust kiriye, ku qameta dildara xwe dişibêne roja qiyametê. Di vir de qamet manende e boye hestî ye, wate em hest bûna qametê dikin; roja qiyametê jî lêmanende û jîrî ye, wate em bi riya hizr û jîrî hest bi hebûna qiyametê dikin.

C / Jîrî bi Hestî:

Di vê cure manendinê de, “Tişta ku jîrî ye, tenha bi riya bîr, hiş û şîrovekirinê dikarê bê zanîn û jî ber hîç hestekî mirovî nakeve. Di vir de tişteke jîrî bi

¹¹⁴ h.ç., 56.

¹¹⁵ Ehmed Mistefa el-Me’ranî, ‘Ulim el-Bekaxe el-Beyan ve el-Me’ani ve el-Bedi’, Beyrût, 197.

tişteke hestî tê şibandin, boye ev yeke karek pir bi qewî û bi hêz e. Çünke lêçû ku tişteke jîrî ye û nayê hestkirin, li gel lewçû ku tişteke hestî ye, tèn beramberkirin.”¹¹⁶

Di vê pênaseyê de jî, hunera jîrî wiha tê ravekirin: “Jîrî watebîr, hiş û ravekirin e. Yanî dibe wek; bawerî, rûmet, wir, diro, rastî, zîrekî, hêminî, bihêzî, hêrsbûn an ew tiştên ku efsane ne û tenha bi xeyalkirinê hebûna heye, bête zanîn.”¹¹⁷“Lêmanendeya jîriyê bi hestiyê, ji bo vê yekê ye; ku wataya vê zêdetir û ciwantir derbikeve. Bo nimûne hêz bi şêr, dirindeyî bi gurg, zanist bi ronahiyê tê şibandin, bi vî awayî tiştên jîrî bi tiştên hestî tèn şibandin.”¹¹⁸ Helbestvan di vê beyta jêrê de dibêje:

“Bixwênin çünke xwêndin bo dîfa’î tîxî duşmîntan,

Hemû an û zemanê ‘eynî qelxan û sûpêrtan” r.146.

Xwêndin....Manende....Jîrî ye, Qelxan û Sûper... Lêmanende... jîrî ye,

‘EynîDaçekamanendinê.

Helbestvan di vir de bi şeweyek jîran e, ji me re dibêje bixwînin, çünke xwandin dê we ji kemîn û xirabiyên dijminên we biparêze. Bi vî awayî xwandin şibandiyê mîrtal û sengerî. Bi watayek din helbestvan dibêje eger hûn xwandevar, hişyar û tîgîhiştî bin, ew zanist û xwandevariya ku we heye dê her tim wek mîrtal û sengeran we ji bêdadî, paşverûya ciwakî biparêze. Boye helbestvanî ji me re wêneyek gelek ciwan dirust kiriye ku ji jîrî ve ber bi hestî diçe. Her di beytek din de jî Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Witim min rohî xom qurbanî rûy to kird desa rehmê,

Witî nazanî to perwane bo dewrî çira çake” r. 124.

Roh....Manende....Jîrî ye.Perwane... Lêmanende... Hestî ye.

Helbestvanî di vir de ruhê xwe şibandiyê perperokê yanî ewqas di dewrê evîna xwe de ziviriye, ta ku ruhê xwe ji dest daye. Bi watayek din çawan perperok di

¹¹⁶ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., 40.

¹¹⁷ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 123.

¹¹⁸ Îdrîs Ebdûla Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lisansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2010, 85.

dewrê agirê çira de dizivire ta ku agir wê dişewitîne, helbestvanî jî her bi heman şêwe jiyana xwe qurbanî dildara xwe kiriye. Di vir de ruh jîrî ye û perperok hestî ye.

D / Jîrî bi Jîrî:

Di vê mijarê de dibe nivîskar an dahêner kesek jêhatî be û xwediyê bîrkirinek baş be. “Yanî her du aliyên ku tên manendin, bi hîç şêweyekê nayên hestkirin; tenha bi riya eqil, zîrekî û awez ve tên îdrakkirin. Di vir de zanist bi jiyane, nezanîn bi mirinê... hwd. tê manendin”¹¹⁹ “Mebest li jîrî bi jîrî ew e, her du pêkhateyên serekî (lêçû-lewçû) bi riya eqil bîn îdrakkirin û li ber hîç hestekî mirovî nekevin. Wek; (bîr, rewîşt, bext, hêvî, zanist, zîrekî, hêzdarî, hêrsbûn, nazenînî, bexşendeyî...hwd.”¹²⁰ Di helbestên helbestvanî de zor bi ciwanî hatiye bikaranîn, wek dibêje:

“Ey weten cenetî ya rewzeyî rîzwanî to,

Baîsî keyfî dile bax û gulistanî to” r. 163.

Weten....Manende....Jîrî ye.Cenet û Rewezî Rîzwan... Lêmanende ...Jîrî ye.

Helbestvanî di vir de niştiman şibandiye beheşt, rewzen û rîzwanê ku her du jî jîrî ne, yanî manende û lêmanendene. Helbestvanî ew xak û niştimana bixwe û em li ser dijîn şibandiye beheşt û baxên wê. Wate xak û niştiman li cm helbestvanî ewqas pîroz û bi nirx bûye ta ku ew şibandiye bi biheşt û baxên wê, ku her du jî jîrî ne. Her wiha di beytek din de jî helbestvan dibêje:

“Weten fermûy be xendey nazewe her wek perî wame,

Ema heyfê ke çend sale exsîrî pencey dêwim” r. 86.

Weten....Manende....Jîrî ye, Perî... Lêmanende... Jîrî ye.

Wek....Daçekamanendinê.

Her bi heman beyta jorê helbestvan wêneyek ciwan bo me afirandiye û her du pêkhateyên wê jîrî ne û weten, niştiman û xak şibandîne periyê. Di vir de perî nîşaneya pakî, bêgirûzî, ciwanî, narînî, xweşewistî û nazenînbûnê ye, bi watayek din helbestvanî niştiman şibandiye periyê ji bo ku em wek periyê jê hez bikin. Lê belê di

¹¹⁹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 60.-61.

¹²⁰ h.ç., 84.

duyemîn dêra beytê de helbestvan dibêje, mixabin çend salek e em di nav destên dêwekê de ne, yanî xak û niştiman me ji aliyê dijminan ve hatiye dagîrkirin û em bindest in.

E / Ji aliyê Hestî û Jîrî ve Wêne:

Ji ber herstên mirov ew wêne an dîmenê ku di helbestê de tê dirustkirin, ji aliyê yek ji hestên mirovan ve tên hestkirin. Her wiha ji ber girîngî û zêdetir ravekirinê cureyên wêne û dîmenên helbestî, li gor hestên mirovan di baxê helbestvaniya Ehmed Muxtar Begê Cafî de pir in û emê ji wî baxî ninûneyan werbigirin û ravebikin, ta ku em bizanin helbestvanî ev wêne û dîmenene di çeweya her pênc hestên mirovî de, li gor hunera lêmanendeyê çawan afirandine û ew ta çî radeyekê di vî karê hunerî de zal e an desthilatdar û jêhatî ye.

Wêneyê Hestî: Ev hunere “Hemû wan wêneyane digire ku ji ber yek ji hestên mirov dikeve ku ew jî ji hestên bînîn, bihîstin, bêhnkirin, tamkirin û destlêdanê pêk tên. Wate xwendekar hest bi hebûna yek ji wan hestan dike. Helbestvan bi riya hestan peywendiyên nû di navbera tiştên devrûber de dirust dike. Hest jî bihêztirîn amûr in ji helbestvanî re, ji bo dirustkirina wêneyên helbestî.”¹²¹

1- Hestê Dîtinê:

Ew wêne an dîmenên bi riya çav tên dîtin, dikevin bêr vê hestê. Hestê dîtinê li ser hemû hestên din de tê yanî ji hemûyan girîngtir e. Ev hestedi jiyana mirov de, bêyî ku mirov û tişt ber yek bikevin, gelek zanyariyan rewaneyî mêjkê mirov dike. “Ev heste wek dayîka hestan tê pejirandin, reng, xêz û dîtinê li xwe digre.”¹²² Dema em temaşeyî dîwana Ehmed Muxtar Beg dikin, em dibîn ku ev cure wêneyene di dîwana wî de cihek mezin digirin, tenanet eger li gel cureyên din bê berawirdkirin ev heste di asta yekemîn de dêt. Helbestvan di vê beyta jêrê de dibêje:

“Meylî seyrî bedir eka dil, lade zilfî wek hîcab,

Derxe bedrî rûmetî xot şoxekey ‘alî cenab” r. 61.

¹²¹ Seîd Farûq Yusif Şêx Bizinî, *Binyatî Hunerî le Şîrî Ehmed Muxtar Begî Cafî da*, Hewlêr, 2011, 185.

¹²² Hîtle Ehmed, *Wêney Şîr Lay Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Selahedîn, 2001, 126.

Helbestvan di vir de daxwaz dike temaşeyî meha çarde bike, mebesta wî ji meha çarde, rûyê evîndara wî ye. Lê belê biskan wek desmala reş dem û çavên yara wî girtine û ew ji dîtina ciwaniya wê bêpar kirine. Helbestvanî bi riya hunera lêmanende wêneyek pir ciwan bo me dirust kiriye. Rûyê evîna xwe çiwandiyê meha çardeyê, yan rûyê evîna wî wek meha çarde direwşe, dibiriqe. Bes biskan rûyê yara wî dapoşî ye û ew nikare ciwanî û delaliya yara xwe bibîne. Boye helbestvan ji neçariyan, ji delala xwe daxwaz dike ku biskên xwe bide paş û dem û çavên xwe ên wek meha çarde derxîne holê. Wate wêne li ber hestê dîtîne dikeve, lê belê hestek ku hatiye perwerdekirî, bi tamedek geşawe bi riya dîtîne ve pireke peywendiyên dirust dike û careke din li geltêkel dibe û di berdewam debi zîniyekî huner dostane lê temaşe dike. Rûyek ku ji aliyê ciwanî û biriqînê ve li heyve şevê diçe, ji aliyê por û biskên reş ve hatiye dapoşîn, peçawtin. Helbestvan di beytek din de bi heman şêwe dibêje:

“Hemîşe lalezare dewrî qebristanî ‘uşşaqit,
Eken temsîle lêwî le’l û kulmî al û rengînit” r. 67.

Li gor helbestvanî di vir de ew kesên ku evîndarê rûyê dîlberê ne, hemûyan serê xwe jê re tewandiyê û jiyana xwe gorî kiriye. Niha dewrûberê goristanên wan gulaleyên sor jê derdikevin û ew gulale sorene ewqas narîn in, wek lêv û lamên yarê ne. Sedema vê ciwanî û narîniyê ev e; dîlber tîbûna xwe bi xwîna dildarên xwe dişkêne û soratiya lêvan û hinarokan ji xwîna dildaran tê. Wêneyekî ciwan ê hestî kêşaye ku li ber hestê dîtîne dikeve û ev wêneye bi riya lêmanendeyaaweju dirust bûye. Helbestvan di beytek din de jî dibêje:

“Dil perîşanim le hesretî perçemî şêwawî to,
Rojî reş kirdim be carê zilfî alozawî to” r. 164.

Li gor helbestvanî rengê reş li cem kurdan nîşane û wataya bêhêvîtî, xem, nexweşî, jihevcihêbûnê ye, wate kurd li ser vê yekê pêk hatine, boye wî jî di vir de rengê reş bi kar aniye û dibêje; ji ber ku tu ji min dûr û qetiyayî, roja min wek biskên te reş e. Helbestvanî di vir de bi riya hestê dîtîne ji bo me wêneyek an dîmenek nexweş û bextreş dirust kiriye. Di beytek din de;

“Kewte ser rûmetî alit ‘areqî naz êsta,

Her elêy şewnimî pexşane be ser bergî gula” r. 51.

Helbestvan bi şeweyek hûrgilane bala me ji bo wê dilopa xwêdanê dikêşe, ku li ser rûyê dîlberê dîtiye. Wî ev dilope şibandiye dilopa ava ku beyaniyan li ser pelgên gulan tê dîtin. Helbestvanî di vir de hûrgiliyek gelek ciwan kiriye û rûmet û xwêdan ku wêneyê yekemîn in, şibandiye şehî û pelgên gulê ku wêneyê duyemîn in. Helbestvan, wî hestê xwe ê nazik û bedew bi riya kêşandina du wêneyan derdixe holê û me neçar dike ku em hêsirên nazik û şehiya ku li ser pelgên gulan e, bidin ber hev. Helbestvan bi avayî wêneyek nayab dirust dike ku ber hestê dîtinê dikeve.

2- Hestê Bihîstinê:

Wan wêneyan li xwe digire, ku bi riya hestê bihîstinê mirov dikare pê bihese. Wate hemû wêneyên ku deng in, dikevî nav vê hunerê de. “Wan wêneyan li xwe digire ku li ber hestê guh dikevin, ku li ser bingeha deng tî wergirtin.”¹²³ Bo nimûne helbestvan di wesfê werzê biharê de, ji me re dîmenê gundekê dikêşe ku pir e li dengê kotre, teyr û tilûr, kev, rûbar, çem û keviran... hwd. “Her wêne an dîmenek ku li ser bingeha deng, awaz û musîqayê hatibe avakirin, bi riya hestê bihîstinê baştir tê fêmkirin û hest bi xweşî û ciwaniya wêneyê tê kirin.”¹²⁴ Bo nimûne Ehmed Muxtar Beg bi gelek ciwanane wêneyê vî hestî bo me diafirîne û dibêje:

“Naley sînem wekû ney, ser wekû semtûre bot,

Min be xem şadim êtir keyf û sirûrim bo çî ye” r. 126.

Helbestvan bi riya hunera lêmanende, ji me re dibêje singê min wekney, ku amûrek mûzîkê ye û deng derdixe, dinale. Di vir de nalîna singî çiwandiye neyê, ku çend dengên cur bi cur derdixe; her wiha ser jî şibandiye semtûrê, ku ew jî amûrek mûzîkê ye. Helbestvanî di vir de lêmanendeyek ciwan çêkiriye, ku dibêje ger dilê min her tim pir be li xem, min êdî keyfxweşî bo çî ye. Wate dilek her tim binalê û xembar be, êdî keyfxweşiyê li xwe nabîne. Helbestvanî bi riya ney û semtûrê ve

¹²³ Kemal Mistefa Me’rif, “Wêne le Şîrî Qubadî Celîl Zade”, *Kovara Zanîngeha Silêmaniyê Beşa (B)*, 12., Çapxaneya Zanîngehê, Kanûna Yekemîn, Silêmanî, 2003, 124.

¹²⁴ Kerîm Şareza, “Wêney Şîrî le Honrawey Kurdîde Çon Dirust Debê û Çi Hestêk Werdegirê”, *Kowara Raman*, 9., 05.03.1997, 7.

wêneyek dirust kiriye ku ber hestê bihîstinê derdikeve an vî hestî werdigire. Her wiha di beytek din de helbestvan dibêje:

“Sine kun kun bûm wekû ney min le ber hîcranî to,

Ser wekû semtûre, dil her naleyetî wek rûbab” r. 61.

Helbestvan di vê beytê de dubare dike û dibêje ji ber dûrî û cihêbûn ji dildarê singê min wek ney kun kun bûye, bi awayî singê xwe bi neyê çiwandiyê û serê xwe jî bi semtûrê çiwandiyê. Her wiha nalîna dilê xwe jî bi dengê tembûrê çiwandiyê, ku ew jî wek amûrek mûzîkê xwediyê dengê ciyawaz e û bi awayî wêneyek hunerî ji me re dirust kiriye. Di vir de bi bikaranîna bêjeyên ney, semtûr û ribabê ku amûrên mûzîkê ne, wêneyek hestê bihîstinê hatiye dirustkirin ku li ber hestê bihîstinê dikeve. Helbestvan di beytek din de jî dibêje:

“Wekû nalînî min waye le ‘îşqit,

Fuxan û zemzemey bulbul le ser çil” r. 75.

Di vê beytê de helbestvanî bi riya bikaranîna bêjeyên wîte wît û gazînên bilbilê ji me re wêneyek gelek ciwan dirust kiriye, ku em bi riya hestê bihîstinê werdigirin. Di vir de bêjeya ‘Îşq dilê helbestvanî girtiye û şev û roj ji ber dildariya dîlbera xwe dinalîne. Her çend bîr dike nizane ka dê çawa şewazê nalîna xwe derbibire, nizane gelo ka çi heye ku bikare nalîna xwe pê biçiwêne. Tiştêk wisa qewî û bihêz peyda nake, wek çawa bilbil roj ta êvarî ji wê çiliyê bo çiliya din bifire û dildariya xwe ji bo gulê derdibire, ew jî bi heman şewe derbibire ûwî navî bine coş û xiroşê. Helbestvan piştî van hemû feryad û fixanane, li cihê ku nalîna xwe bi wîte wîta bilbilê biçiwêne; wîte wîta bilbilê bi nalîna xwe diçiwêne. Ji vê yekê re lêmanendeya awejû an dijtê gotin, ku di vê hunerê de girîngî bi lêçû tê dan û şûna lewçû tê bikaranîn, ji bo ku hêz û bandora lêçû bê bedîkirin. Wate tiştan bi berewajî pîşan dide. Boye di vê beyte de wêne li ser hestê bihîstinê hatiye dirustkirin û ji me re hatiye pêşkeşkirin.

3- Hestê Bêhnkirinê:

Wan wênayan digire xwe ku bi riya hestê bêhnkirinê tê zanîn an tê dirkpêkirin. Bêguman helbestvan di xulqandina van cure wêneyane de jî xwediyê

dest û behrenmendiyek qewî ye. Di dîwana helbestvanî de beytên bi van wêneyane hatine nivîsîn, pir in. Di vê hunerê de bi riya kepî an poz, hest bi bêhna tiştên ku li devrûber in, tê kirin û bi vî awayî wêneyê bêhnikirinê peyda dibe. Helbestvan di beyta jêrê de bi bikaranîna bêhna gulaw, etir û miska tataran wêneyekî hestê bêhnikirinê bo me dikêşe û dibêje:

“Bilêm bonî gulaw û ‘etre ew zulfe ke hêştake,

Xetayekî ‘ezîme ger bilêm wek mîskî tatarê” r. 113.

Di vir de helbestvan dixaze ji ber bêhna xweş a biskên dîlbera xwe, bêhna wan bişibîne bêhna gulaw û etir, lê belê zû peşîman dibe û paşan bêhna wan dişibîne bêhna miska tataran, çunke hîç miskek wek miska tataran bêhnxeş nîn e. Boye helbestvan bêhna biskên yara xwe dişibîne bêhna miska tataran, lê wek di beytê de jî dibêje; wê yekê jî wek çewtiyek mezin dibîne û wisa pişan dide ku bêhna biskên dîlbera wî ji bêhna miska tataran jî xweştir e. Di vê beytê de derdikeve, helbestvan tiştê lêçû li gor lewçû pesendtir pişan dide, ji ber vê yekê di vir de lêmanendeyek pesenddide heye. Di vê beytê de hestê bêhnikirinê dest kêşa ser wêne de ku bi bêjeyên gulaw, etir û miska tataran pêk tên. Bi vî awayî di vir de bi riya hunera hestê bêhnikirinê ji me re wêneyek hatiye dirustkirin. Di beytek din de jî helbestvan her di he warî de dibêje:

“Labe tu xwa ‘ûd û ‘enber, baî’ sî derdî sere,

Bonî zulfî ew nîgarem mîskî tatarî mine” r. 158.

Helbestvan di vir de hemû cure bêhnekê red dike, li beramber bêhna biskên dildara xwe de û bi awayî dixaze bêhna biskên yara xwe bişibîne tişteke wisa ku di cîhanê de tiştên wek wan nebin. Lê belê hîç tişteke wisa nizane û nabîne ku wek bêhna biskên yara wî bin. Boye bi çavek gelek sûk, bînirx û bêbiha seyrî ‘ûd û ‘enberê dike ku du tiştên pir bêhn xweş in. Dibêje min ‘ûd û ‘enber nevên ji ber ku bûne sedema ser êşiyê li cem min, bêhna biskên yara min ji min re bes e, ku wek bêhna miska tataran e. Boye di vir de jî her bi heman şêwe wêneyê hestê bêhnikirinê ji me re dirust kiriye. Helbestvan di beytek din jî wiha dibêje:

“Qet be bonî zulfî to nabê gulale û yasemen,

‘Etrî tûrey to ne wek ‘ude ne mîslî ‘enbere” r. 111.

Helbestvan di vir de balê dikêşe ser bêhna biskên yara xwe û dibêje bêhna hîç gulekê nagehe bêhna biskên wê. Di beyta jorîn de helbestvanî bi riya bikaranîna bêjeyên gulale, yasemen, ‘ud û ‘enberê wêneyek ji me re dirust kiriye. Di vir de helbestvan ji dil ve dibêje bêhna hîç tiştêkê wek bêhna biskên yara min nîne. Tenanet li gor wê wesfa ku helbestvanî kiriye naxaze bêhna gulale, yasemen, ‘ud û ‘enberê jî bi bêhna biskên yara xwe biçiwêne. Boye dibêje hîç wextêkê bêhna gulale, yasemen, ‘ud û ‘enberê wek bêhna biskên yara min nîn in û ji bo bêhna biskên yara min xweştir e. Helbestvanî bi vî awayî wêneyek ji me re dirust kiriye ku li ber hestê bêhnkirinê dikeve. Her wiha di beytek din din helbestvan dibêje:

“Erzî yarim kird ke bo çî perçem ler rûxsarte,

Pêy witim: Bezme le ber çî ‘ud le ser mecmer nekem” r. 85.

Helbestvanî di vir de bi riya lêmanendeyek narastewxo wêneyek dirust kiriye. Helbestvan ji dîlbera xwe re dibêje bêhna biskên te wek bêhna ‘udê xweş e, te bo çî bêhn li rûmeta xwe daye, yar dibêje; niha şahiya mestan e, ciwîna xweşî û şadîbûnê ye. Ger wisa ye, bo çî vê bêhna xweş nexime ser vê pengira agir û hemû aliyan bi bêhna xweş napêçim. Di vê beytê de derdikeve ku di xeyala helbestvanî de bêhna biskên yarê wek bêhna ‘udê xweş e û ketiye ser rûmeta wê û bi şewitandina ‘udê bêhna xweş hemû alî girtine. Di vir de helbestvanî bi riya hestê dîtîn û bêhnkirinê wêneyek ciwan ji me re dirust kiriye. Hinek caran du an zêdetir hest di dirustkirina wêneyek helbestî de rol dibînin, wek; di beyta jorê de jî derketiye û ku du hest bi pêkve hatine bikaranîn.

4- Hestê Tamkirinê:

Wî hestî jî “Peywendî bi xwarin û vexwarinê ve heye.”¹²⁵ Di wênekirina vî hestî de qala talî, şorî û şîrînî tê kirin. Di dîwana Ehmed Muxtar Beg de girîngiyek taybet bi hestê tamkirinê hatiye dan. Helbestvanî bi şeweyek jîrane û behremendane û bi hestên nazenîn gelek wêne bi hunera hestê tamkirinê dirust kirine. Ev yeke

¹²⁵ Hîtle Ehmed, *Wêney Şîr Lay Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Selahedîn, 2001, 125.

jînişaneyê firexeyalbûn û hestnasikiya helbestvan e. Helbestvan bi riya van wêneyane, xweşî û nexweşiyên jiyanê ji me re berceste dike û dibêje:

“Dîsan wîfî: Şeker le demit dête der eger,

Jehrîş bixoytewe ke bibê bênî nawekem” r. 91.

Di vê beytê de helbestvan dibêje, eger gotinên yarê wek jehrê jî bin, ew li cem min dîsa her wek şekir şirîn û bi tam in. Boye bêjeyên şekir û jehir du ku bêjeyên dijwate ne, li ber hestê tamkirinê dikevin. Di vir de mebest şîrînî û jehriya rasteqîne nîn e, belkû mebest gotinên xweş û nexweş in. Bi taybet gotinên nexweş wataya dijûn û çêkirinê digihînin, dema ku yar rû nede evîndarê xwe. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Eşkî çavim wa le hesret le’lî lêwit dem be dem,

Cariye û sûr û siwêre rengî gulnarî heye” r. 153.

Di vê beytê de ji ber evîn û dildariyê, hêsirên helbestvanî ji xwe re cokek çêkirine û yek li du yek ji çavên wî diherikin wek rûbarekê. Eger em bala xwe bidinê emê bibînin ku helbestvan dixaze ji me re bibêje, ji bo lêvên sor ên yarê wî ewqas hêsir barandine ta ku hêsirên wî wek xwînê sor bûne û ji xwe re cokek çêkirine. Her wiha wek em hemû jî dizanin tama xwînê şor e û rengê soratiya wê jî wek rengê gula hinarê ye. Wate helbestvanî hin hêsir rijtine ta ku rengê wan wek rengê gula hinarê sor bûne. Di beytê de helbestvan bi riya bêjeya şor, ji me re wêneyê hestê tamkirinê dirust dike. Helbestvan her di beytek din de jî, di warî de dîsa dibêje:

“Le sayey maçî lêwit meylî ‘ennab û şeker nakem,

Ke rûy to derkewê qet rû le rûy şems û qemer nakem” r. 92.

Helbestvan di vê beytê de, ji bo mebest û daxwazên xwe, ji me re bi şêweyek pişporane û jêhatiyane wêneyê tamkirinê dikêşe û vê yekê jî bi riya bêjeyên maçkirina lêv, ‘ennab û şekir dike, ku wêne pê rûntir dibe û xwendevan zêdetir hest pê dike. Helbestvan di vir de qala maçkirina lêvên dîlbera xwe dike û dibêje eger ez lêvên wê maçî bikim, min hîç wextekê pêwîst bi şîrîniya şekir û ‘ennabê nîn e, şîrîniya lêvên yara min cihê şîrîniya hemû tiştê digire. Her di berdewamiya helbesta xwe de dîsa dibêje eger rûyê dîlbera min ji min re diyar be, hîç wextekê

temaşeyî heyv û rojê nakim. Eve nîşan dide ku helbestvan bi maçkirina lêvên dîlbera xwe sergêj bûye û bi şikandina tînûtiya xwe bi lêvên yarê mest û heyran bûye.

Helbestvan bi vê helwestê, radigihîne ku hîç tiştek nikare hîndî lêvên yarê şîrîn û tamxweş bin û hemû şîrînî û taman red dike û bi vî awayî wêneyê hestê tamkirinê dirust dike. Di beytek din de jî wiha amaje bi hestê tamkirinê dike:

“Şîfay derdî dile maçî demî wek şanî hemgiwîne,

Be ‘îşve pêkenînî ew nîgare bayîsî jiyane” r. 132.

Dema em temaşeyî vê beytê dikin, di vir de jî her wek beyta jorê, bi riya lêmanendeyê wêneyekê ji me re dirust dike û maçkirina devê yarê diçiwêne şîrîniya hingivînî û dibêje, çareseriya derdê min tenha maça devê dîlberê ye ku wek hingivînî xweş û şîrîn e. Helbestvanî bi riya bêjeyên maçkirina dev, şîwaneya hingivînî ji me re wêneyê hestê tamkirinê dirust kiriye û radigihîne ku hîç çareseriyek ji bo derdê wî nîn e, tenha maçkirina devê yarê nebe, ev yeke jî nîşaneya rêjeya evîndariya helbestvanî ye.

5- Hestê Destlêdanê:

Ev heste wan wêneyan li xwe digire, ku riya destlêdanê mirov hest pê dike. “Bi riya destlêdanê em hest bi germî, sarî, nermî, reqî û lûs(şemitok)î dikin.”¹²⁶ Wêneyên ku bi vê hestê hatine sazandin, li gel cureyên din de tên berawirdkirin, di dîwana Ehmed Muxtar Beg de kêr in. Helbestvan di vê beyta jê re de wiha dibêje:

“Be xaka pê binê, meynê be dîdey eşkbarimda,

Mebada dirkî birjangim biçête pêy henayînit” r. 67.

Helbestvan di vê beytê de, ji evîndara xwe re dibêje piyê xwe danê erdî, nedanê bi ser çavên min, neka birjangên min ên wek qelemokan in, biçene piyê te ên xenêkirî de. Di vir de helbestvan di xema çavên xwe de nîn e ku yar dê piyên xwe danête ser; belku di xema piyê yarê de ye, çunke piyên wên ewqas narîn in ditirse birjangên wî ên wek rîman in li hember vê narîniyê, biçin piyê wê de û azarê pê

¹²⁶Kemal Mistefa Me’rif, “Wêne le Şîrî Qubadî Celîl Zade”, *Kovara Zanîngeha Silêmaniyê Beşa (B)*, 12., Çapxaneya Zanîngehê, Kanûna Yekemîn, Silêmanî, 2003, 125.

bide. Wate bi riya destlêdanê mirov dikare nermî û riqiya birjangan bizane. Bi vî awayî helbestvanî ji me re wêneyê hestê destlêdanê sazandiye. Her di beytek din de jî dibêje:

“Bêt û destim bida le destî piyawî nawecax,

Hewcar be aw qur dest û pencekanim gilaw ekem” r. 90.

Di vê beytê de ji ber lêk girtina destan hestê destlêdanê peyda bûye û wêneyê hestê destlêdanê dirust bûye. Di helbestan de, di dirustkirina wêneyan bi riya hestên mirovan de, hestê dîtinê di asta yekemîn de ye; hestê bihîstinê jî di asta duyemîn de ye û paşan hestên din tên. Helbestvanî ji bilî wêneyên ku bi riya hestên mirovan dirust kirine, cureyek din jî sazandiye ku li ber tu hestekî mirovan nakevin. Wate em dikarin bi riya zêhn ve ji wan wêneyan têbigihin û ji wan wêneyan re jî wêneyên jîrî tê gotin. Helbestvan di beytek din de jî dibêje:

“Dilim hawîn sîfet bo dîdenî yar germe emro min,

Ema yarim le astî min elê serdî zistan e” r. 109.

Di vê beytê de helbestvan dibêje ji ber dûrbûnê ez ewqas bîra yarê dikim, dilê min wek havînê germ e, lê belê helsûkevtên yara min li gel min wek hewayê zivistanê sar in. Wate helbestvanî gelek ji yara xwe hez kiriye û lê yara wî li hemberê wî wek zivistanê sar bûye. Di beyta jorîn de helbestvan bi riya bêjeyên germ û sar wêneyek hestê destlêdanê ji me re disazêne.

2- Bi Pê Sadeyî û Hevedudaniya Her Du Aliyan

A- Her Du Alî Sade Bin:

Di vir de her du binemayên serekî ên manendinê bêjeyên sade ne. Wek (Newzad weku şêr waye.), bêjeya (Newzad) bi bêjeya (şêr) hatiye şibandin, ku bêjeya (şêr) lêmanende e, her du sade ne. Bi watayek din sade ne û hevedudanî nîn in; “Wek lêmanendeya dûr a li wêneyê niyas tê zanîn, ew cure ye ku her du alî sade ne û hevedudanî nîn in.”¹²⁷ Her bi heman şêwe Kamîl Hiseyn El-Basîr jî dibêje: “Ew

¹²⁷ Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rewanbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyasedekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 80.-81.

cure ye ku her du aliyên manende û lêmanende bêjeyên sade ne.”¹²⁸ Ehmed Muxtar di vê beytê de dibêje:

“Demit xunçe, qedit serwe, lebit le’lî bedexşane,

‘Eceb şoxêkî xeddarî fîday ew zulfî tatanim” r. 80.

Dem...manende.... sade ye, xunçelêmanende.... sade ye.

Qed...manende.... sade ye, seru....lêmanende.... sade ye.

Helbestvanî di vê beytê de çend lêmanendeyek bi kar anîne, lê belê her yek ji wan serbixwe ne û bi ên din ve nahetine girêdan. (Dev) bi kar aniye û ew çiwandiyê xunçeyê ku her du jî sade ne. Wate ciwanî, biçûkî û balkêşiya devê yara xwe çiwandiyê xunçeya nevekirî, ku em hemû çavrê vekirina wê ne. (Qed) bi kar aniyeû ew çiwandiyê bejna dara selwiyê û her bi heman şêwe her du manende û lêmanendeyên sade ne û wate bi yek bêjeyê pêk hatine. Di beytek din de helbestvan dibêje:

“Rûmetit bedre mat mînay safe bêxeşe,

Dem qûtûy daney durî deryaye, lêwit şekker” r. 111.

Mil...manende.... sade ye, Mîna....lêmanende.... sade ye.

Lêv...manende.... sade ye, Şekker....lêmanende.... sade ye.

Helbestvanî her wek beyta jorîn, di vir de jî çend lêmanendeyek bi kar anîne û (mil-stu) çiwandiyê (mîna-krîstal, billûr)yê û her du jî bêjeyên sade ne. Helbestvanî di vir de stuyê yara xwe şibandiyê krîstal an billûrê ku ev her du tiştene di wêjeya klasîk de gelek bi nirx û qîmet in û hemû kes nikar wan bi dest bixe, boye dibêje ji ber ku stuyê yara min wek krîstal û billûrê ye ez nikarim bi asanî xwe bigihînimê. Helbestvanî (lêv) bi kar aniye û ew çiwandiyê bi (şekker)ê û ew jî wek manende û lêmanende sade ne. Helbestvan di wesifkirina lêvên yara xwe de dibêje ew ewqas gotin xweş û tam xweş in, ji şekirê diçin. Şekir di vir de, wataya xweşî, şîrînî, axavtinên xweş... hwd. radigihîne. Di beytek din dîsa helbestvan dibêje:

“Mû le pencem bête der ger dest bibem bo piyale min,

¹²⁸ Kamil Hesên el-Besîr-Ehmed el-Metlub, *el-Belaxe veltebiq*, Weşanên Wezaretxaneyê, Beşa Zanistan, Çapa 1., 1982, 293.

Ger bibê destim kewê dû memkî wek fincanekey” r. 171.

Memik...manende.... sade ye, Fincan....lêmanende.... sade ye.

Wek...daçekamanendinê.

Helbestvanî di beytê de, di navbera memik û fincanê de wêneyek ciwan dirust kiriye, her wiha her du jî sade ne. Helbestvanî (memik) çiwandiye bi (fincanê) ku her du sade ne û jî vê lêmanendeyê re, lêmanendeya sede bi sade, tê gotin.

B- Her Du Alî Hevedudanî Bin:

“Ew lêmanendeye ku her du pêkhatayên wê ji çend beşên ku hevedudanî ne, pêk tîn û bi yek re wêneyek bi hev re ve girêdayî disazênin û aliyê ji hev çûnê bi vê wêneya ku bi hev re hatiye girêdan, dirust dibe.”¹²⁹ Her wiha bi watayek din em dikarin bibêjin, ne manende, ne jî lêmanende sade nîn in û hevedudanî ne, an dibêjin: “Di vir de her du aliyên lêmanendeyê tîne têkelkirinû dibe ev têkelkirina wisa be ew wêneyên di vir de tîn sazkin nabe bi hîç şeweyekê ji hev bêne cihêkirin, bi watayek di wêne ji çend tiştên têhelkêş pêk tîn.”¹³⁰ Di vî warî de Ehmed Muxtar Beg wêneyek wiha dikêşe:

“Deşubhê halî Ehmed weqtî weslit,

Be roj helatin û ehwalî aweng” r. 74.

Halî Ehmed...manende.... Hevedudanî ye, Ehwalî aweng....lêmanende.... hevedudanî ye.

Weqtî wesil...manende.... Hevedudanî ye, Roj helatin....lêmanende.... hevedudanî ye.

Deşubhê...daçekamanendinê.

Di vê beytê de manendin hevedudanî ne, wate manende û lêmanende sade nîn in, hevedudanî ne. Di vir de pêkhateya (halî Ehmed) ji yek tiştê pêk nehatiye û ji çend tiştan pêk hatiye û bi (ehwalî aweng) hatiye şibandin û ew jî ji yek tiştê zêdetir

¹²⁹ h.ç., 82.

¹³⁰ Newzad Ehmed Usman, *Rûnbêjî le Şîrî Klasîkî Kurdîda, Be Nimûne Melay Cizîrî û Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 1991, 39.

pêk hatiye. Her bi heman şêwe (weqtî wesil), wate hatina dîlberê şibandiye (roj helatin)ê, yanî derketina rojê û ew jî her dîsa hevedudanî ne. Helbestvanî di navbera hatina dîlberê û derketina rojê de peywendiyek dirust kiriye û wek çawan bi hilhatina rojê dinya ronahî dibe, her bi heman şêwe hatina dîlberê jî wek rojê cîhan û jiyana helbestvanî ronak dike û wî şad û bextewer dike. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Ey nîgarî nazenîn lew rojewey dûrî le min,

Seylî dîdem wa be xurdê her weku Sîrwana bot” r. 69.

Seylî dîde...manende.... Hevedudanî ye, Sîrwan....lêmanende.... hevedudanî ye.

Her weku...daçekamanendinê. Bexurî...hêla lêmanende.

Di vê beytê de helbestvan ji dîlbera xwe re dibêje, ey nîgara nazenîn, ji wê roja ku li te dûr mame ta niha hêsir wek lehiyan ji çavên min têne xwarê û çavên min ji te re bûne rûbarê Sîrwan. Helbestvanî (seylî dîde-lehiya hêsiran) ku manende û hevedudanî ye, şibandiye rûbarê (Sîrwan-Navê rûbarekî başûrê Kurdistanê ye) ku ew jî hevedudanî ye. Ji van lêmanendeyane re dibêjin, lêmanendeyên hevedudanî, yanî manende û lêmanende hevedudanî ne.

C- Sade bi Hevedudanî:

Ew manendine ye, ku manende sade ye û lêmanende hevedudanî ye, bi watayek din di vê manendinê de bêjeyek sade bi du an zêdetir bêjeyan tê manendin. Ehmed Muxtar Begî di helbestên xwe de ev cure hunere bi pisporane bi kar aniye û wiha wêne dike:

“Çî ebê carê bilêy to bew reqîbet dulbera,

Laço segbab besyetî kelbî ‘eqûrim bo çî ye” r. 126.

Reqîb...manende.... sade ye, Kelbî ‘eqûr...lêmanende.... hevedudanî ye.

Di vir de helbestvanî lêmanendeyek din bi kar aniye, ku manende (reqîb-hevrik) sade ye û lêmanende e bi (kelbî ‘eqûr-kûçikê berderan) ku bêjeyek hevedudanî ye. Helbestvanî, hevrikê xwe bi kûçikek asayî neçiwandiye û ew çiwandiye wan kûçikên ku êrîşî hemû tiştêkê dikin ku kurd ji wan cure kûçikan re,

kûçikên berderan, dibêje. Boye em dikarin bibêjin ev lêmanendeye lêmanendeyeke sade bi hevedudanî ye. Di beytek din de helbestvan dibêje:

“Rûy gulebaxe nîgarim be Xwuda heyfe ke ew,

Hawreqîbî şew û rojî dirk û hem xare” r. 115.

Rû...manende.... sade ye, Gule bax....lêmanende.... hevedudanî ye.

Helbestvanî di vir de rûyê dîlbera xwe çiwandiyê gulebaxê. (Rû) manendeye û bêjeyek sade ye, (gulebax) lêmanendeye û hevedudanî ye. Helbestvan dibêje, rûyê yara min wek gulebaxê ciwan û bînxweş e, guneh e hevrik an dijberên yara min strî û kelem bin. Çunke strî û kelem aîdî beyaban û çolê ne, nabe evne li gel yarê bêne muqayesekirin, tenanet dibêje nabe yar şev û rojan jî di warê ciwanîyê de bo xwe wek hevrik bibîne, boye gazindan li yarê dike. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Hemîşe lalezare dewrî qebristanî ‘aşiqan,

Eken temsîlî lêw le’l û kulmî al û rengînit” r. 67.

Lêw...manende.... sade ye, Lalezar....lêmanende.... hevedudanî ye.

Helbestvanî di vê beytê de lêvên yara xwe hem şibandîne (lalezar)ê û hem şibandîne (Le’l-cureyek gewherane û reng sor e)ê, yanî di vê beytê de du cure manendin hene û jê re manendina têhelkêştê gotin. Lê belê ji ber ku mebesta sadeyî û hevedudaniya bêjeyan e di vê hunerê de, emê manendina têhelkêş rave nekin. Helbestvan di beytek din de jî wiha dibêje:

“Ke balay duberî dî ser û bustanî wutî şerte,

Îtir xom dernexem terkî lîbasî û bergî exzer kem” r. 83.

Bala...manende.... sade ye, Ser û bustan....lêmanende.... hevedudanî ye.

Helbestvanî bi şêweyek narastewxo di navbera bejnûbala yara xwe û serw û bustan de lêmanendeyek kiriye. Wate bala (bejin)ya yara xwe ku sade ye, mînaandiyê bi (ser û bustan-....)ê ku lêmanende e û hevedudanî ye. Paşan ji vê gotina xwe peşîman dibe û dibêje bejnûbala yara min ji bejnûbala serw rêk û ciwantir e. Helbestvanî hemû ev tiştine bi şêweyek narastewxo kirine, boye em dikarin bibêjin ev lêmanendeye, bi şêweyek narastewxo lêmanendeyek pesendîde ye.

D- Hevedudanî bi Sade:

Ev cure hunere berewajî hunera sade bi hevedudaniyê ye, wate di vir de manende hevedudanî ye û lêmanende sade ye. Helbestvanî di wê beyta jêrê de wiha wêne kiriye ew hunere:

“Naley sînem weku ney ser weku semtûre bot,

Min be xem şadim êtir keyf û sirûrim bo çi ye” r. 126.

Naley sîne...manende.... hevedudanî ye, ney....lêmanende.... sade ye.

Weku....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de bi riya hunera lêmanendeyê bêjeya (naley sîne-nalîna dil) a hevedudanî û manendeyê, şibandiye bêjeya (ney)ê kulêmanende û sade ye. Ney amûrek mûzîkê ye û deng derdixe. Helbestvanî nale nala sîne an dil, şibandiye dengê neyê ku dengek gelek xembar e. Ser jî şibandiye semtûrê ku ev jî her amûrek mûzîkê ye. Helbestvan di vir de bi riya şibandîne dibêje dilê min her tim pir e li xem û xefetan, ger wa ye min bo çi ye keyf û xweşî. Yanî dilê he tim li xem û xefetan pir be êdî cihê xweşî û şadîbûnê tê de namîne. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Eşkî çawî min şerabe, qelbî zarim wek kebab,

Fermû teşrîf bêne cana bezmeket amadeye” r. 121.

Eşkî çaw...manende.... hevedudanî ye, şerab....lêmanende.... sade ye.

Qelbî zar...manende.... hevedudanî ye, kebab....lêmanende.... sade ye.

Wek....daçekamanendinê.

Helbestvan dixaze ji yarê re şevbêrka meynoşînê bisazêne. Boye hêsirên çavê xwe dike şerab, wate bêjeya (eşkî çaw-hêsirên çavan) ku hevedudanî ye çiwandî ye bi (şerab)ê ku bêjeyek sade ye û lêmanendeye. Her wiha dilê xwe ê pir bi nalîn û kalîn e jî dişibîne kebabê. Di vir de bêjeya (qelbî zar) hevedudanî û manendeye, bêjeya (kebab) jî sade û lêmanendeye. Di vê beytê de lêmanendeyek rastewxo berpa bûye, wate lêçû û lewçû bi şeweyek rûn û aşkira derketine. Di beytek din de jî wiha tê gotin:

“Zulm û cewrî weku zûhhake xerîkî qetle,

Helqeyî zulfi le pêş çawim elêy reşmare” r. 122.

Zulm û cewr...manende.... hevedudanî ye, Zuhhak....lêmanende.... sade ye, Weku....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de bêjeya (zulm û cewr) a hevedudanî şibandiye bêjeya (zuhhak) ku sade û lêmanendeye. Halbestvanî zulm û stema yara xwe şibandiye zulma Zuhak, wate yara helbestvanî gelek zalim û bêwijdan bûye ta ku helbestvanî ew li gel zalimek wek Zuhak berawird kiriye, ji aliyê zilimdariyê ve. Her wiha dibêje niha dema ku ez zêdeme zulfên reş ên yara xwe ji ber çavên min wek reşmarekê lê tîn.

3- Li Gor Şêwazê Her Du Aliyan:

Li gor şêwazê hatina manende, manendin dabeş dibe ser çar cureyan de: A- Manendina Pêçraw, B- Manendina Cihê

A- Manendina Pêçraw (el-Teşbiye el-Melfuf):

“Di beytek helbestê de, çend lêmanendeyekê bi hev re bi kar tîne, lê belê serbixwe nîn in û ji aliyê dirustbûnê ve bi yek ve girêdayîne. Bi watayek din helbestvan komek ji manendeyan li pey hev rêz dike û di navbera wan de lêmanendeyêdisazêne. Lêmanendeya pêçrawê li gor rêkxistina manende û lêmanende li hember yektir de.”¹³¹“Ew lêmanende ye, ku hemû pêkhatyên manende li gel hev rêz dibin, paşan her yek ji wan bi tiştêkê tê mîrandin û hemû lêmanende jî li pey hev tîn rêzkirin, an bi berewajî wek yekemîn car pêkhatyên lêmanende bêne rêzkirin û paşan jî pêkhatyên manendeyan.”¹³² Ev jî dibe du beş:

1- Lêmanendeya Pêçraw a Rêkûpêk:

“Helbestvan komek ji manendeyan li pey hev rêz dike, paşan komek lêmanendeyan tîne; yaxûd bi berewajî ve,manende û lêmanendeyan li gor hejmara

¹³¹ Newzad Weqas Seîd-Serdar Ehmed Hisên, *Hunerî Lêmanende le Şîrî Salimda*, Kovara Zanîngeha Silêmaniyê, hjm. 4., 2000, 109.

¹³² Îdrîs Ebdulla, *Kowanekani Rewanbêjî*, Çapa 1., Hewlêr, 2014, 155.

zincîreyî li hember yek datîne.”¹³³ Eger em temaşeyî dîwana Ehmed Muxtar Beg bikin, emê bibînin ku wî şiyaye di helbestên xwe de, di yek beytê de hejmarek ji manende û lêmanende li pey hev rêz bike. Her di beytê de jî dibêje:

“Qametim ger wa xeme û halim perîşane refîq,

Têbige temsîlî ebro û perçemî canane” r. 148.

Qamet.....manende e, halî şaîr..... manende e.

Birû....lêmanende e, perçem.....lêmanende e.

Helbestvanî di vê beytê de, di hevoka yekemîn de, bêjeyên qamet û hal bi şeweyê manende, di hevoka duyemîn de jî bêjeyên birû û perçem bi şeweyê lêmanende bi şewazê jimareya zincîrîli hemberê yektir bi kar anîne. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Rûmet û xalit le pêş çawim nîgarî nazenîn,

Her le ‘eynî rengî mah û şiklîperwînî heye” r. 156.

Rûmet.....manende e, xal..... manende e.

Mah....lêmanende e, perwîn.....lêmanende e.

Helbestvanî di vê beytê de (rûmet û xal) wek manende bi kar anîne û ew şibandine (mah û perwîn)ê ku lêmanende in. Dîlbera helbestvanî ji wî re ewqas ciwan bûye ta ku rûyê wê şibandiye heyve şevê ku heyve şev jî şevan dinyayê ronak dike, helbestvan dibêje yanî eger min rûyê te hebe hemû dinyaya min ronak û rewşen e. Her bi heman şewe xal jî şibandiye pervînê. Helbestvanî di vê beytê de, ji me re manendina pêçraw a rêk sazandiye.

2- Lêmanendeya Pêçraw a Narêkûpêk:

“Helbestvan komek manende, paşan jî komek lêmanende bi kar tîne, lê belê pêkhateyên lêmanende li gor jimareya zincîrî, li beramber pêkhatêyên manendeyê ranawestin. Lêkoler an xwîner dibe manende û lêmanendeyan destnîşan bike.”¹³⁴ Wek mînak Ehmed Muxtar Beg di beyta jêrê de wiha dibêje:

¹³³ h.ç., 109.

¹³⁴ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 71.

“Nimûney çaw û rûtin mang û perwîn,

Nexoşe dil le lêwit bêne hengiwên” r. 108.

Çaw.....lêmanende, mang....manende.

Rû....lêmanende, perwîn.....manende.

B- Manendina Cihê (el-Teşbiye el-Firuq):

Di vê hunerê de, “Her manendeyek li gellêmanendeya xwe de dêt, bi watayek din çend lêmanendeyek li pey hev rêz dibin û tèn. Di her lêmanendeyekê de li pey her manendeyekê, lêmanendeya wê jî di gel de tê. Ew yeke di hemû manendeyan de rû dide. Bi vî awayî hemû lêmanende bi serbixwe derdikevin û bêyî ku di navbera wêneyên wan de peywendiyek hebe.”¹³⁵ Manendina cihê “Ew manendine ye, helbestvan dema manendinekê dirust dike, ku ew manendin temam bû, paşan diçe ser manendinek din.”¹³⁶ Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Demit xunçe, qedit serwe, lebit le’lî be dexşane,

Eceb şoxêkî xeddarî fiday ew zulfî tatatim” r. 80.

Manendina yekemîn: Dem.....manende, xunçe.....lêmanende.

Manendina duyemîn: Qed....manende, serû.....lêmanende.

Manendina sêyemîn: Leb....manende, Le’lî.....lêmanende.

Helbestvanî di vir de dema lêmanende kiriye, hemû carê manende û paşan lêmanendeya wê aniye û bi vî awayî lêmanendeyayekemîn temam kiriye û paşan çûye li ser lêmanendeyaduyemîn, sêyemîn...hwd.û ew dirust kirine. Ji vê cure lêmanendeyê re, manendina cihê tê gotin. Helbestvanî di vê beytê de devê yara xwe, ji ber biçûkî, ciwanî û tazeyî çiwandiyê xunçeyê; bejnûbala yara xwe, ji ber rêkî, dirêjî û ciwaniyê çiwandiyê dara serwî û lêvên yara xwe jî, ji ber sorî û şîrîniyê çiwandiyê gewhera le’lê. Di berdewamiya beytê de helbestvan ji yarê re dibêje;

¹³⁵ Derya Cemal Hewêzî, *Wênay Rewanbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 128.

¹³⁶ Mîlad Celaledîn Gezazî, *Zîba Şînas*, Gotar, Çapa 4., Çapxaneya Se’dî, Paris, 80.

dîlberek çenda bedew û bêrehmî, bila giyanê min qurbana wan biskên te be.
Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Rûmetit bedre mat mînay safe bêxeşe,

Dem qûtûy daney durî deryaye, lêwit şekker” r. 111.

Manendina yekemîn: Rûmet.....manende, Bedir.....lêmanende.

Manendina duyemîn: Mil....manende, Mîna.....lêmanende.

Manendina sêyemîn: Dem qûtî....manende, Daney dûr.....lêmanende.

Manendina çaremîn: Lêw....manende, Şekker.....lêmanende.

Helbestvanî her wek beyta jorê, di vê beytê de jî çend lêmanendeyek bi kar anîne û her wiha yek lêmanende temam kiriye û paşan çûye ser a din. Helbestvanî di lêmanendeyayekemîn de rûmetê yara xwe mînandiye bi bedrê, di lêmanendeyaduyemîn de stûyê yara xwe çiwandiye gewherek bêgirûz, di lêmanendeyasêyemîn de devê yara xwe ê wek qûtûyê biçûk mînandiye dûrê û di lêmanendeyaçaremîn de jî lêvên yara xwe mînandiye şekerê. Helbestvanî di vir de stuyê yara xwe şibandiye (mîna)yê ku ji krîstal an billûrê yê di wêjeya klasîk de gelek bi nirx û qîmet in û hemû kes nikar wan bi dest bixe, boye dibêje ji ber ku stuyê yara min wek krîstal û billûrê ye ez jî nikarim bi asanî xwe bigihînimê. Her wiha helbestvanî lêvên yara xwe jî çiwandiye bi şekerê û di wesifkirina lêvên yara xwe de dibêje ew ewqas gotin xweş û tam xweş in, ji şekerê diçin. Şekir di vir de, wataya xweşî, şîrînî, axavtinên xweş... hwd.

4- Li Gor Hejmara Her Du Aliyan:

A- Manendina Text (el-Teşbiye el-Teswiye)

B- Manendina Ko (el-Teşbiye el-Cemi')

A- Manendina Text (el-Teşbiye el-Teswiye):

“Ew manendine ye, du tişt an zêdetir bi yek tiştê bên şibandin an manendin. Yanî manende çend tiştekin bin, lêmanende yek tişt be.”¹³⁷ Wek Ehmed Muxtar Beg di vê beytê de dibêje:

“Zulm û cewrî weku zûhhake xerîkî qetle,

Helqeyî zulfi le pêş çawim elêy reşmare” r. 122.

Zulm û cewr...manende.... du tişt in, Zuhhak...lêmanende.... yek tişt e, Weku....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de di hevoka yekemîn de (zulm û cewr) a dîlbera xwe manende e ku ji daneyekê zêdetir pêk tînin, şibandiye (zuhhak) ku lêmanende e û yek dane ye. Bi vê yekê helbestvanî manendina text dirust kiriye. Di beytek din de helbestvan dibêje:

“Berqî ah û seylî dîdey min le hîcrî dulberim,

Her elêy hewrî behare nalew û tofan deka” r. 56.

Berqî ah û seylî dîde...manende e.... du tişt in, Hewrî behar...lêmanende e.... yek tişt e, Her elêy....daçekamanendin e.

Helbestvanî di vê beytê de du tişt bi yek tiştê çiwandî ye an şibandî ye, ku ew jî (berqî ah û seylî dîde) ne û tînin wataya birûska axîne û lehiya hêsiran, bi (hewrî behar)an yanî ewrê biharan çiwandiye. Helbestvanî di vir de nalîn, axîn û lehiya hêsiran ji ber cihêbûna ji yarê, manendine bi ewrê biharan, ku gurme gurma wan ewrane gelek e û dibêje ez ji ber dûrbûna yarê waye weku ewrên biharan tofan û bakurofe dikim. Helbestvanî di vir de lêmanendeya text sazandiye.

B- Manendina Ko (el-Teşbiye el-Cemî’):

“Ev manendine ye ku yek tişt bi du tiştan an bi duyan zêdetir bête şibandin. Wate manende yek tişt bêt, lêmanende jî du an zêdetir tişt bin.”¹³⁸ Ehmed Muxtar Caf ev cure manendine gelek bi kar aniye. Em dikarin hinek beytên bi vê hunerê hartine dirustkirin, diyar bikin.

¹³⁷ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 41.

¹³⁸ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 41.

1- Yek Tişt bi Du Tiştan:

Wate yek manende û du lêmanende hebin. Wek di vê beytê de Ehmed Muxtar Begê Cafî dirustkiriye:

“Ye’ nî awî dîdekanî min le dûriyî qametit,

Wa be xur dên her le nehrî Tancero û Sîrwan eken” r. 104.

Awî dîde...manende.... yek tişt e, Sîrwan û Tancero....lêmanende.... du tişt in.

Helbestvanî di vê beytê de ava çavên xwe an barîna rondikên xwe, ji ber dûrbûn li yarê û benjûbala yarê, şibandiye herikîn û yekgirtina rûbarê Tencero û rûbarê Sîrwan. Helbestvanî di vir de, ava çavên xwe ku yek tişt e, şibandiye ava rûbarê Tencero û Sîrwanî, ku du tiştin. Her wiha di beytek din de helbestvan dibêje:

“Deşubhê halî (Ehmed) weqtî weslit,

Be roj helhatin û ehwalî awing” r. 74.

Halî Ehmed...manende.... yek tişt e, Be roj helhatin û ehwalî awinglêmanende.... du tişt in.

Helbestvan dîtina yarê wek gihiştina bi yarê dihesibîne û gelek şad dibe û vê rewşa xwe dişibîne derketina rojê û rewşaawingê, wate befra xûs.

2- Yek Tişt bi Pênc Tiştan:

Di vir de yek manende heye û pênc lêmanende hene. Cureya here dawî hunera manendina ko ye. Helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Ebrûwe ya qewse, ya balî humaye pêm bilê,

Seyfî xun rêze, hîlale, dulbera ya xencere” r. 111.

Ebrû...manende.... yek tişt e, qews, balî huma, seyfi xun rêz, hîlal, xencer....lêmanendene.... Pênc tişt in.

Helbestvan di vê beytê de birûyên dîlbera xwe diçiwêneqewsê û dibêje birûyên wê li ciwaniya hîlalê diçin. Mebest ji xwînrijandinê jî ev e, birû di dirûvê qewsî de li xencera qews diçin û helbestvan jî dibêje birûyên yara min wek xencerê ne û xwîna min dirêjin. Helbestvanî di vê beytê de yek tişt bi pênc tiştan çiwandiye û

bi vî awayî manendina ko sazandiye. Ev yeke nîşaneyê jêhatî û zîrekiya helbestvanî ye, di warê raçandina helbestê de.

Duyemîn:

Be Li Gor Hatîn û Nehatina Aliyê Lêkçûnê:

1- Manendina Bikitekit

2- Manendina Kurtkirî.

1- Manendina Bikitekit (el-Teşbiyeel-Fesil):

Cureyekî manendinê ê li gor hatin û nehatina aliyê lêkçûnê yê. “Ew cure ye ku hêlalêmanendeyê tê de derdikeve.”¹³⁹ Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Be yadî çawekanit daîma mest û heyranim,

Le ‘eşqî qametit qurban weku zulfit perêşanim” r. 82.

Min (Ehmed)...manende, Zulfit....lêmanende, weku....daçekamanendinê, perîşan.....hêla lêmanende.

Helbestvanî bêjeya (perêşan) wek hêla lêmanende bi kar aniye û her wiha şiyaye manendina dirêj ji me re dirust bike. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Girpe û girey tenûre bilêsey henasekem,

Sîrwan û Tanceroye xurey awî çawekanim” r. 91.

Awî çaw....manende, Sîrwan û Tancero....lêmanende, xure.....hêla lêmanende.

Helbestvan di vê beytê de dibêje, min ewqas bîra yarê kiriye hilma min wek pêtala tenûrê gerim bûye û dengê gurpe gurp û guriya agirî jê tê. Her wiha dibêje çavên min jî hindî hêsir barandîne wek rûbarên Sîrwan û Tancero lê hatine. Helbestvanî di vir de ji me re manendina dirêj sazandiye.

¹³⁹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 81.

2- Manendina Kurtkirî (el-Teşbiye el-Cemil):

“Ew manendine ye, qala hêla lêmanendeyê tê de nayê kirin.”¹⁴⁰ Ezîz Gerdî jî dibêje: “Di vê manendinê de tenha manende û lêmanende tîn, yanîdaçek û hêla lêmanendeyê nayên.”¹⁴¹ Wate ev manendine berewajî manendina dirêj e. Ehmed Muxtar Beg di vê beytê de dibêje:

“Xalî rûmetit daxî dilî zamar û bîmarî mine,

Rûmetit gul qametî to serûy corbarî mine” r. 158.

Xalî rû....manende, rûmet.... lêmanende, qamet....manende, dilî zamar û bîmar.... lêmanende, gul....lêmanende, serû....lêmanende.

Helbestvanî di vê beytê de hejmareke manende û lêmanende aniye ji bo ku daçek û hêla manendeyê neyên. Her di beytek din de jî dibêje:

“Nimûney çaw û rûtin mang û perwîn,

Nexoşe dil le lêwit bêne hengiwîn” r. 108.

Çaw....manende, rû.... manende, mang....lêmanende, perwîn....lêmanende, nimûney....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê hevoka yekemîn de manende li pey hev, lêmanende jî li pey hev dubare kirine û nivîsîne, her wiha daçekamanendinê jî lê pêş manende û lêmanendeyan xistiye. Di hevoka duyemîn de jî di navbera (lêv) û (hingivîn) de lêmanendeyek narastewxo dirust kiriye. Di vê beytê de lêmanendeya puxteyî hatiye sazandin. Her wiha çavên yarê ji bo helbestvanî gelek ciwan bûne û boye ew manendine heyv û pervînê.

Sêyemîn:

Be Li Gor Hatîn û Nehatîna DaçekaManendinê: Dibe du beş.

1- ManendinaBerbilaw

2- Manendina Xurtkirî

¹⁴⁰Ehmed el-Metlub, *Mu'ecem el-Mustelehet el-Belaxe we Tetewiraha Erebî*, Çapxaneyê Lubnan, Lubnan, 2007, 340.

¹⁴¹ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 37.

1- Manendina Berbilaw (el-Teşbîye el-Risal):

“Ew manendineye kudaçektê deye.”¹⁴² Ev cure manendine di helbestên hemû helbestvanan de heye, boye di helbestên Ehmed Muxtar Beg de jî heye. Helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Duwênê dulberêk dî ke wek şimşadî bustane,

Sualim kird ke bo çî rût elêy mangî direxşane” r. 109.

Dulber....manende, rû.... manende, Şimşadî bustan....lêmanende, Mangî direxşan....lêmanende, Wek, elêy....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de manendina berbilaw dirust kiriye û dibêje min duhî yara xwe dît, gelek ciwan bû, wek şimşadê bostanî dibiriqî û min jê pirsî tu bo çî hinde ciwan î, mirov dibêje rûyê te ronahiya heyvê ye dema hiltê hemû cîhan pê ronak dibe. Wate rûyê yara xwe, ji aliyê ciwanî û ronakiyê ve dişibîne rûyê heyvê. Her wiha di beytek din de dibêje:

“Ewe mujganî toye, ya weku tîrêkî dildoze,

Ewe balay toye, ya bequrban serûy bostane” r. 109.

Mujgan....manende, tîr.... lêmanende, Weku....daçekamanendinê.

Helbestvan di vê beytê de birjangên yara xwe dişibîne tîra dildozku tîn û dilê wî digirin û êş û azarê didin wî. Bi vê manendinê helbestvan hewl dide bêrehmî, bêwijdanî û xirapbûna yarê a li hemberî xwe pîşan bide. Her wiha manendina berbilaw hatiye bikaranîn di vê beytê de.

2- Manendina Xurtkirî (el-Teşbiye el-Wekid):

“Ew lêmanendeye, hêla lêmanendeyêtê de derdikeve, lê belê daçekamanendinê dernakeve.”¹⁴³ “Ew manendine ye ku daçekamanendinê tê dedernakeve.”¹⁴⁴ Ew manendine ji manendina berbilaw hûr û kûr û ciwantir bedî dibe. Ehmed Muxtar Beg dibêje:

¹⁴² Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 84.

¹⁴³ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lisansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2010, 81.

¹⁴⁴ h.ç., 86.

“Bulbulî dil, wa le dewrî rûmetî gulrengî to,

Bêqerare, şew heta roj nale û feryad eka” r. 54.

Dil....manende, rûmet.... manende, bulbul....lêmanende,
gul....lêmanende, daçekamanendinê nehatiye.

Helbestvanî di vir de dilê xwe bi şeweyê manendina rewan, şibandiye bilbilê. Bilbil çawa ji bo gulê her tim dixwîne û dinalîne û ji wê gulê diçe ser gula din, dilê helbestvanî jî her tim ji bo yarê feryad û fixan dike û dinalîne. Helbestvanî di vir de rûyê dîlbera xwe çiwandiye bi gulê, çunkê rûyê gulê gelek nasik û nazenîn e û sembola ciwaniyê ye. Di vê beytê de helbestvan dibêje:

“Demit xunçe, qedî serwe, lebit le’lî be dexşane,

Eceb şoxêkî xeddarî fiday ew zulfi tatatim” r. 80.

Dem.....manende, sade ye, xunçe.....lêmanende, sade ye.

Qed....manende, sade ye, serû.....lêmanende, sade ye.

daçekamanendinê dernekevtiye.

Helbestvanî dê beytê de çend lêmanendeyek bi kar anîne, lê belê hemû serbixwe ne û tu peywendiya wan bi hev re nîn e. Helbestvanî(dev)ê yara xwe çiwandiye (xunçey) a ku carê nebişkoviye. Çunkexunçeya nebişkovî devbiçûk, ciwan û balkêş e. Her wiha helbestvanî (qed)ê yara xwe, wate bejnûbala yara xwe çiwandiye bejnûbala dara (serwî)yê. Di vir de helbestvanî çend manende û lêmanende û anîne, lê daçekamanendinê neaniye, yanî manendina çextaw bi kar aniye.

Çaremîn:

Cureyên Din ên Manendinê:

Ji bilî wan cureyên ku li serê hatine nivîsîn û ravekirin, çend cureyek din jî ên hunera manendinê hene û xwediyê cihek diyar û girîng in di dirustkirina wêne û manendinê de, boye şayenî baskirin û rawekirinê ne û pêk tên ji:

1- Manendina Rewan/Berzî,

2- Manendina Wêneyî,

3- Manendina Awejû/Dij

4- Manendina Pesendîde,

5- Manendina Kurtkirî,

6- Manendina Wêne bi Wêneyan,

7- Manendina Têkra,

8- Manendina Di Nav Yek de

1- Manendina Berzî (Teşbîhî Belîx):

“Di vê lêmanendeyê de tenha manende û lêmanende tên gotin, lê belê hêla manende û daçekamanendinê nayên gotin.”¹⁴⁵ Ev cure lêmanendee wek wek manendinek bihêz û bandorker tê zanîn, çünke gelek nêzîkî hunera sparde dibe û li cem Ehmed Muxtar Beg jî gelek tê dîtin, wek di vê beytê de dibêje:

“Madam ke be şimşêrî birot let lere cergim,

Lazim niye ew xencere kirdûte be berda” r. 52.

Biro.....manende, şimşêr.....lêmanende.

Helbestvanî di vir de birûyên yara xwe çiwandiye bi xencerê û dibêje ji xwe birûyên te min wek xencerê let let dîkin, parçe parçe dîkin; pêwîst bi xencerek din nîn e li ber te de be, ji bo kuştina min. Helbestvanî di vir de manendina rewan sazandiye. Di beytek din de dibêje:

“Qafiye her çende tîkrare belam (Ehmed) be dil,

Her be yadî taqî be birooy toye car car niwêj eka” r. 55.

Biro.....manende, taq.....lêmanende.

Helbestvanî di vir de birûyên yara xwe çiwandiye bi (taq)ê. Taq, di mizgeftan de ew cihê ku mela tê de pêşnivêjîyê dike re, tê gotin. Ji ber ku taq qeqs e û ji dirûvê birûyên yarê diçe, helbestvan jî bi boneya yadkirin, an bîranîna yarê car caran tê

¹⁴⁵ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 88.

denivêjê dike. Helbestvanî di vir de manendina rewan dirust kiriye. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Wa be yadî tîxî ebroy dulberî bêrehmî xoy,

(Ehmed)î ‘aşiq xerîke rohî xoy qurban eka” r. 56.

Biro.....manende, tîx.....lêmanende.

Helbestvan di vir de birûyên yara xwe diçiwêne (tîx)ê ku amûrek e, devê wê gelek tîj e û ji tîra kevanê diçe û dibêje ez li gel yadkirina wan birûyên te ên tîj wek tîxê bêrehm, dîsa jî evîndarê te bûme û dixwazim ji bo te giyanê xwe bikimqurban. Helbestvanî di beytê de manendina rewan dirust kiriye, wate tenha manende û lêmanende derkevtine.

2- Manendina Wêneyî:

Di vê manendinê de “Li cihê ku tişteke bi tişteke bête şibandin, wêneyek bi wêneyek din tê şibandin.”¹⁴⁶ Helbestvanî ev hunere di vê beytê de wiha sazandiye:

“Be narî rûmetî ew şoxe cerg û dil ke sûtawe,

Meken men’em ke min perwanem ew şemî’ şebustane” r. 139.

Wêneyê yekemîn: Rûmetî ew şoxe.....manende, wêney duyemîn: Perwanem ew şemî’ şebustanelêmanende.

Ehmed Muxtar Beg di vê beytê de wêneyek bi wêneyek din çiwandiye, wate di wêneyê yekemîn de rûyê yara xwe çiwandiye wêneyê duyemîn, ew jî perperoka ku bi mumê dişewite ye. Dibêje çawan perperok li dor mumê diziwire an çerx dide û dişewite, ez jî mi heman şewe ji bo rûyê dîlberê bi cerg û dil dişewitim. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Kewte ser rûmetî alit areqî naz êsta,

Her elêy şewnimî pexşane be ser pergî gula” r. 51.

Wêneyê yekemîn: Rûmet û areq.....manende, wêney duyemîn: Şewnim û perî gule.....lêmanende.

¹⁴⁶ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 50.

Helbestvanî di vê beytê de wêneyek çiwandiye bi wêneyek din ku her wêneyek jî di nav xwe de manende û lêmanendeyekê dihebîne. Wate wî di wêneyê yekemîn de rûmet û areq (xwêdan), di wêneyê duyemîn de manendine bi şewnim (nem) û perê gulê. Helbestvanî dema xwêha ser dem û çavên yara xwe dîtiye û hatiye ew şibandiye wê ava ku beyaniyan zû li ser pelgên gul û çîçekan dirust dibe û dibare.

3- Manendina Awejû/Dij(el-Teşbiye el-Qilub):

“Ew lêmanende berawajî lêmanendeya asayî ye, çunke di vê lêmanendeyê de manende û lêmanende cihe xwe diguherin û di cihê hev de derdikevin. Di bingeha xwe de her tim lêmanende aliyê bihêz e, lê belê di vê manendinê de babet berewajî dibe û wisa derdikeve ku sifetê manendeê bihêztir e.”¹⁴⁷ Ji bo vê manendinê wêneyên ciwan dirust dibin. Wek Ehmed Muxtar Beg dirust kiriye û dibêje:

“Hîlalî yek şewem dî sûcdeber bûm bê teemûl min,

Mûbarek bû le lam çunke elêy taqî biroy yare” r. 118.

Hîlal.....manende, Biro.....lêmanende, Elêy....daçekamanendinê.

Li gor rêpîwanên manendina asayî dîba birû bi hîlalê hatiba manendin, nek hîlal bi birû hatiba manendin, çunke hîlal ji aliyê sifet ve ji birû bihêztir û qewîtir e. Lê belê helbestvanî hîlal çiwandiye bi birûyên yara xwe û bi vî awayî hîlal ku lêmanende e, xistiye asta manende de; birû ku manende e derxistiye asta lêmanende de û bi vê alûgorkirinê xwastiye ciwaniya birûyên yara xwe derxîne pêş. Helbestvanî bi vê helwestê manendina awejû sazandiye. Her dîsa di beytek din de dibêje:

“Serûy balat çend mewzûne le baxçey husnda,

Pêwe pêçrawe serapa zulfî wek lawlawî to” r. 164.

Serû.....manende, Bala.....lêmanende, Wek....daçekamanendinê.

Helbestvanî her wek beyta jorê, di vê beytê de jî manende û lêmanende alûgor kirine û bejnûbala dara selwiyê şibandiye bejnûbala yara xwe, di rastî de dîba ew şibandine berewajî ba, lê belê li gor helbestvanî bejnûbala yara wî ewqas ciwan bûye xwastiye bejnûbala yara xwe wek sembolek bihêz û baladesttir derxîne holê li

¹⁴⁷ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 93.

hember dara selwiyê. Bi awayî ji rêpîvana hunera manendinê derçûye û manendina awejû dirust kiriye. Di beytek din dibêje:

“Nimûney rûyî toye perey gul,
Fîdat bim ey benî cerg û perey dil” r. 75.

Gul.....manende, Rû.....lêmanende.

Di vê beytê de jî dîsan heman tişt dubare bûye û helbestvanî rûyê yara xwe ku manende e, wek lêmanende danaye û gul ku lêmanende e wek manende danaye û bi awayî di navbera manende û lêmanende de cêgorkê kiriye. Çunke helbestvanî xwastiye ciwaniya rûyê yara xwe dixîne pêş û wê bihêz nîşan bide û balê bikêşe ser, ji bo vê yekê jî ev cêgorkeye encam daye û manendina awejû dirust kiriye.

4- Manendina Pesendîde (el-Teşbiye el-Tefsîl):

Eve ye; “Li cihê tişteke bi tişteke din ve bête manendin ku di navbera wan de di aliyê sifet û taybetmendiyên ve hevbeşiyek hebe, tê hestê manende ji ê lêmanende pesendtir û bilindtir dibîne.”¹⁴⁸ Her wiha ew manendine gelek nêzîkî manendina awejû ye. Ezîz Gerdî jî dibêje: “Dema ku tu bixwazî tişteke bi tişteke din biçîwênî, manendeê li gor lêmanendeyê pesendtir bike.”¹⁴⁹ Serdar Ehmed Gerdî jî dibêje: “Ev cure hunere di dema dirustbûnê de lêmanendeyê asayî ye, lê belê piştî dirustbûna wê helbestvan ji gotina xwe peşîman dibe û lê wedigere û gotinekê dike ku manende ji lêmanendeyê pesendtir e. Di vê cure hunerê de helbestvan tişteke bi tişteke din biçîwêne û di dawiyê de wedigere û manendeê ji lêmanendeyê pesendtir dike.”¹⁵⁰ Wate her çend e, manende di bingeha xwe de ji lêmanendeyê lawaztir e, lê belê di vê hunerê de tê berewajîkirin. Wek Ehmed Muxtar Beg di vê beytê de dibêje:

“Nexoş kewt nêrgisî bêçare bo ew çawe bîmare,
Qedî nuştayewe ‘er ‘er ke dî balay ew yare” r. 113.

¹⁴⁸ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 147.

¹⁴⁹ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 48.

¹⁵⁰ Serdar Ehmed Gerdî, *Lêmanende û Rolê le Dirustkirdinî Wênay Hunerî le Şîrî (Ehmed Muxtar Begî Cafî) da*, (Kovara Zanîngeha Silêmaniyê), hjê. 5., 114.

Çaw.....manende e, Nêrgis.....lêmanende e, Bala.....manende e, ‘Er
‘Er.....lêmanende e.

Di vê beytê de helbestvanî çavên yara xwe ji gula nêrgizê ciwantir nişan daye, wate manendina pesendîde dirust kiriye. Bejna yara xwe jî çiwandiye bejna ‘er ‘erê, lê belê dema ku dibîne bejna yarawî ji bejna ‘er ‘erê ciwantir e, ji gotina xwe peşîman dibe û dibêje dema ‘er ‘erê bejna yarê dît xwe tewand û ranebû. Bi vî awayî di vir de jî manendina pesendîde ji aliyê helbestvanî ve hatiye sazandin. Di beytek din de helbestvan dibêje:

“Yaxey xoy dadirî gul yar ke meylî gulistanî kird,

Le daxî qametit serwîş le balay xoy kemanî kird”

Yar.....manende, Gul.....lêmanende, Qamet.....manende, Serw.....
lêmanende.

Helbestvanî di vê beytê de rûyê yara xwe ji gulê pesendtir kiriye û girîngtir nişan daye, wate manende ji lêmanendeyê pesendtir kiriye, çunke dibêje gulê bi wê hemû ciwanî û nazenînbûna xwe dema yar dîtiye li xwe şerim kiriye û xwe veçiriye, dara serwî jî dema bejna yarê dîtiye bejna xwe li ber çemandiye û xwe menixandiye erdê. Helbestvan bi awayî dibêje ne gul digihe ciwaniya rûyê yarê, ne jî dara serwî digihe bejna yarê û manendina pesendîde berceste dike. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Şehd û şeker ey qurban bazarî şika yekcar,

Lew weqtewe wa derkewt le’lî lebî şîrînit” r. 66.

Şehd û şeker.....manende, Le’lî lebî şîrînit.....lêmanende.

Helbestvan di vir de, şehd û şekerê dişibîne şîrîniya lêvên yarê û dibêje dema yar derket û bi wan lêvên xwe ên ku wek gewherê ne, dest bi axaftina şîrîn kir, bazara şehd û şekerê şikest. Wate di vir de lêvên yarê ên wek gewhera le’l sor û her wiha gotîşîrîn in, li bal helbestvanî pesendtir in. Di encama vê ravekirinê de derdikeve ku helbestvanî manendina pesendîde sazandiye.

5- Manendina Kurtkirî(el-Teşbiye el-Mecmel):

“Ew manendine ye, ku hêla lêmanendeyê de nebe tenha manende, lêmanende û daçekamanendinê hebin.”¹⁵¹ Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Nimûney rûyî toye periyî gul,

Fîdat bim ey benî cerg û perey dil” r. 75.

Rû.....manende, Gul.....lêmanende, nimûney....daçekamanendinê.

Di vê beytê de hêla lêmanendeyê derneketiye, boye helbestvanî jî rûyê yara xwe di warê ciwanîyê de çiwandiyê gulê. Her di vê beytê de helbestvanî manendina awejû/dij dirust kiriye. Di vir de ji ber ku hêla lêmanendeyê dernakeve, jêre manendina qule. Helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Nimûney çaw û rûtin mang û perwîn,

Nexoşe dil le lêwit bêne hengiwîn” r. 108.

Çaw....manende, perwîn.... lêmanende,

rû....manende, mang....lêmanende, nimûney....daçekamanendinê.

Di vê beytê de jî her wek beyta jorê rûyê lêkçiwandibê derneketiye, tenha manende, lêmanende û daçekamanendinê derketine û bi vî awayî manendina qule dirust bûye.

6- Manendina Wêne bi Wêneyan:

“Ew manendine ye, ku wêneyek bi wêneyek din tê manendin. Her wêneyek jî li çend parçeyek an çend manende û lêmanendeyan pêk tê. Di vir de mebest parçe bixwe nîn in, belkû mebest ew tiştên ku van parçane pêk tînine. Wate li cihê ku tiştêkê bi tiştêk din biçiwêne wêneyekê bi wêneyek din diçiwêne. Mebest ji wêne ew e, ku ji gelek parçeyan pêk hatiye.”¹⁵² Her wek Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Dilim bo baxî rûy ew bulbul asa zor peşêw hale,

Rehî mehdûde çunke zulfekanî mîslî perjîne” r.137.

¹⁵¹ Rokan Gurîl Şî'ya, *Hunerekanî Rewanbêjî le Şîrî Folklorî Kurdîda*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Silêmanî, 2014, 24.

¹⁵² Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972, 51.

Ehmed Muxtar di vir de du wêne dirustkirine, wêneyê yekemîn ji (dil, rû û zulf)ê pêk hatiye û çiwandiye bi wêneyê duyemîn ku ew jî ji (bulbul, bax û perjîn)ê pêk hatiye. Helbestvan dixaze rûyê yarê bibîne, lê belê dibêje zulfên wê rûyê wê wek perjan daxistîne û nahêlin ez bibînim. Yanî wek çawan dema bilbil dixaze biçe bo gul û lê belê baxê gulan bi perjan hatiye dayêxistin û rê li bilbilê girtiye, zulfên yarê jî her bi heman şewe li min kirine. Helbestvanî bi vî awayî wêneyek bi wêneyek din dirust kiriye ji bo me. Di beytek din dibêje:

“Fustanî reşî nazikî çîn çînî le berda,

Wek hewrê siya bê be ser qursî qemerda” r. 52.

Wêneyê yekemîn: Fustanî reş....manende, Wêneyê duyemîn: Qursî qemerda.... lêmanende.

Helbestvanî di vê beytê de wêneyê yekemîn, fustanî reş, çiwandiye wêneyê duyemîn, qursî kemer. Bi watayek din helbestvan nehatiye her parçeyek wêneyê yekemîn bi cihê cihê neçiwandiye parçeyên wêneyê duyemîn. Helbestvanî di wêneyê yekemîn de (yar û fistan), di wêneyê duyemîn de mînanîye bi (ewrê reş û heyv)ê. Wate wêneyê yekemînmanendeye, wêneyê duyemînlêmanendeye û dema yara xwe dîtiye ku kincek reş li ber de ye, wisa hest kiriye ku ewrek reş li ser heyvê be.

7- Manendîna Têkra:

“Ew manendine ye, ku hêla lêkçûnê tê de dernakeve.”¹⁵³ Wek Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Nayelê lew gencî husn û dulbere behrem bibê,

Daîma meşxulî defî zulfî wek reşmarî tom” r. 87.

Zulf....manende, Reşmar.... lêmanende, Wek....daçekamanendinê, Hêla manendeyê nehatiye.

Helbestvanî di vê beytê de biskên yara xwe çiwandiye marê reş û dibêje van biskane rûyê yara min wek marê reş dapoşîye û rêgirî li min dikin û nahêlin ez rûyê ciwan û bedew ê dîlbera xwe bibînim. Helbestvanî di vir de wêneyê têkra ki me re dirust kiriye û hêla manendê bi kar neaniye û her wiha di beytek din de dibêje:

¹⁵³ Ebdul Selam Salar, *Waney Qonaxî Sêyemîn*, Silêmanî, 2009-2010

“Meylî seyri bedr eka dil, lade zulfî wek hîcab,

Derxe bedrî rûmetî xot şoxekey ‘alî cenab” r. 61.

Bedr....manende, Rûmet.... lêmanende, Wek....daçekamanendinê, Hêla manendeyê nehatiye.

Di vê beytê de, di hevoka yekemîn de helbestvanî bêjeya (bedir-meha çardeh) bi kar aniye, lê belê nek bi wataya rasteqîne belku ji bo rûyê yara xwe bi kar aniye. Bi watayek din mebest rûyê yarê ye nek wataya meha çardeh. Bes di hevoka duyemîn de heman bêje (bedr) dubare bi kar aniye, lê her bi wataya xwe a rasteqîne, wate bi wataya meha çardeh, çunke rûyê yara xwe pêçiwandiye.

8- Manendina Di Nav Yek de:

“Ew manendine ye ku ji bo du lêmanendeyan bêjeyek dibe manende.”¹⁵⁴ Wek Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Hemîşe lalezade dewrî qebrî ‘uşşaq,

Eken temsîlî lêwî le’l û kulmî alo rengînit” r. 67.

Manendina yekemîn: Lêw....manende, Lalezad.... lêmanende.

Manendina duyemîn: Lêw....manende, Le’l.....lêmanende.

Di vê beytê de helbestvanî lêvên yara xwe carekê bi lalezadê çiwandiye û carekê jî bi gewhera le’l çiwandiye. Bi vî awayî lêw bo du lêmanendeyan bi kar hatiye. Di vir de mebesta du car manendina lêvên yarê bi du tiştan eve ye, ku balê bikêşe ser ciwaniya wan û şîrînî û binirxbûna wan derxîne pêş. Ji vê cure manendinê re manendina têhelkêş jî tê gotin.

Behsa Sêyemîn:

Girîngiya Manendin û Mebestên Wê di Helbestan de:

Wek me di destpêkê de jî gotiye, manendin hunerek gelek berfireh e û her wiha ewqas zêde bikaranîna lêmanendeyê her ji xwe nîn e, çunke hinek mebest û

¹⁵⁴ Ebdul Selam Salar, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2000, 73.

armancên wê hene di helbesta klasîk a kurdî de û piştî klasîkê jî, boye emê di vir de mebest û girîngiyên wê rave bikin.

Yekemîn:

“Bi riya manendîne tiştên jîrî, wate tiştên ku tenha bi riya bîr, hiş û ravekirinê tîne zanîn û li ber hîç hestekê nakevin, bi hestan tîne manendin ji bo ku di tîgihîştina wan de naronî nemîne. Yanî tiştên jîrî ji me re ronî dîke.”¹⁵⁵ Her wiha “Ji bo ku manende bête zanîn li gellêmanendeyê tîte berawirdkirin.”¹⁵⁶Wek helbestvan Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Bixwênin çunke xwêndin bo dîfa’î tîxî duşmîntan,

Hemû an û zemanê ‘eynî qelxan û supertan” r. 146.

Xwêndin....manende.....jîrî ye, qelxan û super....lêmanende..... hestî ye,

‘Eynî....daçekamanendîne.

Helbestvanî di vê beytê de xwandin çiwandîye mertal û zirxî ji bo ku em xwe li hemberî tîr, fêl û biyanûyên dijminan û her wiha li hember bêdadî û kirdeyên paşverû biparêzin. Boye dibêje bixwîn, eger hûn bixwîn fêrî zanist bibin hûnê hişyar û tîgihîştî bibin û xwe li hember van tiştane biparêzin. Di vir de xwandin jîrî ye û çiwandîye bi mertal û zirx ku hestî ne. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Qametî bo min wekû rojî qiyame çawekem,

(Ehmed) Îtir heşr û neşir û nefxî sûrim bo çîye” r. 146.

Qamet....Manende....Hestî ye, Rojî qiyamet ... Lêmanende ... jîrî ye,

Wekudaçekamanendîne.

Di vir de helbestvanî qamet an bejna yarê çiwandîya roja qiyametê. Qamet hestiye û tê hestkirin, lê roja qiyametê jîrî ye çunke bi riya hizr û bîr ve tê hestkirin, boye qamet manendeye, roja qiyametê lêmanendeye. Wate me şîya bi riya manendîne hestî bi jîrî cihê bikin.

¹⁵⁵ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 97.

¹⁵⁶ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 158.

Duyemîn:

Li gor me roleke din a manendinê xemilandin û wesifkirina manendeyê ye. Ev yeke rola serekî a manendinê ye ku helbestvan wê pêşdixe û li ser dixebite ji bo ku di asta yekemîn de manendeyê pê bixemilîne. “Di vir de ji bo ku bihêziya endaze an pîvana hunera manende bête derxistin, wisa bilind tê ragirtin.”¹⁵⁷Wek Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Rûmetit bedre milit mînay safe bê xeşe,

Demqûtûy daney durî deryaye, lêwit şekker” r. 111.

Manendina yekemîn: Rûmet....manende, Bedr....lêmanende,

Manendina duyemîn: Mil....manende, Mîna....lêmanende,

Manendina sêyemîn: Demqûtû....manende, Daney dur....lêmanende,

Manendina çaremîn: Lêw.....manende, Şekker.....lêmanende.

Helbestwanî di vê beytê de çar manendin sazandine, di manendina yekemîn de rûyê yarê ji ber ciwaniya wê çiwandiye bi meha çardehê, di manendina duyemîn de stûyê yarê ê narîn û nazenîn çiwandiye bi gewhera mîna, di manendina sêyemînde devê yarê ê biçûk û ciwan çiwandiye bi gewhera durî, di manendina çaremîn de jî lêvên yarê ên gotinşîrîn çiwandiye bî şekirê. Helbestvanî ev hemû lêmanendeene ji bo xemilandin û wesifkirina manendeê anîne.

Sêyemîn:

Rolek din jî a manendinê ew e, berewajî mebesta ku me li jorê baskiriye, manendeê naşîrîn û xirap bike. Wek bikaranîna bêjeya (seg-kûçik) ji aliyê helbestvanî ve. Helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Çî ebê carê bilêy tobe û reqîbet dulbera,

Laço segbab besyetî kelbî ‘eqûrim bo çî ye” r. 126.

Reqîb....manende, Kelbî ‘eqûr....lêmanende.

¹⁵⁷ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 159.

Helbestvanî di vê lêmanendeyê demanende (reqîb)çiwandiye bi (kelbî 'eqûr) kulêmanende e. Helbestvanî, reqîb an hevrikê xwe bi kûçik çiwandiye. Wate ev lêmanendee, lêmanendeyek naşîrîn û bêrewîşt û bêrêz e.

Çaremîn:

Di vir de gelek sifetên ciwan û şayeste ji manendee re tîn dan, ku di rastî de, di hinekan de zêderewî an zêde mezinkirin heye, lê belê ji ber ku hinek ji wan manendinan berhemên xeyalên helbestvanî ne û hem “ Hêza xeyal, hest û sozênciwan û erjeng û zewqa me vê zêderewiye qebul dikin, di encamê de jî tiştên ciwan berpa dibin.”¹⁵⁸ Wek Ehmed Muxtar Beg di vê beytê de dibêje:

“Serim wek go le cêgey baziya danave ey cana,

Serî zulfî le bo çewganî bazî mîslî çewgane” r. 109.

Ser....manende, Go....lêmanende, Serî zulf....manende, Çewgan...
lêmanende, Wek....daçekamanendinê.

Di vê beytê de xeyal rolek mezin digêrîne di warê edebî û hunerî de ta wisa lê tê ku dibe bingehê mayînde. Her wiha her dîsa xeyal e ku dibe binemayê dirustkirina lêmanendeyek bihêz û qewî. Heta ku xeyala helbestvanî bihêztir û bilindtir bifire, ew jî lêmanendeyên ewqas ciwan, bedew û bêwêne dirust dike. Ehmed Muxtar Beg jî yek ji wan helbestvanan e, ku xwediyê şîyan û tuwanayê ye ta ku bikare bi lêmanendeyên şikomend û şayeste wêneyên nayab û bilîmet dirust bike. Wate Ehmed Muxtar Beg kesek behremend û hunermend e û di vî warî de serkevtî û pêşkevtî ye.

Pêncemîn:

“Mebestek din a lêmanendeyêravkirin an ron kirine.”¹⁵⁹ Ev yeke jî di demekê de rû dide ku mijar neyê zanîn an nediyar be. Her helbestvan tê bi riya mijar an babetek ku tê zanîn ve, wêne dike û ronî dike. Wek di vê beyta jêrê de helbestvan ji me re roja qiyametê bedî dike:

¹⁵⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 99.

¹⁵⁹ Tehsîn Heme Xerîb, *Culey Hikmet û Bînîni Nûrî 'Îrfanî Mehwi*, 1423./2002, 115.

“Qametit bo min weku rojî qiyame çawekem,

(Ehmed) îtir heşr û neşr û nefxî surim bo çî ye” r. 146.

Qamet....manende, Rojî qiyamet....lêmanende, Weku....daçekamanendinê.

Helbestvanî di vê beytê de qamet an bejna yarê çiwandiye bi roja qiyametê, ku rojek naron û nediyar e li cem me. Helbestvan bi riya bejna yarê, roja qiyametê ku bi riya hizr û jîrî ve em dikarin bizanin, ji me re ron kiriye. Wate dibêje dema roja qiyametê hat, em hemû kes dê biçin beramber yezdan û êdî li wê derê pêwîst bi hîç tiştekê nîn e; dema ez jî bi yara xwe gihiştim min jî êdî pêwîst bi hîç tiştek nîn e.



BEŞA DUYEMÎN

XAZE (el-MECAZ)

Behsa Yekemîn:

Pênaseya Xaze û Binemayên Wê û Cureyên Wê di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de

Behsa Duyemîn: Pênaseya Sparde û Binemayên Wê

Behsa Sêyemîn: Cureyên Spardeyê di Helbesta Ehmed Muxtar Caf de

Behsa Çaremîn: Girîngiya Sparde û Mebestên Wê di Helbestê de

Behsa Pêncemîn: Berawirdiya Sparde û Manendinê

Behsa Yekemîn/

Pênaseya Xaze û Bineamayên Wê:

Yekemîn: Pênaseya Xaze:

Xaze pêş ku wek têgehê girîng di nav rexneya wêjeyê de be, têgehê zimanevanî a girîng e ku di ferhenga zimanê gelan de bedî dibe. Her wiha di zimanê erebî de têgeha (el-mecaz), di zimanê ingilîzî de (allegory) jêre hatiye danandin. Di ferhenga rewanbêjiya erebî de xaze wate el-mecaz berewajî rastî an heqîqetê ye. Wate eger em heqîqetbûnê wî awayî bizanin ku “Bêjeyek e, ji bilî wataya xwe a serekî û rasteqîne nayê bikaranîn û her wiha di dema axaftinê de, jêre rave û hêrsengandinek din pêwîst nîn e. Lê belê xaze berewajî vê pênaseyê ye, yanî bêjeyek e, di wataya xwe a rasteqîne de bi kar nayê.”¹⁶⁰ Xaze, li cem Ereba Ebû Fetîh Kurî Usman wek (Îbin û Cinîn) tê zanîn û her wiha dibe ev kese yekemîn rewanbêj be ku pênaseya hunera xazeyê kiriye. Her wiha heman kes e ku ji bo vê hunerê têgehê rêkûpêk bi kar aniyê û gotiyê: “Dirust-heqîqet ew e; di dema bikaranînê de, ji bo wê yekê tê

¹⁶⁰ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 103.

bikaranîn ku di bingeh de yan di ziman de jêre hatiye danandin, lê belê xaze berewajî vê yekê ye.”¹⁶¹

Her dîsa di warê xazeyê de, di çavkaniyên nû de tê gotin: “Xaze, şêwazekî din ê şîrovekirin û ravekirina bîrokeya helbestvanan e. Gotin an fêlekî balkêş e, ku bêjer an edîb ji bo ku di edebiyatê de guhdar an xwendakarî/ê bi rîtm an bi melodiyê lêdibîne û wan bixwe pey, bi kar tîne. Di xazeyê de hebûna qerîne an nîşaneyên rêgir û peywendiyê di navbera wataya dirust û xazeyê de merc e.”¹⁶² “Xaze ji ber peywendiyên di navbera wan de, bêjeyê bi xeyrî wê wataya ku jê re hatiye danandin, bi kar tîne. Lê ev peywendiyê lêkçûn nîn e li gel qerîneyekê de, di wê dema ku bêje bi wataya xwe a rasteqîn de bi kar tê, ku rêgirî lê dike.”¹⁶³

Xaze li cem farisan wiha hatiye pênasekirin: “Bêje ji wataya xwe a rasteqîne tê dîrxistin. Ereban, ji bo ku guhdar baştir têbigihin û derbirîn ciwantir bin, ev cure şêwaze bi kar anîne. Bo nimûne ew kesê ku di bin bandora gotinan de namîne, ji bo têgiştina zêdetir û berfirehkirina zimanê xwe, jê re bêjeya (mît) anîne. Ev yeke jî wisa dike ku guhdar zêdetir ji bêjeyan tamê werbigire û her wiha ji bo dîtina wan jî hewesê wî/ê zêdetir be.”¹⁶⁴ Di zimanên gelan de girîngiyek mezin ji xazeyê re hatiye dan û xwediyê nirxek mezin e. Çünke ji bo dahênana wêneyê rewanbêjî çavkaniyek girîng e û zanayên rewanbêjiyê jî bi berfirehî lêkolîn li ser kirine û zanyariyên baş di warê vê hunerê de bi dest xistine. Di zimanê yunanî de Erîsto wiha qala xazeyê kiriye: “Navek ji bo wataya tiştêkê tê danandin ku weguhêze ji bo tiştêk din. Ev weguhestine jî an ji regez bo cur, an ji cur bo regez; ji cur bo cur, an bi pê nimandin (Hesab El-Temsîlî)ê dibê.”¹⁶⁵

Erîsto bi şêweyek giştîgîr, hîç tiştêk nehêlaye û qala hemû tiştêkê kiriye. Her wiha Sekak jî bi şêweyek rûntir pênaseya xazeyê kiriye û dibêje: “Xaze ji wê bêjeya bikarhatî a ji bo cihê wataya xwe a dirust bi kar hatiye, pêk tê. Wate di warê rasteqîneya xweyî de ji bo tiştêkê tê bikaranîn, ku cihê xwe ye. Diyar e qerîneyek jî

¹⁶¹ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 2010, 110.

¹⁶² Zehre Sermed, *Sûre Xeyal der Xezelyati Şehiryar*, Weşanxaneya Bilûr, Çapa 1., 1387., Ş., 148.

¹⁶³ Îdrîs Ebdula, *Kowanekanî Rewanbêjî*, Hewlêr, 2014, 175.

¹⁶⁴ Ebdulhuseyîn Naşir Hesam El-‘Ulma’î Eql Ewel, *Der el-Edeb der Feni Me’anî, Beyan, Bedî’*, Çapa 3., Çapxaneya Şirket Samî, 1340-Ş., 157.

¹⁶⁵ Erîsto, *Feni Şîr*, 58.

di gel de ye, ji bo ku rêgir be ji bo bikaranîna wataya xwe a rasteqîne.”¹⁶⁶ Piştî vê pênaseya Sikak, rewanbêjan ji bilî di derbarê şêwazê darijtina vê hunerê de nebe, di warê têgeha xazeyê de hîç pênaseyek din nekirine. Her nivîskar an wêjenasek dixaze bi şêweyek kurttir, rûntir û ciwantir pênase bike ku ew yeke jî tişteke asayî ye. Her rewanbêjekê xwastiye pênaseya wî kurttir be. Eladîn Secadî mijara xaze û nixmanyê bi hev re aniye û wan ji hev cihê dike. Eladîn Secadî ji bo xazeyê dibêje: “Ew bêjeye ye, di wextê xwe de ji bo rewşek taybet hatiye danandin. Ew bûyere bûye bûyerek rastiya bêjeyê, niha jî ji bo bûyerek din hatiye weguhestin.”¹⁶⁷ Ezîz Gerdî jî xazeyê wiha pênase dike: “Xaze ewe ye bêjeyek bi wataya xwe a rasteqîne nayê bikaranîn û watayek din û mebestek din bigihîne.”¹⁶⁸ Her di heman warî de Serdar Gerdî jî dibêje: “Helbest bi bê xaze pêkhatayek bêgiyan e, çunke wêneyê xazeyî beşek e ji wê rûhiyeta ku helbestê zîndî dike. Li cem hin rexnegirên din nîrxê wêneyê hunerî ewqas bilind û şikomend e, her qesîdeyek bixwe ta radeyekê wêneyek helbestî ye û ji komelek wêneyên din ên helbestî pêk hatiye.”¹⁶⁹

Li gor wan bîr û boçûnên jorê, derdikeve ku hemû pênaseyên hunera xazeyê li hev nîzîk in û mebestek diyar û aşkira didin dest. Her wiha li gor ramana me jî, xaze bêjeyek e ku di wataya xwe a rasteqîne de nayê bikaranîn û bi watayek din bi kar tê. Ji ber hebûna peywendiyek ku ev peywendiyê her tim li gor dem, cih û kelepûrê, di navbera bêjeyan dediguhere. Wate li gor hevok û beytên helbestan diguhere. Vê hunerê bi şêweyek berbiçav di helbesta Ehmed Muxtar Beg de rengvedaye û dibêje:

“Le xew helsin direnge mîlletî kurd xew zerertane,

Hemû terîxî ‘alem şahîdî fezl û hunertane” r. 146.

Helbestvan dema di vir de dibêje ji (Le xew helsin-ji xevê rabin), bêguman di vir de mebest xev bixwe nîn e, wate bêje di wataya xwe a rasteqîne de bi kar nehateye, bi wataya hişyarbûn ji nezanînê, dūrkevtin ji kevnepereştî û paşverûtiyê

¹⁶⁶ Ebdulhemîd Hendawî, Ebu Yaqub Yusuf Bîn ‘Elî el-Skakî, *Miftah el-‘ilûm*, Çapa 1., Çapxaneya El-‘ilmiye, Beyrût û Lûbnan, 2000, 170.

¹⁶⁷ Eladîn Secadî, *Xoşxwanî (Guzarekar-Rewankarî-Ciwankarî)*, Çapxaneya Me’arîf, Bexdad, 1978, 55.-56.

¹⁶⁸ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Silêmanî, 67.

¹⁶⁹ Serdar Ehmed Gerdî, *Binyadî Wêneyê Hunerî le Şîrî Kurdîda*, Silêmanî, 2004, 103.

hatiye bikaranîn û helbestvan ji gelê kurd re dibêje zana û jîr û bi agah bin, xwe ji vê bindestî, zilm û dagîrkeriyê rizgar bikin.

Duyemîn/

Binçîneyên Xazeyê:

Hunera xazeyê jî her wek hunerên din ên rewanbêjiyê çend binçîneyek girîng hene, ku dirustbûn, jêtêgihiştin û ravekirinê de xwediyê rolek girîng in. “1/ Wataya bêjeyê a dirust. 2/ Wataya xazeyî. 3/ Peywendiya di navbera wataya bêjeyê a dirust û xazeyî de. 4/ Nîşaneyek ku amajeyekê bigihîne û mebesta wê xazeyî be nek rasteqîniya bêjeyê.”¹⁷⁰ Mebest ji xala yekemîn, wataya bêjeyê a ferhengî ye, ku gelek ji axêver û guhdaran li ser rêk ketine; xala duyemînxazeyî ye, yanî bêje ji wataya xwe a rasteqîne dûr dikeve û axêver an helbestvan li gor wîst û mebesta xwe watayê lê bar dike û ji bo têgihiştina wataya wê jî pêwîstî bi lêhûrbûnê heye; xala sêyemîn, dibe di navbera her du aliyan de peywendî hebe û wataya xaze ber bi wataya rasteqîne ve bête anîn û xala çaremîn jî nîşane û bîngehek girîng e û em dikarin wê wek kilîla peydakirina wataya xazeyî bihesibînin, her wiha bi ciwanî jî ji me re dibêje mebest wataya rasteqîne nîn e. “Nîşane dikare bêjeyî an watayî be. Nîşaneya bêjeyî eve ye; di axaftinê de têgehek tê bikaranîn ku bîr û hiş bikarin bi riya wataya dirust, ji wataya têgehên xazeyî têbigihin. Qerîneya watayî eve ye; ku hîç têgehek di li holê nebe û halet, dirûv û şewazê axaftina axêver amaje be ji bo wê yekê ku mebesta wî wataya xazeyî ye.”¹⁷¹ Ehmed Muxtar Caf di helbestên xwe de wiha wênekiriye:

“Le xew helsin direnge mîlletî kurd xew zerertane,

Hemû terîxî ‘alem şahîdî fezl û hunertane” r. 146.

Xew.... Wataya Xazeyî, Hişyarkirina gel....Wataya rasteqîn a bêjeyê,

Helsin/rabin....Peywendiya di navbera wataya dirust û xazeyî a bêjeyê de,

Zerer...Nîşane û amajeyek e ji bo bêagahî, nezanîn û paşkevîtinê.

¹⁷⁰ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwîda*, Silêmanî, 2014, 106.

¹⁷¹ Meryem Amilî, *Sûr Xeyl der Şîrê Firûx Firûxzad*, Çapxaneya Mens», Çapa 1., Tehran, 1382-Şems, 48.

Di vê beytê de mebest ji bêjeya (xev), bêagahîbûn û nezanîn e, wate hatiye sparde xelkê wê serdemê hişyar bibe û dema ku dibêje ji xevê rabin yanî ji gelê xwe ê wê re daxwaz dike ku bi agah bibin û têgihîştî bibin û hest bi zilm û zordariya dagîrker û dijminên xwe bikin û li dijî wan derkevin. Çunke li gor wî her ku diçe ji ber vê nezanîn û bêagahbûnê gelê wî ber bi rewşek xiraptir ve diçe û tê lêbandin, boye ji bo ku gelê kurd ji vê rewşê rizgar bibe bêjeya (xev) ji bo agahdarbûn û hişyarbûnê wek xaze bi kar aniye û di wataya xwe a rasteqîn de nîn e.

Sêyemîn/

Cureyên Xazeyan di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de

Du cur xaze hene:

1/ Xazeya Jîrî,

2/ Xazeya Zimanî

1/ Xazeya Jîrî (el-Mecaz el-‘Eqfî):

Ezîz Gerdî di warê vê xazeyê de dibêje: “Xazeya jîrî ewe ye, mirov karekê bidin pal kesek an tişteke ku di rastî de heq nîn e bidin pal wî/ê. Wek bibêjin; ‘Eskender artêşa Darayî şikand.’ Di vir de eve derdikeve ku qaşo Eskender çek hildaye û dijmin li nav biriye, ku di rastî de dibe her şer jî nekiribe. Lê belê eve heye, wî ji bo linavbirin û terikandina dijmin ferman daye leşkerên xwe û leşkerên wî jî dijmin li nav birine. Lê navê serkevtinê ji bo Eskender e. Wate me şikandina leşkeran daye pal Eskenderî, çunke ferman û zîrekiya wî tê deye.”¹⁷² Wate her kesekî/ê dema fermanek derxist û ew bi jêhatiyane bi kar anî, wê demê em dikarin tenha qala wî bikin, boye ji vê hunerê re xazeya jîrî tê gotin. Bo nimûne kesek ji bo karekê plan û bernameyek ciwan dadirêje û di encamê de serkevtinê bi dest dixê. Hingî em navê wî bi kar tînin ku di rastî de bixwe jî di cêbecêkirina planê de cih negirtiye, an nexebitiye, tenha eql û jîriya xwe tê de bi kar aniye.

¹⁷² Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Silêmanî, 86.

Eladîn Secadî jî ji bo xazeya jîrî dibêje: “Kar an taybetmendiya kes û tişteke didin pal kes û tişteke din ku di rastî de heqê wî/ê nîn e. Wek tê gotin: ‘Min qesrek avakir.’ Rast e, belkî ew kese bûye sedema dirustkirina wê qesrê, lê belê di rastî de kirêkaran avakiriye. Boye ji vê xazeyê re, xazeya jîrî tê gotin, çunke kesî/ê jêhatî vê fermanê dide.”¹⁷³ Helbestvan Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Adetî em çerxe waye, ehlî dil xemgîn eka,

Şa hemîşe mate, piyade meylî cêy ferzîn eka” r. 58.

Ehmed Muxtar Beg di beyta jorê de bêjeya (çerx-serdem) bi kar aniye ku mebesta wî serdem û xelkê wê serdemê ye, wate dixaze bibêje xelkê wê serdemê wisa lê hatiye kesên dildar xemgîn dikan. Xazeya jîrî bi kar hatiye, wê yekê em dikarin bi eql û jîrî diyar bikin. Her wiha di berdewamiya beytê de dibêje şah mat bûye û xelk hewl dide cihê wezîr bigire. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Dujmine çerxî felek, bo piyawî sahêb eql û hoş,

Rûy kerem daîm le herze û şet û bêtemkîn eka” r. 58.

Helbestvanî di vê beytê de jî bêjeya (çerx) bi mebesta serdem û xelkê wê serdemê bi kar aniye û dibêje ev serdeme an xelkê wê serdemê ji zilamê zana û hişyar re dijmin e û her wiha rûyê keremdar û bexşende her tim bêhêz dike û wî ji çalakî û karkirinê qut dike û ji şiyar û karînedûr dixê. Em di vir de bi riya eql, xazeya jîrî diyar dikan.

2/ Xazeya Zimanî (el-Mecaz el-Lexawî):

Di vê hunerê de, “Bêje ji wataya xwe a rasteqîne tê qutkirin û peywendîya di nabera her du watayan de heye ji holê tê rakirin, tenanet nîşaneyek jî tê danandin ji bo ku wataya qedexe bike. Di vê pênaseyê de mebest ji ladana wataya ferhengî a bêjeyê tenha bêjeya sade nîn e, belku gelek car wisa dibe bêjeya hevedudanî jî têkel dibe.”¹⁷⁴ Ezîz Gerdî jî dibêje: “Xaze pêktê bi bikaranîna bêjeyekê ji bo bilêvkirina derbirînek din, bêyî ku ji bo xwe bikar bê. Ev jî di derdbarê wê peywendiyê de ye, ku di navbera wataya rasteqîn û xazeyî de heye û li gel hebûna nîşaneyê zimanî.”¹⁷⁵ Di pênaseyek din de dibêje: “Pêk tê ji weguhestina wataya bêjeyê a ferhengî a ku jê re

¹⁷³ Eladîn Secadî, *Edebî Kurdî û Lêkolînewe le Edebî Kurdî*, Çapxaneya Me’arif, Bexdad, 1967, 93.

¹⁷⁴ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 172.

¹⁷⁵ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî*, 68.

hatiye danandin, ji bo watayek nû. Ji ber hebûna peywendiya wataya yekemîn û duyemîn, dibe qerîneyek hebe ji bo ku rê li wataya yekemîn bigire, ku mebest ew nebe û bîr li wê neyê kirin û çunke mebest wataya duyemîn e.”¹⁷⁶

Xazeya Ziman Du Cure Ye:

A/ Xazeya Hinartî (el-Mecaz el-Mirsal),

B/ Sparde (el-Îstî'are)

A/ Xazeya Hinartî (El-Mecaz El-Mirsal):

Ezîz Gerdî di berhema xwe de ji bo vê hunerê navê (Xazeya Berela) bi kar aniyê, lê belê lêkolerên piştî wî navê (Xazeya Berbilav) bikar anîne. Ezîz Gerdî dibêje: “Nabe peywendiya di navbera tiştên lêxwazraw ji bo xwazrawmanende be, wek sparde. Çunke hîç peywendiyek xazeya hinartî bi wan peywendiyên ku du tiştan bi hev digihînin ve nîn e, ku ewqas zêde ne nayên jimartin.”¹⁷⁷ “Di vê hunerê de bêje ji wataya xwe a serekî derdikeve û bi watayek din tê bikaranîn. Ji ber hebûna peywendiyekê di navbera her du watayan de, ev peywendiyê lêkçûn jî nebe û nîşaneyek hebe wataya yekemîn ji holê rake.”¹⁷⁸

Ev hunera rewanbêjiyê cureyek girîng a xazeya zimanî ye, li pal hunera sparde de; “Di dîroka rewanbêjiya ereban de hatiye selmandin ku Sikkakî yekemîn kes e têgeha El-Mursel bi kar aniyê, ji bo vê cure xazeyê. Sikkakî hunera xazeya berbilav li gel hunera sparde de berawird kiriye, ku bi şeweyekê xazeya berbilav û tak digire. Xaze ew e; bêjeyek ku lêkçûn hebe yan nebe, ji ber peywendiyên, bikare cihê bêjeyek din bigire, ku a yekemînsparde e, a duyemîn jî xazeya berbilav e.”¹⁷⁹ Her wiha ji bo dirustbûna vê cure xazeyê jî zanayên rewanbêjiyê gelek ji van peywendiyane destnîşan kirine. Her ji ber zêdebûna van peywendiyane navê xazeya berbilav jê hatiye kirin. Peywendiyên vê jî ev in: “Peywendiyên giştî (el-kuliye), kertî (el-ciz'îye), çawayî (el-haliye), şiwênî (el-mekaniye), ewa ku bûye (makan),

¹⁷⁶ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemdi û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2010, 111.

¹⁷⁷ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî*, 83.

¹⁷⁸ h.ç., 173.

¹⁷⁹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 110.-111.

hoyî-sedem (el-sebebiye), ewa ku dibe (mayekûn), sedem (el-sebebiye)û amêrî (el-aliye).”¹⁸⁰ Helbestvan Ehmed Muxtar Beg dibêje:

“Reng spî bûn lerze lerzî dest û ejnom pê m bilê,

Qaîdey toye weyaxud şêweyî damadî ye” r. 159.

Helbestvanî di beytê de bi riya bikaranîna bêjeya (reng spî) xazeya berbilav sazandiye, ku mebesta wî nexweşî, bêhêzî û bêtaqetî ye. Her wiha dibêje lerze lerza dest û çokên min ji min re dibêjin eve şûnpêyên te ne, an ên zavatiyê ne ku wiha reng spî bûyî, nexweş, bêhêz û bêtaqet bûyî.

BehsaDuyemîn/

Pênaseya Sparde û Pêkhatyên Wê:

1/ Pênaseya Spardeyê: Ji Aliyê Bêje ve/

“Sparde yanî wergirtina tiştêkê ji kesekê, ji bo ku di cihê pêwîstiyek din de an di şiwênek din de bi kar bîne. Bo nimûne pênûsekê ji hevalê xwe dixwazî ji bo ku nivîsa xwe pê binivîsî, her wiha ji bo spardeya kiçekê ji malbaba vê tê bikaranîn, kurek wê dixaze û tîne mala xwe û dike hevsera xwe û li mala xwe danûstandina li gel dike. Bo nimûne tê gotin min ev pênûse ji filan kesî/ê xwast, yan me ev kiçe filan kesî/ xwast û bi vî awayî em wataya bêjeya spardeyê berpa dikin.”¹⁸¹

Di rewanbêjîyê de ji aliyê têgehê ve mebest ji spardeyê, “Bêje ji bilî wê wataya ku di bingehîn de jê re hatiye danandin, bi watayek din de tê bikaranîn; ji ber peywendiya lêkçûna di navbera wataya ku jê hatiye wegühestin ji bo wataya ku jê re hatiye bikaranîn.”¹⁸² “Hunera sparde, li cem feylesof, ehlê mentiq û rewanbêjan xwediyê cihek gelek girîng bû, ku her çend e di warê bîr û boçûnan de ji hev cihê jî bin. Her wiha zimanzan û zanayan jî sparde hem ji aliyê derekî û hem jî ji aliyê navekî ve vekolîne. Boye çendîn dabeşkirin û polînkirinên cur bi cur ji bo spardeyê peyda bûne û gelek ji wan jî li gor şêwazê bîr û ramanên zanista wan zanayan bû ku zanista xwe li ser damezrandine. Tenanet van zanayan xebatên xwe li ser hunera

¹⁸⁰ Reuf ‘Usman Me’ruf, *el-Cewanib el-Belaxiye ‘Înd el-Newdehî*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Silêmaniye, 2000, 119.

¹⁸¹ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan le Şîrî Klasîkî Kurdîda be Nimûne (Hemdî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2010, 125.

¹⁸² h.ç., 125.

sparde avakirine, boye hinek ji wan zanayan hunera sparde heta sî û heft (37) beşan biriye.”¹⁸³

Sparde wek hunerek diyar, girîng, bihêz û çirayê rewanbêjiyê di wêjeya rojava de, li gor hunerên din ên helbest û zimanevaniyê xwediyê nîrx û bihayek taybet e. Di zimanê ingilîzî de ji bo têgeha spardeyê têgeha (Metaphor) heye û di ferhenga Oksford de wiha tê pênasekirin: “Bêjeyek an derbirînek e ku bi şêwazek xeyalî ji bo mebesta wesifkirina kesekê an tiştêkê tê bikaranîn. Ji bo ku du kes yan du tiştên ku ji aliyê wesf û taybetmendiyan ve nêzîk hev in, pîşan bide û bi riya kes û tiştêkî ve, kes an tiştêk din ji aliyê sifet û taybetmendiyan ve bihêz bike.”¹⁸⁴ Wek li jorê jî me bas kiriye, hunera sparde hunera serekî hunera xazeyê ye. Çünke; “Sparde beşek e li beşên rûnbêjiyê û ji lêmanendeyê bihêztir û rewantir e. Lê belê ew jî di nav çarçoweya lêmanendeyê de tewdigere, lê belê di vir de li gor wê rewan û bêlêliya xwe dernakeve. Ta ku mirov lê hûr nebe hest nake ku lêçûyek jî di wir de heye û lê diyar nîn e. Eger ji aliyê sîmantîk (watasazî) ve sparde û lêmanendeyê bidin ber hev, emê bibînin ku lêmanende here zêde ji bo aşkirakirin û rûnkirinê tê bikaranîn ku di derbirînen zîhnî de di rola wesifkirina babetê de ye. Bes sparde zêdetir ji bo ku derbirîn bi şêweyek bihêztir û qewîtir bandorê li guhadaran bike, tê bikaranîn. Di vî warî de ji lêmanendeyê bihêztir e.”¹⁸⁵

Sparde cureyekî din ê mecazê ye û, “Sparde yanî bêjeyek ji ber hebûna peywendiyên lêkçûna wataya rasteqîn û wataya mecazî li gel yektir de, li derveyî wataya xwe a ferhengî bête bikaranîn. Her wiha (îstîare) her (teşbîh) e, lê bel di spardeyê de تنها (muşebeb) dimîne.”¹⁸⁶ Îdrîs Ebdûlla dibêje: “Sparde yanî bikaranîna bêjeyekê ji cihê bêjeyek din. Ji ber ku peywendiyê lêkçûn di navbera van bêjeyane de heye. Qerîneyek jî heye rêgirî li bêjeyê dîke ku ji bo wataya xwe a rasteqîn neyete bikaranîn.”¹⁸⁷ Ebdul El-Qadir Circanî dibêje: “Sparde ewe ye ku

¹⁸³ Yusif Ebû el-‘Enus, *el-Teşbiye ve el-Îstî'are*, Çapa 1., Zanîngeha el-Yermûk, Uman, 2007/1427-h., 139.

¹⁸⁴ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şiîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 113.

¹⁸⁵ Newzad Ehmed Usman, *Rûnbêjî le Şiîrî Klasîkî Kurdîda, Be Nimûne Melay Cizîrî û Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkîrî), Zanîngeha Selahedîn, 1991, 96.

¹⁸⁶ Ebdulhuseyîn Naşîr Hesam el-‘Ulma’î Eql Ewel, *Der el-Edeb der Feni Me’anî, Beyan, Bedî’*, Çapa 3., Çapxaneya Şîrket Samî, 1340-Ş., 162.

¹⁸⁷ Îdrîs Ebdula, *Kowanekanî Rewanbêjî*, Çapa 1., Hewlêr, 2014, 166.

watayakê biçespînî hinde sade nebe ku guhdar bi asanî jê têbigihe, ta ku bêjeyê ji aliyê wata ve şîrove û rave neke.”¹⁸⁸

Her wiha di cihek din de wiha pênaseya spardeyê tê kirin: “Sparde di ziman de daxwazkirina tişteke ye ji bo demek diyarkirî, bê beramber bikarbînî, bi şertekê careke din wegere ser wataya xwe a rasteqîn.”¹⁸⁹ Zanayak din ê bi navê Dîmirsiye wiha qala hunera sparde dike: “Rewanbêjî bi lasayîkirina spardeyê tê danandin. Di navbera wêneyên rewanbêjiyê de û bi pê diyarkirina çend wêneyekî em dikarin watayekê bidin bêjeyekê ku di rastî de watayê wê nîn e. Sparde wêneyek e, ku taybetmendiya tişteke wediguhêze bo tişteke din û her wiha dibe ev wegühestine di gel wî wêneyî ku ji aliyê lêkçûnê ve tenha di hizir de heye, biguncê.”¹⁹⁰

Wek me li jorê jî bas kiriye, sparde hunerek din a girîng a rewanbêjiyê ye ku Ehmed Muxtar Begê helbestvan di afirandina wêneyên helbestên xwe de girîngiyek mezin pê daye. Ev hunere ji hunerên din kurt û puxttur e û bandora wê a hunerî jî gelectir e, çünke di vê hunerê de manende û lêmanende yeklayî dibin û di navbera wan de hîç ciyawaziyek namîne. Bi vî awayî ew sifetê ku di manendeê de heye binirxtir dibe û derdikeve asta sifetê hunera lêmanendeyê. Erîsto jî di derbarê hunera sparde de dibêje: “Sparde, wegühestina navê tişteke ye ji bo tişteke din, ku an ji regezê bo cur, an ji cur bo regez; an ji cur bo cur, an bi pê spardeya nimandinê bedî dibe.”¹⁹¹ Eladîn Secadî di warê spardeyê de dibêje: “Pênaseya spardeyê eve ye; bêjeyek ji bo tişteke tê bikaranîn, ku ew tişte manendeye bi rewşê ve. Reseniya bêjeyê ji ber peywendiya lêkçûnê ye.”¹⁹²

Her di derbareyê vê têgeha girîng de, tenha di çêweya wêje û helbestê de lêkolîn li ser nehatiye kirin, belku zanist û warên din jî lêkolîn li ser kirine. Bekir Umer Elî di teza xwe a doktorayê de, ku li ser ziman û zanista ziman e, bi hûr û kûr lêkolîn li ser vê hunerê kiriye û dibêje: “Metafor curek e li zanist, çünke di rastî de ev boçûna giştgîr rast nîn e, ku qaşo metafor tenha ciwankarî, zewqdan û xemilandin e,

¹⁸⁸ Mihemed Hiseyîn Elî el-Sexîr, *el-Sure el-Feniye fi el-Mesel el-Quran*, Çapxaneya el-Reşîd, Bexdad, 1981, 199.

¹⁸⁹ Mes’ud Yasîn Çelkî, *Rolê Hunerên Rûnbêjiyê di Çêkirina Wêneyê Hozanê Kurdîda*, Hewlêr, 2012, 89.

¹⁹⁰ Helac Silîba, *el-Îstî’are ve el-Mecaz el-Mursel*, Çapa 1., Beyrût, 1988, 31.-32.

¹⁹¹ Erîsto, *Fenî Şîr*, 58.

¹⁹² Eledîn Secadî, *Xoşxwanî (Guzarekar-Rewankarî-Ciwankarî)*, Çapxaneya Me’arif, Bexdad, 1978, 64.

belku têgihîştin û lêhûrbûna diyardeyên nihêniye.”¹⁹³ Di çavkaniyek din de jî wiha tê nivîsîn: “Gelek ji wan derbirînên nasik, ji metaforê serçave werdigirin û di heman demê de ji bo me guhdarî hişyar dike û bandor li wî dike. Boye karek di cih de ye ku em her tim dirûvê bêjeyên xwe biguherin û naveroka derdirînên xwe ji watayên hemîşeyî wala bikin û wan bi watayên nû pir bikin. Tenanet girîngî û nixê rasteqîn ê ziman jî jêhatîbûna aliyê wî ê derbirîne ye, nek aliyê ferhengî.”¹⁹⁴

Her di warê hunera sparde de Ebdul Selam Salar jî di teza xwe doktorayê de wiha dibêje: “Sparde asoya bilind a rewanbêjî û nîşaneyê dahênanê ye û hunerek e ji hunerên din ê gotin û zimanê naaramî û gurbûna derûnê ye. Çunke alîkarê mirov e, ji bo ku di astek bilin de wê helwesta xwe a tund ku bi şêweyekî hûr û kûr raçandiye, derbibire. Hinek ji lêkolerên havçerx wê bi mezintirîn qonaxê hunera xazeyê dihesibînin, çunke bi bêjeyên kêr watayek gelek radigihîne. Wek çiçek dara fêqî dehan mîwe ji te re dibexşe yan wek masiyê ye dehan morî tê de ne.”¹⁹⁵ Ezîz Gerdî jî dibêje: “Sparde yanî bêjeyek ji bilî wataya xwe a rasteqîn, ji bo derbirîna watayek din bête bikaranîn. Bi şertekê, peywendiya di navbera watayên bêjeyê ên dirust û xazeyî de lêkçûn bin. Dibe nîşaneyek jî hebe ku mebesta me ye û ev bêjeyê a hatiye daxwazkirin e, nek a rasteqîn e.”¹⁹⁶

Di warê rewanbêjî û hunera sparde de, lêkolînên nûjen hatine kirin û yek ji vane jî Ferhad Qadir Kerîm e, ku di teza xwe a doktorayê de wiha qala hunera sparde dike: “Hunera sparde berhema berfireh a endêşe an zêhna mirov e û di berawirdkirina li gellêmanendeyê de derdikeve ku di aliyê peydabûnê de qonaxekî pêşkevîtîr ê mirovayetiye ye û di dewlemendkirina ziman û firavankirina asoya derbirînan de rolek gelek girîng dilîze. Ew yeke jî wê dike pêwîstiyek zarûrî ji bo dahênanê helbestê.”¹⁹⁷ Di lêkolînek din de Seîd Farûq dibêje: “Eger lêmanende pişt bi du binemayan bibeste, sparde tenha li ser yek binemayê radiweste an disaze. Her çend e wek cureyek lêmanendeyê jî bête hesibandin. Lê belê bi labirina wan zar û

¹⁹³ Bekir Umer Elî Me’arif, *Mîtafor le Ruwangey Zimanewaniyewe*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Silêmanî, 2000, 18.

¹⁹⁴ h.ç., 18.

¹⁹⁵ Ebdul Selam Salar Ebdulrehman, *Wênayê Hunerî le Şîrî Şêx Nûrî Şêx Salih da*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Weşandin), Zanîngeha Silêmanî, 2006, 108.

¹⁹⁶ Ezîz Gerdî, *Rûnbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Silêmanî, 69.

¹⁹⁷ Ferhad Kerîm Qadir, *Binyatî Wêne le Şîrî Hemdîda*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Weşandin), Zanîngeha Silêmanî, 2009, 134.

aliyên lêmanende ên spardeyê, ku di rastî de hemû ev hewlene ji bo ku di xeyal de wisa bê danandin, tên kirin û di encamê de xwastraw li gel lêxwastraw de yeksan dibe yan her rêk xwedî xwe ye.”¹⁹⁸

Di vir de derdikeve hunera spardeyê erkek din heye, ku bi mercê tişt cihê hev bigirin wan li cihê hev dadine an wan alûgor dike. Ew merce jî li ser du tistan rawestaye. Yekemîn, di dema têkelkirin û alûgorkirinê de dirûvek helbestiyane bibexşe. Duyemîn, jîriya xwîner û guhdar hebe ku bikarin di her du aliyan de alûgorkirinê destnîşan bikin. Her di wir de jî hatiye ku helbest cureyek e ji spardeyê.”¹⁹⁹ Her di derbarê spardeyê de Ebû Hîlal El-‘Isrî dibêje: “Di ziman de, bêjeyek li ber mebestekê, ji cihê xwe ê bineretî tê weguhestin û di cihek din de tê bikaranî.”²⁰⁰ Di pênaseyek din de ji bo spardeyê tê gotin: “Sparde ji bilî manendinek kurt tiştekin din nîn e, lê belê ji manendinê bihêztir e. Di vê pênaseyê de tiştta ku li ser bê rawestan, bêjeya bihêz e. Em di vir de dikarin bipirsin, çi ciyawazî ye wisa kiriye ta ku spardeyê ji manendinê bihêztir bike? Ji bo bersiva vê pirsê çend ciyawaziyek kurt û rûn tên dîtin, ji vana hatina yek ji her du aliyên manendinê ye. Ev yeke jî li gor manendinê dirûvek helbestî dide spardeyê. Her wiha lêkolînkirin û lêhûrbûna xwînerî an hebûna cureyek aloziyê ku dibe di spardeyê de neyê dîtin; çunke pêwîst e xwîner li pey aliyê din bigere, ku ev lêgerîne di manendinê de nayê dîtin. Çunke her du alî bi şêweyek rastewxo hatine.”²⁰¹

Di wan pênaseyên jorê de em dibînin ku tenha di wêjeyê de li ser vê hunerê lêkolîn nehatiye kirin û girîngî pê nehatiye dan, belku di warê ziman û zanista ziman de jî, ji aliyê zimannasan ve xwediyê biha û nirxek mezin e, çunke ev hunere di peydakirina bêjeyên nû, bi watayên nû û di nav bêjeyên kevn de peydakirina watayên nû de xwediyê rola gelek girîng e. Ev hunere bi vê rola xwe bêjeyên kevn ji nû ve zindî dike û wan bi wata û erkên nû dubare li ser ta pa dixemilîne û wan ji dirûv, rol û watayên neguherbar rizgar dike.

¹⁹⁸ Seîd Farûq Yusif Şêx Bizînî, *Binyatî Hunerî le Şîrî Ehmed Muxtar Begî Cafda*, Hewlêr, 2011, 176.

¹⁹⁹ h.ç., 176.

²⁰⁰ Ebû Hîlal ‘Isrî, *Kitab-i el-Sina’etîn*, 204.

²⁰¹ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 116.

Di encama van zanyariyane de em dibêjin sparde, wate bêjeyek ji rastiya xwe dûr dikeve û dikeve dirûvek din de û rolek din dilîze ku di rastî de rola wê nîn e. Her wiha ji bo ku bêje di wata û rola xwe a rasteqîn de dernekeve û rêgirî ji vê yekê bike, qerîneyek tê bikaranîn. Her wiha hunera sparde li ser bingeha lêkçûnê ava dibe. Eger behsa yek ji binemayên manendinê neyê kirin, wê gavê ev hunere ji manendinê dûr dikeve û sparde dirust dibe. Bi riya wan pênaseyên li jorê em êdî dizanin ka emê çawa spardeyê ji manendinê cihê bikin. Li gor wan pênaseyên jorê dîsa bo me derdikeve ku sparde yek ji hunera here girîng û binirx a rewanbêjî û rûnbêjîyê ye û ji dil û hinavên manendinê derketiye û manendinek kurt û puxt e, ji ber ku yek ji aliyên manendinê di vir de dernakeve. Her wiha bikarneanîna vê hunera binirx a rûnbêjîyê di helbesta kevn û nûjen de gelek kem e.

Ehmed Muxtar Beg jî yek ji wan helbestvanan e, ku di helbestên xwe de ev hunere bi kar aniye, sûd jê wergirtiye û ji me re wêneyên ciwan û bitam afirandine, wek dibêje:

“Fustanî reşî nazikî çîn çînî leberda,

Wek hewrî siya bê be serî qursî qemerda” r. 52.

Helbestvanî di vir de hunera sparde sazandiye, wêneyê spardeyê di vê beytê de heye, ku ew jî (qursî qemer-girana hiya heyvê) ye û ji bo xwastraw e û diyar e, lê xwastraw bixwe ku (dem û çav)ên yarê ne, diyar nîn in û nehatiye baskirin, boye em dikarin bibêjin, (sparde) e.

2/Pêkhatyên Sparde:

Wek çawa me di beşa yekemîn de pêkhatyên manendinê rave û pênasekirin, bi heman awayî emê ciyawaziyên spardeyê jî rave û pênase bikin, ku ji çar binemayan pêk tê:

Yekemîn/

Boxwastraw (El-Îstî'are le) di manendinê de hemberê manendeyê ye.

Duyemîn/

Lêxwastraw (El-Îstî'are mine) di manendinê de hemberê lêmanendeyê ye.

Sêyemîn/

Xwastraw (El-Îstî'ar) di manendinê de hemberê hêla manendeyê ye. Wate sifet an tišta xwastraw e ku helbestvan dixaze ji bo tişteke din bixaze, êdî behsa bike yan neke peyvira spardeyê naguhere.

Çaremîn/

“Nîşaneyê sparde-qerîne El-Îstî'are- eve jî nîşaneyê bêjeya guzare ye ku dixaze rê li wataya rasteqîn a bêjeyê bigire ku mebesta me nîn e.”²⁰² “Nîşaneyekî bêjeyî an watayî ye û ev nîşaneyê jî di hunera spardeyê de rêgirî li mebesta dirust a bêjeya ku tê bikaranîn, lêxwastraw, dike.”²⁰³

Bo nimûne helbestvan Ehmed Muxtar Beg di wê beyta jêrê de her çar binemayên spardeyê bi kar anîne. Helbete merc nîn e her çar binema bi şeweyek rûn û aşkira derkevin, lê belê li ser xwîner erk e ku amaje pê bide.

“Meylî seyri bedr eka dil, lade zulfî wek hîcab,

Derxe bedrî rûmetî xot şoxekey ‘alî cenab” r. 61.

Helbestvan di vê beytê de bi mebesta rûyê yarê bêjeya (bedr) bi kar aniye û hunera spardeyê bedî kiriye. Di vê beytê de çend bêjeyek din hatine, ku alîkariya me dikin ta ku em bibêjin ev bêjeye ji bo mebesta xwe bi kar nehatiye. Ew jî bêjeyên (zulf/bisk û hîcab/desmal) in ku dûr û nêzik hîc peywendiyek wan bi heyva (bedr)ê ve nîn e. Belku mebesta wan yar an (me’şûq) e, ku dixwazin wê ji aliyê ciwanî û bedewiyê ve bi (bedr)ê biçiwênin, wek:

Rûmetî yar....boxwastraw e, Bedir....bolêxwastraw e. ciwanî û ronahiya hatiye bexşîn.

Yar....xwastraw, Zulf û hîcab..... nîşaneyê sparde e.

Helbestvan her di wêneyek din de dibêje:

“Xwa key bêt ke min peştanî bala û qametî to bim,

Çi wextê pir be çing bigrim du lîmoy newresî kalit”

²⁰² Rokan Goril Ş’îya, *Hunerekani Rewanbêji le Şîiri Folklori Kurdîda*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Weşandin), Silêmanî, 2014, 46.

²⁰³ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêji le Şîiri Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 121.

Di vê beytê de helbestvanî bi mebesta singê yarê, pêkhateya (du lîmo/du lîmon) bi kar aniye û bi awayî hunera sparde sazandiye. Her di vir de jî çend bêjeyek hatine alîkariya me dikin û dibêjin ev bêjeye bi mebest an bi wataya xwe a dirust nehatiye bikaranîn. Ew jî bêjeya (çing/çeng) ku nîşaneya sparde û bêjeya (kal/rengê vekirî) ku xwastraw e û peywendiya wan bi memikên yarê heye û xwastiye bişibîne (du lîmo) wek li jêrê jî hatiye arastekirin:

Singî yar-memik....boxwastraw e, Du lîmo....lêxwastraw e.

Xir(gilover)ya kal negihîştî....xwastraw e, Çing..... nîşaneya sparde e.

BehsaSêyemîn:

Cureyên Spardeyê di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de:

Yekemîn/

Li gor her du aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):

Duyemîn/

Li Gor Bêjeyên Xwazraw:

Yekemîn/

LiGor Her Du Aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):

Ev cureye dibe du beş:

1/ Li Gor Hatin û Nehatina Her Du Aliyan:

2/ Li Gor Hestî û Jîriya Her Du Aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):

1/ Li Gor Hatin û Nehatina Her Du Aliyan:

Wek me li jorê jî qala hunera spardeyê kir, ciyawaziya di navbera sparde û manendinê de eve ye; eger di manendinê de her du aliyên serekî (manende-lêmanende) derkevin, di spardeyê de yek ji van her duyane derdikeve ku an boxwastraw e, an lêxwastraw e. Ji ber vê yekê di dabeşkirina cureyên spardeyê de me hatin û nehatina van her du aliyan anî pêşiyê, ku ew jî ev in:

A/ Spardeya Vekirî (el-Îstî'are el-Tesrîhe),

B/ Spardeya Veşartî (el-Îstî'are el-Mukniye)

A/ Spardeya Vekirî (el-Îstî'are el-Tesrîhe):

Yek ji cureyên spardeyê a girîng û berbiçav e û tenha aliyê lêxwastrawtê de derdikeve û wiha tê pênasekirin: “Ev spardeye ye ku lêmanende derdikeve, lê manende dernakeve.”²⁰⁴ Ji ber vê yekê jê re spardeya aşkira tê gotin. Çünke bêjeyê bi aşkirayî dixaze. Gelek ji çavkaniyên rewanbêjîyê di pênasekirina spardeyavekirî bigire heta hemû pênaseyên din ên peywest in bi spardeyê naçarî binemayên serekî ên hunera manendin nebûn. Ev yeke jî ji bo vê yekê diçe ku sparde di rastî de bermayeyê manendinê ye û ji vê xuliqiyê. Di spardeyê de li hember têgehên manende û lêmanende, têgehên boxwastraw û lêxwastraw tên bikaranîn. Wek di vê beytê de Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Be serî to qesem ey Yusifî Ken'anî min,

Lêwî şîrînte tûtiy şekerî efşarî min” r. 101.

Yar...boxwastraw e (derneketiyê), Yusifî Ken'an...lêxwastraw e (derketiyê).

Ciwanî...xwastraw e, Yarî min...nîşaneyê spardeyê.

Helbestvanî di beyta jorê de çend wêneyek bi hev re dirust kirine, ku (yar) wek (Yusifê Kenan) teswîr kiriye û ciwanî, ronahî û bexşendebûna Yusifî ji bo yar bi kar aniyê. Evîndar di vir de ji bo yara xwe sûnd dixwe û jê re dibêje, tu ji bo min hemû tiştêk î. Wate ciwan î, ronak î, bexşende yî. Di vir de mebesta me (Yusifê Kenan) e ku spardeyavekirî di vê bêjeyê de ye; (yar) ku (boxwastraw) e, dernaketiyê û bi (Yusifê Kenan) hatiye manendin ku lêxwastraw e û derketiyê. Nîşaneyê spardeyê jî pêkhatiya (yarî min) e. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Labe tu Xwa pirtewî şem' û çira,

Çünke em şew hate meclîs mahakey tabanî min” r. 102.

²⁰⁴ Ehmed el-Metlub – Kamil Hesên El-Besîr, *el-Belaxe ve el-Tedbîq, Wezaretê Xwandina Bilind*, Çapa 1., 1982, 350.

Yar...boxwastraw e (derneketiye), Mah...lêxwastraw e (derketiye).

Şem', çira û ciwanî rûnakî...xwastraw e, Hate meclîs (yar)...nîşaneyê sparde e.

Di vê beytê de helbestvanî ji me re hunera sparde bi riya bêjeya (mah-heyv) sazandiyê ku bi wataya xwe a rasteqîn nehatiye bikaranîn û mebesta wî (yar-dîlber) e û lê derneketiye, boye boxwastraw e. Ev yeke jî li ber wan bêjeyên ku di beytê de hatine, wek (şem'/mum, çira) an (hate meclîs) derketiye holê. Wate di vê beytê de (dîlber) derneketiye û helbestvanî ew çiwandiyê bi (heyv)ê, ku lêxwastraw e û derketiye. Her wiha ciwanî û ronahiya mum û çira rûyê dîlberê ye û xwastraw e, hatina yarê bo meclîsê, nîşane ye ji bo spardeyê.

Ev cure spardeye dabeş dibe bo ser sê cureyên din, wek:

1/ Spardeya Rêk,

2/ Spardeya Hewdij,

3/ Cureyên Spardeya Vekirî li gor Cureyê Bêjeya Xwastraw

1/ Spardeya Rêk (el-Îstî'are el-Vefaqiye):

Di hin çavkaniyan de Spardeya Guncav jî jê re tê gotin; "Hemû spardeya li xwe digire ku her du alî li gel hev biguncên."²⁰⁵ Di vir de dema sifet an taybetmendiya tiştekê ji bo tiştek din tê bikaranîn, dibe di navbera wan de guncavbûn hebe, ji bo ku di sazandina hunera spardeyê de watayên manendinên wan du tiştan ji hev dûr nebin. Bo nimûne mirin û nivistin, nexwandewarî û tarîti...hwd. Di vî warî de Ehmed Muxtar Caf dibêje:

"Labe tu Xwa pirtewî şem' û çira,

Çunke em şew hate meclîs mahakey tabanî min" r. 102.

Yar...boxwastraw e (derneketiye), Mah...lêxwastraw e (derketiye).

Çira, Şem' û ciwanî rûnakî...xwastraw e, Hate meclîs (yar)...nîşaneyê sparde e.

²⁰⁵ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., 76.

Di vê beytê de helbestvanî ji me re hunera sparde bi riya bêjeya (mah-heyv) sazandiyê ku bi wataya xwe a rasteqîn nehatiye bikaranîn û mebesta wî (yar-dîlber) e û lê derneketiyê, boye boxwastraw e. Ev yeke jî li ber wan bêjeyên ku di beytê de hatine, wek (şem'/mum, çira) an (hate meclîs) derketiyê holê. Wate di vê beytê de (dîlber) derneketiyê û helbestvanî ew çiwandiyê bi (heyv)ê, ku lêxwastraw e û derketiyê. Her wiha ciwanî û ronahiya mum û çira rûyê dîlberê ye û xwastraw e, hatina yarê bo meclîsê, nîşane ye ji bo spardeyê. Di vê beytê de spardeya rêk hatiye dirustkirin, çunke her du aliyên spardeyê li gel hev diguncên. Heyv û dîlber her ji zû de li cem helbestvanan hebûye û li gel hev jî diguncên.

2/ Spardeya Hewdij (el-Îstî'are el-Tecadiye):

Ev spardeye wek spardeya neguncav jî tê binavkirin, “Dibe ku her du aliyên spardeyê bi hev re bicivin, çunke dijî hev in; wek ronahî û tarîfî, tal û şîrînî, germ û serma...)”²⁰⁶ Dibe ku di dema anîna sifetê tiştêkê ji bo tiştêkî din de gelek taybetmendî hebin ji bo lihevnişîkbûna boxwastraw û lêxwastraw ku manendinên wan le gel hev naguncên û ji hev dûr in. Bo nimûne Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Be serî to qesem ey Yusifî Ken'anî min,

Lêwî şîrînte tûtiy şekerî efşarî min” r. 101.

Yar...boxwastraw e (derneketiyê), Yusifî Ken'an...lêxwastraw e (derketiyê).

Ciwanî...xwastraw e, Yarî min...nîşaneyê sparde e.

Helbestvanî di beyta jorê de çend wêneyek bi hev re dirust kirine, ku (yar) wek (Yusifê Kenan) teswîr kiriye û ciwanî, ronahî û bexşendebûna Yusifî ji bo yar bi kar aniyê. Evîndar di vir de ji bo yara xwe sînd dixwe û jê re dibêje, tu ji bo min hemû tiştêk î. Wate ciwan î, ronak î, bexşende yî. Di vir de mebesta me (Yusifê Kenan) e ku spardeyavekirî di vê bêjeyê de ye; (yar) ku (boxwastraw) e, derneketiyê û bi (Yusifê Kenan) hatiye manandin ku lêxwastraw e û derketiyê. Nîşaneyê spardeyê jî pêkhatiya (yarî min/yara min) e. Ev spardeye hevdiya e, çunke ji bilî ciwanîyê ku di di vê spardeyê de hevbeş in, hevdiya jî heye wek, nêr (Yusifê Ke'an) û mê (dîlber)yî.

²⁰⁶ h.ç., 77.

3/ Cureyên Spardeya Vekirî li gor Cureyên Bêjeya Xwastraw:

A/ Spardeya Vekirî a Giştî (el-Îstî'are el-Tesrîhe el-'Ame):

B/ Spardeya Vekirî a Taybet (el-Îstî'are el-Tesrîhe el-Xase):

A/ Spardeya Vekirî a Giştî (el-Îstî'are el-Tesrîhe el-'Ame):

“Ew spardeye pêwîst nabîne, ji bo bîrkirin û ravekirinê li pey bêjeya xwastraw bikeve, çunke bêjeya hevbeş a di navbera boxwastraw û lêxwastraw de aşkîra ye û di ziman de ewqas li hev nizîk in, di nav hev de çûne, êdî pêwîst li peyketinê nîn e.”²⁰⁷ Em dikarin bibêjin di vê spardeyê de tiştên xwastraw heman wêne ne ku di gelek helbest û wêneyên hunerî ên din de dubare dibin. Ehmed Muxtar Caf di beytek din de dibêje:

“Labe tu Xwa pirtewî şem’ û çira,

Çunke em şew hate meclîs mahakey tabanî min” r. 102.

Yar...boxwastraw e (derneketiye), Mah...lêxwastraw e (derketiye).

Çira, Şem’ û ciwanî rûnakî...xwastraw e, Hate meclîs (yar)...nîşaneyê sparde e.

Di vê beytê de helbestvanî ji me re hunera sparde bi riya bêjeya (mah-heyv) sazandîye ku bi wataya xwe a rasteqîn nehatiye bikaranîn û mebesta wî (yar-dîlber) e û lê derneketiye, boye boxwastraw e. Ev yeke jî li ber wan bêjeyên ku di beytê de hatine, wek (şem’/mum, çira) an (hate meclîs) derketiye holê. Wate di vê beytê de (dîlber) derneketiye û helbestvanî ew çiwandîye bi (heyv)ê, ku lêxwastraw e û derketiye. Her wiha ciwanî û ronahiya mum û çira rûyê dîlberê ye û xwastraw e, hatina yarê bo meclîsê, nîşane ye ji bo spardeyê. Spardeya aşkîra a giştî wek huner mijarek giştîgîr e di wêjeya cîhan, rojhelat û kurdî de. Bi watayek din di vê spardeyêde ji bo peydakirina bêjeya xwastraw, pêwîst bi lêhûrbûnê nîn e. Bêjeya hevbeş a di navbera boxwastraw û lêxwastraw aşkîra ne û bêyî ku em lê hûr bibin, tên diyarkirin.

²⁰⁷ Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rûnbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Teya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade, Wêney Rûnbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Teya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 213.

B/ Spardeya Vekirî a Taybet (el-Îstî'are el-Tesrîhe el-Xase):

“Ev cure ye ku aliyê ‘hevbeş’ wate xwastraw tê tîrkin û tenha kesên di vî warî de xwediyê zanyariyanin, dikarin têbigihin. Yanî aliyên hevbeş veşartiyî ne û tenha kesên di vî warî de behremend in, dizanin. Hemû kes nikare ta ku kesên xwedî behre û jêhatî nebin.”²⁰⁸ Di vê hunerê de peydakirina xwastraw karek asan nîn e. Ji bo vê yekê dibe mirov xwediyê bingeh û şarezayiyek mezin be. Bo nimûne eger em bixwazin li cem Ehmed Muxtar Caf spardeyek wisa peyda bikin, dibe em çavkanî û bingehên zanabûna wî bizanin ku ji çend cureyên zanist, siyaset, dildarî, dîrok... hwd. pêk tên, ku di wê serdemê de bandor lê kirine. Boye karkirin di vê hunerê de asan nîn e. Ehmed Muxtar Caf di nimûyek din de dibêje:

“Ewende gewher le du çawim ebarênim le hîcrana,

Nîgar dawênî min emro weku deryayî ‘Ummane’ r. 139.

Firmêsk (rondik)...boxwastraw e, Gewher...lêxwastraw e,

Qîmeta gewherê...xwastraw e, du çawim...nîşaneya sparde e.

Ji bo têgihîştina vî cureyê spardeyê, dibe xwîner xwediyê keşkol an bingehê baş be û di warê helbestê de gelek xwan dibe, ta ku bizane bi gewherê mebest rondik in, çune gelek car didan jî bi gewherê hatiye manandin. Boye di vir de mebesta helbestvanî rondik in, ji ber kû rondik li cem wî pir bi nirx in. Ji ber wê hindê, ji bo vê yekê me pêwîstî bi zanîn, behre û jêhatîbûnê heye ta ku em bizanin ji ber dûrî û hesreta yar, dildarî ji bo dilbera xwe gelek rondik rijandine ku dibêje; hindî ez giryame, damenên min wek deryaya Ummanê lê hatine. Ava deryaya Ummanê gelek e û gelek jî şor e.

B/ Spardeya Girtî (el-Îstî'are el-Mukaniye):

Di pênasekirina spardeyavekirî de me gotibû, ew sparde ye ku di wir de lêmanende derkeve, manende dernekeve. Eger em vê pênaseyê berewajî bikin, spardeyagirtî dirust dibe. Bi watayek din di vê spardeyê de manende derdikeve, lêmanende dernakeve. Spardeyagirtî, “Ew cure ye, ku lêxwastraw tê de derneketiye. Ji bo xwastrawê yek ji xasîyet an taybetmendiyên wê hatiye derdirîn. Wate, ev

²⁰⁸ h.ç., 314.

spardeye wiha dadimezrê; taybetmendiyekê ji bo xwastrawê werdigire û dibe lêxwastraw. Boye bi dirkaw tê nasîn, ji ber ku jê re dirkadinek hatiye kirin ji bo lêxwastrawê, ji ber taybetmendî an xasiyetekê. Her wiha wek spardeyanixman jî tê binavkirin.”²⁰⁹ Her wiha spardeya veşartî li cem Ehmed Muxtar Caf bi şêweyek aşkîra tê dîtîn, wek dibêje:

“Bêstûn êsteş ke weqtê laleyî lê sewz ebê,

Behsa xwênî dîd û behsa dilî Ferhad eka” r. 54.

Bêstûn...boxwastraw e, Mirov...lêxwastraw (derneketiye) e,

Bêstûn dipeyive...xwastraw e, wek mirovan dipeyive.

Helbestvanî di vê beytê de ji me re hunera spardeya veşartî sazandiye. Helbestvanî çiyayê Bêstûn wek mirov peyivandiye, ku di rastî de nikare bipeyive, boye çiyayê Bêstûn di vir de ji bo mirov e û xwastraw e. Di vê beytê de mirov lêxwastraw e û derneketiye; çiyayê Bêstûn jî boxwastraw e û derketiye, tenanet rûn û aşkîra diyar e.

2/ Li Gor Hestî û Jîriya Her Du Aliyan (Boxwastraw-Lêxwastraw):

Di beşa manendîne de me çawan her du aliyên wê ên hestî û jîrî destnîşan kirin, di spardeyê de jî em dê destnîşan bikin. Ciyawaziya di navbera her duyan de tenha eve ye; di manendîne de her du alî derdikevin, lê belê di spardeyê de tenha yek alî derdikeve, ku an boxwastraw e, an lêxwastraw e. Di spardeyê de jî çar cure ne, lê di helbestên Ehmed Muxtar Caf de tenha yek cure tê dîtîn. Çünke helbestvan li bajarê Helebceyê jiyaye ku navçeyek pir e li şînkahî, dar, gil û giya û hewayekî xweş. Boye ji bomînanîne taybetmendiyên mirov bi kar anîne û bi vî awayî hunera hestî bi hestî sazandiye.

²⁰⁹ h.ç., 216.

Her Du Alî Hestî Bin (el-Îstî'are Mehsûs el-Mehsûs):

Di vê spardeyê de her di alî hestî ne û em an bi riya hestan, an jî bi riya beryekkevîne ji wan agahdar dibin. “Asayî ye eger xwastraw hestî be yan jîrî be, lê belê zêdetir hestî dibe”²¹⁰ Wek helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Milî keçkird wewêşe, kewte ber pêt wek qebahetbar,

Ke derkewt xalî lêwit têgeyî şet û xetabare” r. 113.

Wewêşe...boxwastraw e (hestî), Mirov...lêxwastraw (derneketiye-hestî) e,

Milî keçkird...xwastraw e, wek mirov e ji bo wewêşe.

Helbestvanî di vê beytê de ji me re hunera spardeya girtî a hestî bi hestî dirust kiriye. Diltengiya mirovî/ê xwastiye bo binevşê ku (mirov) hestî ye, lêxwastraw e, û derneketiye. (Binevş) hestî ye boxwastraw e. Helbestvan dema qala binevşê dike dibêje binevş têgihîşt ku wê xeta kiriye, tawanbar û gunehkar e, boye gawa dîlbera wî diyar bû, binevş kete ber piyê yarê wek tiştê tawanbar, gunehkar û xirapkar wê stûyê xwe xwar kir. (Milî keçkird-stû xwarkirin) xwastraw e ji mirov ve bo binevşê. Helbestvan di beytek din de dibêje:

“Nexoş kewt nêrgisî bêçare bo ew çawe bîmare,

Qedî nûştayewe ‘er ‘er ke dî balayî ew yare” r. 113.

‘Er ‘er...boxwastraw e (hestî), Mirov...lêxwastraw (derneketiye-hestî) e,

Nûştayewe qedî...xwastraw e, ji mirov ve bo ‘er ‘er hatiye.

Her di vê beytê de jî helbestvanî spardeyagirtî a hestî bi hestî sazandiye û (‘er ‘er) boxwastraw e, derketiye û hestî ye, (mirov) lêxwastraw e, derneketiye û hestî ye. Helbestvan dibêje dema dara ‘er ‘erê bejn û bala yarê a ciwan û rêk dît ji xwe şerim kir û bejna xwe ji ber yarê tewand. Nuştina qed an tewandina bejnê xwastraw e û ji mirov ve hatiye bo ‘er ‘er. Di vê beytê de jî dîsan helbestvan dibêje:

“Fîdat bim çon binûsim şerhî husnit,

Le te’rîfî, zûbanî xame lale” r. 145.

Xame...boxwastraw e (hestî), Mirov...lêxwastraw (derneketiye-hestî) e,

²¹⁰ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 137.

Bêdengî û lalbûn...xwastraw e, ji mirov ve bo xame hatiye.

Helbestvanî di vê beytê de spardeyagirtî dirust kiriye, ji bo vê yek jî bêjeya (xame-pênûs) bi kar aniye ku boxwastraw e, hestî ye. Bêjeya xame ji aliyê Nalî, Salim û Mehvî ve her bi heman şêwe hatiye gotin. Di vê beytê de (mirov) lêxwastraw e, hestî ye, derneketiye û ji bo xameyê sifet ji mirov hatiye sparde. Ji ber ku dîlber ewqas ciwan bûye, helbestvanî nekariye wesfê ciwaniya wê bike, boye dibêje, (xame lal) e.

BehsaÇaremîn:

Girîngiya Sparde û Mebestên Wê di Helbestê de:

Di tewrê helbestê de sparde girîngtirîn û cîgirtirîn hunera rewanbêjîyê ye, ji ber vê yekê tenha huner e ku derfetên mezin û meydana berfireh ji helbestvanî re diruxsêne û wisa dike ku helbestvan di nav sînorek diyarkirî de nezivire. Nihênîyên ciwaniya hunera spardeyê du alî ne:

Yekemîn:

“Teknîka neguherbar a spardeyê tê bikaranîna û ev teknîke ji bilî spardeyê hemû taybetmendiyên helbestê diguhere wek; madde, bêje, ziman, kêş, rêbazên bîrekî, lê belê sparde wek rêbazek bingehîn her dimîne.”²¹¹

Duyemîn:

Sifetên tiştên dewrûberên me ên nehatine têkel dike, helbestvan bi vî awayî dikare bi riya tenha yek teknîka spardeyê hezaran wêneyên spardeyê dirust bike. Dibe ev yeke bê zanîn hunera sparde, tenha huner e ku bi du arasteyên ji hev cihê kar dike. Hunera sparde ji aliyekê ve bandorê li ser pêkhateyên ziman dike, wek form; ji aliyekê din ve jî bandorê li ser wataya wan dike. Xawastin, “Pêwajoyek e, di nav ziman de zimanek din diafirîne. Ji ber wan peywendiyên ku di navbera bêjeyan de dirust dike, wisa dike ku ew peywendiyên baw ên di navbera bêjeyan de hene, li nav

²¹¹ h.ç., 157.

bibe û peywendiyên nû dirust bike ku bi peywendiyên pêştir ve neyêne girêdan. Bi vî awayî sparde zêdetir bandorê li hest û derûn dike û nirxekî hunerî ê bala disazêne.”²¹² Ji bilî wan pênase û ravekirinên jorê, em dikarin erk û rolên spardeyê wiha rêz bikin:

Yekemîn:

“Sparde wataya tiştên ku nayên hestkirin û hestên derûnî ji bo tiştên ku têne hestkirin, dîtî û her wiha baw û zindî ne, wediguheze. Ji vê yekê re bercestekirin yan berbiçavkirin tê gotin, ku yek ji erkên spardeyê ye.”²¹³ Wek di vê beyta helbesta Ehmed de derdikeve ku çiyayê Bêstûn di dirûvê mirov de ye û sifetekî mirov jê re aniyê û daye pişt ku axavtine, yanî çiyayê Bêstûn daye axavtin. Lê belê di rastî de çiyayê Bêstûn napeyive û dibêje:

“Bêstûn êsteş ke weqtê laleyî lê sewz ebê,
Behsa xwênî did û behsa dilî Ferhad eka” r. 54.

Duyemîn:

Kurtkirin, eve jî rolek din ê hunera spardeyê ye, bo nimûne em (milî keç kird wewêşê-binevêşê stûyê xwe xwar kir) dibînin. Ev du wêneyene ji aliyê rûxsar ve tenha du bêje ne, lê belê ji aliyê naverok ve gelek watayan ji xwe digirin. Ehmed Muxtar Caf di beytek din de dibêje:

“Milî keçkird wewêşê, kewte ber pêt wek qebahetbar,
Ke derkewt xalî lêwit têgeyî şet û xetabare” r. 113.

Helbestvanî di vê beytê de bi şêweyek dîr û dirêj qala stû xwarkirina binevêşê nekiriye ku di encama derketina yarê û dîtina ciwaniya yarê de rû daye. Bi şêweyek kurt û pirwata hunera spardeyê dirust kiriye û yanî bi riya çend bêjeyekê gelek tişt gotine, ku ev taybetmendiye jî rolek din ê spardeyê ye.

²¹²Zeyn Kamil el-Xuskî-Ehmed Mehmed el-Misrî, *Zo 'î fi el-Belaxe el- 'Erebiye, Dîrasat el-Tetbîqiye Lîl-Behs 'Ulim El-Beyan*, 153.

²¹³ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 158.

Sêyemîn:

“Piroletî an wesifkirina zêde, ji spardeyê ve girêdayî ye an bi mebestên wê ên here girîng ve. Ev taybetmendiyene her çend e, di spardeyê de zêdetir jî bin, lê belê her tim di hemû hunerên rewanbêjîyê de têne dîtin. Ibin Reşîq di vî warî de dibêje: ‘Eger piroletî yanî zêderewî nemîne an rexnelêgirtin, wê gawê manendin û sparde ji holê radibin.’”²¹⁴

BehsaPêncemîn:

Berawirdkirina Sparde û Manendinê:

Gelek rewanbêj û rewanbêjnasan dema hunera sparde û manendinê şîrove kirine an rave kirine, ew ji hev cihê nekirine û manendin wek pêngava yekemîn a hunera spardeyê danîne. Wan her du hunerane hin taybetmendiyên hevbeş û ciyawaz hene ku ji wan xalane pêk tên:

Yekemîn/

Hunera sparde li ser bingeha manendinê dirust bûye.

Duyemîn/

Her du alî li ser proseya manendin û berawirdkirinê dixebitin.

Sêyemîn/

Di proseya manendinê de berawirdkirin zêdetir li pêş e û tenanet xwandekarên asayî jî dikarin proseya manendin û peywendiyên manende û lêmanende destnîşan bikin, lê belê ev proseya di hunera spardeyê de hûr û kûrtir, aloztir, bihêztir û xeftir e. Boye di hunera spardeyê de ji bo peydakirina mebest û peywendiyên pêwîstî bi xwandin, şarezayî, jêhatî û jîrbûnê heye, bi watayek din ji bo ji hev cihêkirina wan peywendiyên ku hunera lêxwastraw û boxwastraw li hev nêzîk diek, pêwîstî bi paşxane û keşkekolek têr û tesel heye.

Çaremîn/

²¹⁴ h.ç., 159.

Di manendin û spardeyê de, ji hev cihêkirina her yek ji form, şêwe an rûkarî wiha ye; di manendinê de pêwîste her du aliyên bineretî an serekî derkevin û her wiha hin caran jî dibe daçekahêla lêmanendeyê derkeve; lê belê di spardeyê de ji her du aliyên tenha yek alî dikare derkeve ku an lêxwasraw e, an boxwastraw e. Ev taybetmendiye jî puxtî, kurtî û ciwanîyê dide hunera spardeyê.

Pêncemîn/

“Sparde û manendin ew her du riyên ji hev cihê ne, ku em dikarin bi riya wan her heman watayan derbibirin.”²¹⁵

Şeşemîn/

Di hunera manendinê de gelek caran hevbeşiya di navbera her du aliyên de tê destnîşankirin, lê belê di hunera spardeyê de hîç wextekê nayê destnîşankirin û wek dirusteyek veşartî dimîne û ev yeke jî wisa dike, ji bilî wan mebestên ku helbestvanî hene, xwîner jî ji aliyê xwe tiştên nû lê bar dike.

Heftemîn/

“Di spardeyê de dibe nîşaneyek hebe, bide zanîn ku mebest wataya xwastraw e, nek wataya rasteqîn, ji vê yekê re qerîne tê gotin, lê di lêmanendeyê de pêwîst bi vê yekê nîn e.”²¹⁶

Heştemîn/

Hemû kes li ser vê yekê hemfikirin, ku sparde ji manendinê bihêztir e, ji ber ku eger manendin ezmûna helbestvanî a destpêkê be, sparde ezmûna qonaxa kemilîna wî ye. Çünke di vê qonaxê de helbestvan yarî li gel bêjeyan dike, watayên nû dirust dike, wêneyên hunerî ên binirx disazêne û ji ber hebûna pêkhate û lewazimên berfireh, sifet û taybestmendiyan tiştan ji bo yektir alugor dike.

Nehemîn/

Di hunera sparde de tiştên têkelkirin û alugorkirin û di cihên bilind de tîndanandin. Yanî di cihê ku dîba ji bo lêxwastrawê hatiba, ji bo boxwastrawê tê, an berewajî.

²¹⁵ Ebdulsalam Salar, “Peybirdin be Ciyawaziy Nêwan Çend Hunerêkî Rewanbêjî”, (Kovara Zanîngeha Silêmaniyê), Beşa (b), Hjm. 12., Kanûna Yekemîn, 2003, 56.

²¹⁶ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebi Kurdîda*, I., 72.

Dehemîn/

Hunera manendin ji bo dirustkirina wêneyên hunerî li cem helbestvanî wek destpêka helbestê ye, lê hunera spardeyê di dirustkirina van wêneyane de, peywendî bi ezmûn û pêgihiştina xeyalên helbestvanî ve heye.

Yanzdemîn/

Erkê hunera manendinê di çêweyek diyarkirî de dizivire, ku tenha manendinek rût e û tiştan ji aliyê hevbeşî ve li hev nêzik dike, tiştan bi riya sifetên tiştekan din ve mezin û ciwan dike. Lê belê hunera spardeyê gelek bihêztir û bandortir e. Bo nimûne tiştan berceste dike, kesîde dike, dilivîne, maddî dike, tiştên rûhî, derûnî, nepenî û nediyar berbiçav dike. Wate sparde rolek bi bandortir dibîne û geşe û pêşdaçûna hizr û mêjîyê helbestvanî ji me re bedî dike.

BEŞA SÊYEMÎN/

NIXMAN(eL-KÎNAYE)

Behsa Yekemîn: Pênaseya Nixman û Binemayên Wê

Behsa Duyemîn: Cureyên Nixman di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de

Behsa Sêyemîn: Girîngiya Nixman û Mebestên Wê di Helbestê de

Behsa Çaremîn: Berawirdî di Navbera Nixman, Xaze û Spardeyê de

Behsa Yekemîn:

Pênaseya Nixman û Binemayên Wê:

Yekemîn:

Pênaseya Nixmanyê

Ev hunere jî wek hunera manendin û xaze ku me li jorê qala wan kiriye, beşek e li zanista rewanbêjî. Hunera nixman hunerek e ku xwediye watayek kûr e, ji bo ravekirin û şîrovekirinê vê hunerê pêwîst e lêkoler, helbestvan an her kesek din ê ku dê li ser wê kar bika an bixaze wê bi kar bîne, dibe xwediye bingehê be ku pir be li zanist, zanyarî, xwandewarî, zimanevanî. Her wiha di vê hunere de cure hunerek watayî û zimanî tê bikaranîn ku ji gelekê ve ji bo gelek din, ji zimanekê ji bo zimanek din, ji serdemekê ji bo serdemek din guheriye. Tenanet eger di nav yek netewe û an di nav yek cografyaya ku sînoren wê hatine diyarkirin de jî be, dîsa guhertin berpa dibe. Ji bo vê hunerê di zimanê kurdî de têgeha (nixman), di zimanê erebî de têgeha (el-kînaye) tê bikaranîn.

Di warê hunera nixman, ku wek hunerek rûnbêjî tê zanîn û wêneyên rûnbêjî disazêne de, pênaseyek hûr û kûr hatiye kirin û tê gotin: “Nixman wêneyek rûnbêjî ye û li ser bingeha peywendiyên di navbera du watayan de hene, dirust dibe. Ev hunere di navbera wataya aşkira a ku têgeh bixwe radigihîne û wataya ku di dema weguhastinê de mebesta helbestvanî ye de peywendî dirust dike, çunke hîç nirxekî aşkerahiya wataya rasteqîn a têgehê bixwe nîn e, ev wataye tenha rêxweşker û

yarmetîder e ji bo watayek din. Ew wataya ku mebesta axatinê ye.”²¹⁷ Di çavkaniyan de gawa qala hunera rewanbêjî û rûnbêjîyê tê kirin, rewanbêjînas û lêkoler û rexnegir li ser hunera nixman jî radiwestin û wê wek hunerek girîng dinirxînin. Di warê vê hunerê de, di pirtuka, “Ilûm El-Belaxe a Mihemed Ehmed Qasim û Mihî El-Dîn El-Dîb wiha pênase dikin: ‘Tiştêkê dibêjî, lê mebesta te tiştêk dine.’ Ev pênaseye kurttirîn û sadetirîn pênaseya hunera nixman ye. Her di vê pirtûkê de dîsan dibêje: ‘Amaje bi wata yan axaftinekê dike ku arasteyî hişê guhdarî dike, mebestê bi şêweyek raste rast nadete dest, boye dibe ber bi hemwatayê ve biçin ta ku jê têbigihin.’”²¹⁸ Di pirtukek din de wiha tê pênasekirin: “Ji hevokêkê pêktê ku li der wataya xwe a rasteqîne ye û watayek metonîm yanî kînayeyî digihîne. Her çend e hiç rêgiriye nîn e ji bo vê yekê ku hevok bi wataya xwe a rasteqîne bête bikaranîn, çunke di navbera derbirîna metonîm û wataya metonîm de lêkçûnek heye. Bi watayek din metonîm wêneyek e, bi pêkhatayên xwe me ber bi watayek din ve dibe.”²¹⁹

Her dîsa di warê metonîm an nixman de tê gotin: “Nixman bêjeyek e di zanista rewanbêjî de an belaxatê de tê bikaranîn, wate mirov axavtinekê bike, lê mebesta wî tiştêk din be. Wek bibêje filanekes ji wana jî li cem ereb pir in, wate mîvanên wan gelek in.”²²⁰ “Nixman derkirina bêje an hevokê ye, ku li cihya wataya bingehîn, mebesta te wataya peywest be.”²²¹ Tiştê di wan pênaseyan de derdikev ev e; bêje an hevokê wataya xwe a rasteqîn heye û di heman demê de watayek peywendîdar bigihîne û mebesta wê wataya peywendîdar be her wiha wataya bingehîn jî qedexe nebe. Ezîz Gerdî jî dibêje: “Nixman ewe ye raste rast navê tiştêkê bilêv nekî, navê tiştêk din bibêjî ku peywendiya wê li gel wataya yekemîn de hebe, ji bo ku mirov jî wê wataya ku hatiye bilêvkirin, ber bi wataya ku mebest e, biçê.”²²² Eladîn Secadî dibêje nixman: “Di zimanê kurdî de di warê rewanbêjîyê de tê

²¹⁷ Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rewanbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyasedekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 236.

²¹⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 166.

²¹⁹ Îdrîs Ebdulla, *Kowanekani Rewanbêjî*, Çapa 1., Hewlêr, 2014, 190.

²²⁰ Ebdulhuseyîn Naşir Hesam el-‘Ulma’î Eql Ewel, *Der el-Edeb der Feni Me’anî, Beyan, Bedî’*, Çapa 3., Çapxaneyê Şirket Samî, 1340-Ş., 172.-173.

²²¹ Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013, 223.

²²² Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., 88.

bikaranîn, ku di zimanê erebî de ji vê têgehê re (kînaye) tê gotin.”²²³ Her di cihek din de dîsa Ezîz Gerdî dibêje: “Nixman ewe ye, bêjeyek an çend bêjeyek bi kar bînî, ku di gel wataya xwe a rasteqîn watayak din jî bigihîne ku mebest jî wataya din be. Her wiha dikare ji wataya rasteqîn û wataya mebest, wataya rasteqîn bête têgihîştin, çunke ji bo wê yekê hîç nîşaneyek nîn e ku rêgirî ji wataya rasteqîn bika û bide zanîn ku mebest wataya duyemîn e.”²²⁴

Ji aliyê têgeh ve; “Nixman ewe ye ku axêwer dixaze yek ji watayan biçespenê, lê belê vê yekê bi bêjeyên wê wata û mebestê nake ku di ziman de hene, ber bi watayek din ve diçe, ku hemwataya wataya mebest e. Ji cihê wî destî destê din digire û dike belgeyek ji bo gihandina wataya ku mebest e.”²²⁵ Ebdulselar Salar jî di teza xwe a lîsansa bilind de dibêje: “Nixman cureyek e ji peşîmanbûna bikaranîna bêjeya bingehîn ji bo wataya xwe a rasteqîn û belku bi kar tîne ji bo watayek din ta ku bête şîrovekirin û her wiha dibe peywendiyek di navbera wan her du bêjeyane de hebe.”²²⁶

Her wiha di zimanê farisî de jî ev hunere wek hunerek girîng û binirx hatiye hesibandin û lêkolîn li ser hatine kirin. Wek; “Veşartina aşkerahîtiyê ye di axavtinê de, çunke ji cihê ku axêwer an helbestvan ramana xwe bi şêweyek aşkera û di carekê de li gel axavtinên xwe biguncêne û bi rûnî derbibire, tê di nixmanyê de vedişêre an xef dike û bi şêweyekî nadiyar û dapoşî axavtinên xwe derdibire.”²²⁷ Di zimanê ingilîzî de jî ji bo nixmanyê têgeha (metonyan) tê bikar anîn û “Ev bêjeye di zimanê yunanî de ji (metonymia) hatiye wergirtin, ku li her du bêjeyên (meta) yanî guherîn û (onoma) yanî nav, pêk tê. Têgehek diyar û bikarhatî ye di nav zanista ziman, rexne, şêwazê helbesta wêjeya kevn û nû a ingilîzî de û her wiha di wêjeya ingilî de wiha hatiye pênasekirin: ‘Pêk tê ji bikaranîna watayên veşartî ên ziman, tiştê ku derbirînen

²²³ Eladîn Secadî, *Xoşxwanî*, 55.

²²⁴ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., 88.

²²⁵ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî Kurdîda be Nimûne (Hemdî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 2010, 139.

²²⁶ Ebdulselar Salar, *Rewanbêjî le Şîrî Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind-Nehatiye Çapkirin), 118.

²²⁷ Mîr Celaledîn El-Kezazî, *Beyan 1., (Zibaşinasî Sexenê Farisî)*, Çapxanaye Mad, Çapa 9., Tehran, 1389, 156.

dirkî cihê dike, ku ji wan peywendiyên di navbera wata, mebest û wataya dabirî de heye, pêk tê.”²²⁸

Tiştê di wir de girîng e, di encama wan hemû pênaseyane de em têdigin ku nixman hunerek girîng e di nav rûnbêjî û rewanbêjîyê de. Hunerek e bandorê li wata û hemwatayê dike, lê belê bi mebestek xef û veşartî. Peydakirina vê hemwatayê jî her li xwe nabe, belkû ji her du aliyan ve dibe.

A/

Cureyek peywendiyê ye di asta derbirînê de, di navbera wataya bilêvkirî û wataya ku mebest e û hatiye veşartin.

B/

Ew çand, zimane taybete ye ku bingehêk wê li cem guhdarê hişyar an şareza heye û zû an dereng guhdar jê serwext dibe û têdigihe.

Nixman li cem helbestvanan ji bo dariştina helbestê pêwîstiyek, çunke “Wek huner xwediyê nixek giranbiha û bi bandor e, di pêkanîna wêne û derxistina sîmayê hunerên veşartî de, ku bi taybetmendiyên wê dahênan û ciwanî rûn dibin û diçirsin. Her wiha nixman ruh dide wî wêneyê ku amaje bi hêz û peywendiyên di navbera mirov û sedemên din ên ku wê ji her çar aliyan ve dorpêç dikin.”²²⁹ Li cem me nixman: Gihandina watayekê ye, lê ne bi wê wataya ku ji bo bêjeyê hatiye danandin, ji ber sedema çend bêjeyek din. Bi riya wan peywendiyên ku peydabûne em digihin wataya ku mebest e. Bo nimûne Ehmed Muxtar Begê Caf di vê beytê de dibêje:

“Weten fermûy be xendey nazewe her wek perî waye,

Ema heyfê ke çend sal e esîrî esîrî pencey dêwim” r. 86.

²²⁸ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 167.

²²⁹ Seîd Farûq Yusif Şêx Bizînî, *Binyatî Hunerî le Şîrî Ehmed Muxtar Begê Caf da*, Hewlêr, 2011, 177.-178.

Dêw.....dirkpêkirin, Dijmin, naxer, dagîrker.....dirkbokiraw

Di hevoka yekemîn a vê beytê de, wêneyê helbestî li ser bingeha lêmanendeyê dirust bûye, ku (weten) yanî niştiman bi (perî) hatiye manandin. Lê belê di hevoka duyemîn a beytê de wêne li ser bingeha nixmanyê hatiye dirustkirin. Di wir de jî (dêw) nixman ye û helbestvanî ew ji bo dijmin û dagîrkerên Kurdistanê bi kar aniye. Helbestvanî bi şeweyek raste rast ev yeke dernebiriye û ev yeke berceste kiriye û dibêje (çend sal e ez di nav çengên dêw de dîlgir im.) boye nixman her di xwedî tiştê bixwe de ye. Di vir de derdikeve ku helbestvan ji ber rewşa siyasî an rewşek din, nikare bi serbestî û azadana ramanên xwe derbibire. Helbestvan di vê beytê de qala niştiman dike û dibêje çend sal e ew ji aliyê dijminan ve hatiye dagîrkirin û dîlkin, boye hêvî dike ku niştimana wî ji vê rewşê rizgar bibe û azad bibe. Helbestvan vê rewşê wek amûrekê bikar tîne ta ku bikare bandorê li ser derûna xelk û ciwakê bike û wan bilivîne, han bide û ji aliyê hest û soz ve wan wek xwe lê bike. Bi vî awayî helbestvanî wêneyek dirkî ji me re dirust kiriye.

Duyemîn/

Binemayên Nixmanyê

Lêkoler û zanayên rewanbêjiyê binemayên nixmanyê li ser sê cureyan de dabeş kirine, wek:

A: Dirkpêkiraw (el-Mikuniye):

“Ji wataya rasteqîn pêk tê, wata ji wê têgeha ku ji bo hatiye bikaranî wediguheze bo wataya peywendidar.”²³⁰ Bi watayek din ji bilêvkirinek diyar û aşkera pêk tê ku axêver wê wek belgeyekê bi kar tîne ji bo wê mebesta ku ji xwe re diyar kiriye.

B:Dirkbokiraw (el-Me'nî 'Ene):

Ji wataya peywendîdar a dirkpêkiraw pêk tê, ku axêver bi riya nixman ve hêma jê re tîne û îşaretî pê dike.

²³⁰ Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rûnbêjî le Komele Şîirî Şehîd be Tenya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 242.

C:Nîşane (el-Qerîne):

“Nîşane ji bo wataya nixmanyê ye, ku wek nixmanya bingehîn û girîng tê danandin. Nîşane di hunera nixmanyê de dibe rêgir ji bo dirustbûna wataya derekî. Wate nîşaneyê nixmanyê ji nîşaneyê xazeyê ciyawaz e.”²³¹

Di hin çavkaniyan de wek pêkhateyek bingehîn a nixmanyê qala nîşaneyê nehatiye kirin û di wan çavkaniyan de ji bo têgeha (dirkpêkiraw) têgeha (derbirîna dirkaw), ji bo (dirkbokiraw) jî têgeha (wataya dirkaw) hatiye danandin. Tiştê di vir de girîng e û dibê bê zanîn ew e; ev her sê binemayane girîng in û li gor taybetmendiyên xwe di hunera nixmanyê de her yekê cihê xwe ê girîng heye. Her tim bineyamaya yekemîn û sêyemîn di nav derbirînan de derdikevin. Binemaya yekemîn hemwataya hunera dirkbokiraw e û bi wataya rasteqîn tê zanîn û bi riya wê axêver mebesta xwe a veşartî derdibire. Binemaya sêyemîn jî ku nîşane ye; di nav derbirînê de amaje bi watayakî derekî dike. Nîşane wisa dike ku guhdar dest ji wataya rasteqîne bikêşe û ber bi wataya veşartî an dirkav ve biçê. Nîşane bi vê taybetmendiya xwe dirûvekî helbestî û edebî dide nivîsên pexşanî û helbestan. Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Seyrî reqîb ke wek sege bo mangeşew be şew,

Her lûre lûrî ye le firaqî cemaleket” r. 68.

Sege bo mangeşew....dirkpêkiraw, Werîn/lûrîna reqîb.....dirkbokiraw

Helbestvanî di beytê de hunera nixman sazandiye û ev yeke jî bi riya bêjeyên (sege bo mangeşew) yanî kuçikê heyveşevê ye, cêbecê kiriye û mebesta wî jî reqîb an dijberê wî ye ku ew jî aşiqê yarê ye û wek kûçik ji bo dîlbera ku ji heyveşevê diçe, dilûre.

Behsa Duyemîn:

Cureyên Nixman di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de

²³¹ h.ç., 241.

Hunera nixman jî wek hunerên din ên rûnbêjîyê ji aliyê binema ve dibe sê beş, ew jî:

Yekemîn/

Nixman di Sifet de (el-Kinaye En Sifet)

Duyemîn/

Nixman di Xud de (el-Kinaye En Mewsûf)

Sêyemîn/

Nixman di Hewgirî de (el-Kinaye En Nisbet)

Yekemîn/

Nixman Rengdêrî (el-Kinaye En Sifet)

Jê re (Nixman di Awelnaw de) jî tê gotin û wiha tê pênasekirin: “Ev cure nixmanyê wisa ye, dibe hunera dirk, sifet an taybetmendiyeke diyarkirî ê kesek an tiştê bidirkîne, bal û awirên guhdaran bikêşe ser vê sifet an taybetmendiyeke. Wek; bihêzbûn, ciwanî, germî, hejarî...hwd. Wate helbestvan sifetê ku mebesta wî ye, raste rast dernaxîne. Ji bo vê yekê helbestvan helwestekê pişan dide an dinivêne, mirov dikare bi riya vê helwestê wî sifetê diyar bike û ji mebesta wî têbigihe.”²³² Wate em dikarin vî cureyî wek (rengdêra bi rengdêr) jî bi nav bikin. Eger arasteya mijarê her xwedî tişt bixwe be û sifet wî/ê hebe, ev yeke bi riya vê cure nixmanyê bi sifetek din an bi têgehek nû tê dirkandin. Ehmed Muxtar Beg di vî warî de dibêje:

“Lome meke ke min emewê rû be rût bibim,

Bê berg û rût û qûtîm û meylî hetaw ekem” r. 90.

Bê berg û rût û qûtîm....dirkpêkiraw, Hejarî û feqîrî û destgirtî....dirkbokiraw.

Helbestvan di vê beytê de bi riya hunera nixman wênayekê diruxsêne û dibêje; gileyî û lomeyan li mi meken, gawa ku ez dixwazim her bi rût û tazî rû bi rûyê yarê bibim, di vir de mebest ji rût û tazîbûnê, hejarî û destkurtî ye, ku wek rojê

²³² Derya Cemal Hewêzî, *Wênayê Rûnbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyase Dekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009, 248.

ciwan û beşxende ye. Di vir de derdikeve ku dîlber ji aliyê abûrî ve dewlemend û destdirêj e, lê dildar feqîr û hejar e û bêdesthelat e, boye lawahiyan ji xelkê dike ku lomeyan li wî nekin. Ji vê yekê re, nixman di sifet de, tê gotin. Em dikarin wek hewalnaw-rengdêr jî bi nav bikin ku wesfê helbestvanî dike ji aliyê hejarî de. Nixman di sifet de, di nav xwe de dibe du beş:

A/ Nixman di Sifetê Nêzîk de,

B/ Nixman di Sifetê Dûr de

A/ Nixman di Sifetê Nêzîk de

Cureyekî hunera nixman di sifet de ye, wate; “Ji bo weguhestina ramanê ji peywendî ve ji bo peywendîdar nabe hîç sedem û navgînek bête bikaranîn. Ji ber vê yekê jê re nixmana nêzîk jî tê gotin. Çünke mirov raste rast jê têdigihe.”²³³ Di cihek din de jî di warê vî cureyî de tê wiha gotin: “Ew cure nixmane ye ku wataya mebest (dirkaw), bi riya peywendî an navgîna here nêzîk wediguze.”²³⁴ Di vî warî de Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Le xew helsin dereng e milletî kurd xew zerertane,
Hemî terîxî ‘alem şahîdî fezl û hunertane” r. 146.

Le xew helsin....dirkpêkiraw, Hişyarkirin, agahdarkirin.....dirkbokiraw.

Helbestvanî di vê beytê de bi riya bêjeyên (le xew helsin-ji xev rabin) hunera nixman sazandiye û mebesta wî xwedî xev bixwe nîn e, belku mebesta wî hişyarbûn, zanabûn, têgiheştîbûna gelê kurd e, ku dagîrkerî û bindestiyê red bike û daxwaza azadiya xwe bike û ji bo vê yekê jî hewl bide. Di vir de hunera nixman bi sifetên ku ji hev nêzîk in, hatiye sazandin. Mebest ji xevê, bêagahîbûn û nezanbûna gel e. Helbestvan di beytek din de dîsa dibêje:

“Ger bilêy (Ehmed) le yarî boseyekî dawa bika,

Rû eçerxênê le to û giwêy lew qise sengîn eka” r. 59.

²³³ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebi Kurdîda*, I., 90.

²³⁴ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehîwî da*, Silêmanî, 2014, 175.

Giwê(guh)...dirkpêkiraw, Xogêlkirdin, sengîn (xwegêjkirin, giran).....dirkbokiraw.

Helbestvanî di vê beytê de bi riya sifetên ji hev nêzîk nixman dirust kiriye. Di vir de nixman di bêjeya (giwê-guh) de ye. Dema Ehmed wek dildar ji dîlbera xwe maçekê dixaze, ev daxaze ji yarê re nexweş tê û rûyê dizivirîne aliyek din û xwe ji vê gotin û daxaze bêgah û ker dike, qaşo tiştêk wisa nebihîstiye. Di beytek din de helbestvan dibêje:

“Witim bew hîze emro rojî toye,

Bixo, danê be meylit ling le ser ling” r. 74.

Ling le ser ling....dirkpêkiraw, Bêhnvedan û ling danan ser lingdirkbokiraw.

Helbestvanî di vir de jî bi riya pêkhatiya (ling li ser ling) nixman dirust kiriye, ku hêmaya dirkpêkiraw e û sifetê nêzîk e. (Bêhnvedan) jî dirkbokiraw e, ji sifetê nêzîk e û dibe nixman. Çünke bêhnvedan û vehesîn ji aliyê wataya ji pêkhatiya, ling li ser ling danadinê, nêzîk in.

B/ Nixman di Sifetê Dûr de:

Di vê hunerê de, “Di navbera her du watayên dirkaw de çend navçînek hene, gihiştina waya rastîn bi wataya mebestîher wisa bi asanî cêbecê nabe.”²³⁵ Her di warê vê nixmanyê de Ezîz Gerdî jî dibêje yanî: “Zêhn û hişê mirov ji ber hin sedemanên di warê mijarekê de ji wataya rastîn ber wataya ku mebest e, biçe. Di vê hunerê de, ji bo ku bigihî wî sifetê ku hevok didirkêne, pêwîstî bi gelek sedeman heye û dibe gelek bê û biçî ta ku wataya mebest bi dest bêxî. Boye jê re nixmanya dûr tê gotin.”²³⁶ Li gor me ev cure nixmanyê ji cureyê nixmanya nêzîk bihêztir û bandortir e. Çünke ji bo bikaranîna vî cureyî pêwîstî bi paşxane û bagrawendekî baş heye, ku di warê çand, huner, ziman û zanistên din de be. Wek Ehmed Muxtar Caf dibêje:

“Ey Xuda ta key le derheq mn wefa û meylî nî ye,

²³⁵ Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 177.

²³⁶ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., 91.

Bo çi giloley bextî min her rû le cêgey lêj eka” r. 55.

Giloley bext....dirkpêkiraw, Bêşansî û bêbextîdirkbokiraw.

Di vê beytê de nixman bi riya pêkhateya (giloleya bext) hatiye dirustkirin. Ji bêjeya gilole, mebest giloleya kilaş an giloleya şilîle nîn e, belkû mebest bêşansî, bêbextî û neçarî ye. Wate pêkhateya dirkbokiraw nîşaneyê bêbextî û bêşansiya helbestvan an dildarî/ê ye. Helbestvanî bêşansî û bêbextîbûna xwe bê cihê lêj çiwandiyê û dibêje her ku diçe rewşa min xiraptir dibe. Di vir de ji bo peydakirina dûrî û nêzîkiya nixmanyê pêwîstî bi zanyarî, têgihiştin û jîriyek baş heye.

Duyemîn/

Nixmana Pir-rengdêrî(el-Kinaye ‘En Mewsûf):

Di vê cure nixmanyê de, “sifetek an çend sifetek tên gotin, ku tenê di yek tiştê de hene. Bi riya van tiştan em dikarin xwediyê van sifetan bizanin an binasin, ku tiştê hatiye wesifkirin kes e. Wek nanxwerê pênc tiliyan, qirêja destan...”²³⁷ Di vê cure nixmanyê de, dirkaw ji sifet ve bo tişt an kesî/ê ku tê wesifkirin diçe. Ehmed Muxtar Caf di vî warî de, di vê beytê de wiha dibêje:

“Seyrî reqîb ke wek sege bo mangeşew be şew,

Her lûre lûrî ye le firaqî cemaleket” r. 68.

Sege bo mangeşew....dirkpêkiraw, Werîn/lûrîna reqîb.....dirkbokiraw.

Helbestvanî di vê beytê de, bi riya bêjeyên (sege bo mangeşew) yanî kuçikê heyveşevê ye, cêbecê kiriye û mebesta wî jî reqîb an dijberê wî ye ku ew jî aşiqê yarê ye û wek kûçik ji bo dîlbera ku ji heyveşevê diçe, dilûre. Di hunera nixmana pir-rengdêrîde jî wek hunera nixmana rengdêrî, nixmana dûr û nixmana nêzîk heye, wek:

A/ Nixmana Pir-Rengdêrî aNêzîk,

B/ Nixmana Pir-Rengdêrî a Dûr.

²³⁷Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî Kurdîda be Nimûne (Hemdî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 2010, 211.

A/ Nixmana Pir-Rengdêrî aNêzîk:

Ev cure jî her bi heman şêwe sûd ji nixmanya sifetê nêzîk werdigire û dibe bi wê tiştê ku sifetek an çend sifetekan tîne bidin nasandin. Tê zanîn ku mebest çî tişt e, boye ji sifetên wê, her nêzîkî tiştê bixwe dibin. Wate xef, nihênî û lêliyek wisa tê de nîn e, ta ku guhdar yan xwîner bi zehmet wataya ku mebest e peyda bike. Wek helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Îşarey kird biroy ye’ nî ke bo qetlî dilî aşîq,

Le piştî çawî yaro cêgey sed zulfeqar egrim” r. 81.

Zulfiqar....dirkpêkiraw, Xencera Îmamê Elî.....dirkbokiraw.

Di vêbeytê de nixman bi riya bêjeya (zulfiqar) dirust bûye, bi wataya xwe ferhengî nehatiye, belkû bi wataya şimşêrê Îmamê Elî hatiye bikaranîn, boye dirkbokiraw e. Bi taybetî di zimanê kurdî de, ji şimşêrê Îmamê Elî, mebest birûyên dîlberê ne, ku ji bo kuştina dildaran cihê sed şimşêrên zulfiqar digire. Îmamê Elî bi şimşêrê zulfiqar kafir dikuştin, yar jî dildaran dikuje. Wate di vê beytê de ev hêmayene ji bo nixmana pir-rengdêrî adûr û nêzîk bi kar tên, em ji bo nêzîk bi kar tînin.

B/ Nixmana Pir-Rengdêrî a Dûr:

Ev nixman berewajî nixmanya xûdî nêzîk e, wate; “Ewe ye; sifet an sifetên tiştan, ta ku em li ser wan hûr nebin, bi şêweyek raste rast andirkêne an nade dest. Her wiha dibe çend sedem û zanyarî hebin ji bo ku ev sifetane û tişt bi hev re bîn girêdan. Wek çawa ji bo dirkandina mirov an ademîzad pêkhatiya, (zîndeverekî/e rewan e.) tê gotin. Vê yekê pêwîst bi ravekirinê heye.”²³⁸ Wek helbestvan di vê beytê de dibêje:

“Weten fermûy be xendey nazewe her wek perî wame,

Ema heyfê ke çend sale esîrî pencey dêwim” r. 86.

Dêw.....dirkpêkirin, Dijmin, naxer, dagîrker.....dirkbokiraw

²³⁸ Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebi Kurdîda*, I., 91.

Di hevoka yekemîn a vê beytê de, wêneyê helbestî li ser bingeha lêmanendeyê dirust bûye, ku (weten) yanî niştiman bi (perî) hatiye manandin. Lê belê di hevoka duyemîn a beytê de wêne li ser bingeha nixmanyê hatiye dirustkirin. Di wir de jî (dêw) nixman ye û helbestvanî ew ji bo dijmin û dagîrkerên Kurdistanê bi kar aniye. Helbestvanî bi şêweyek raste rast ev yeke dernebiriye û ev yeke berceste kiriye û dibêje (çend sal e ez di nav çengên dêw de dîlgir im.) boye nixman her di xwedî tiştê bixwe de ye. Di vir de derdikeve ku helbestvan ji ber rewşa siyasî an rewşek din, nikare bi serbestî û azadana ramanên xwe derbibire. Helbestvan di vê beytê de qala niştiman dike û dibêje çend sal e ew ji aliyê dijminan ve hatiye dagîrkirin û dîlkin, boye hêvî dike ku niştimana wî ji vê rewşê rizgar bibe û azad bibe. Helbestvan vê rewşê wek amûrekê bikar tîne ta ku bikare bandorê li ser derûna xelk û ciwakê bike û wan bilivîne, han bide û ji aliyê hest û soz ve wan wek xwe lê bike. Bi vî awayî helbestvanî bi riya hunera nixmana pir-rengdêrî adûr de, wêneyek ji me re dirust kiriye.

Sêyemîn/

Nixman di Hevgirî de (el-Kinaye En Nisbet):

Ev cure hunere jî di nav hunera nixman de xwediyê cihek serekî û girîng e û wiha tê pênasekirin: “Ev hunere jî her sifetekê li xwe digire, lê belê di vir de sifet bi şêweyek raste rast tê gotin û bi riya sedemekê ve ji navê ku tê wasifandin ve tê girêdan. Wate bi raste rast bi navê ku diwesifîne ve nayê girêdan, wek; Bergî temelîdirîwe.”²³⁹ Yan eve ye, sifet an taybetmendiya kesekê an tiştêkê, rastewxo neyête derxistin û bi riya tiştêkî wî/ê kesî/ê bête derbirîn. Hunera nixmanya hevgirî ji aliyê pênase û nasîn ve ji her du cure nixmanyên din cihê dibe. Yanî nixman di hunera nixman di sifet de hemwataya sifet e; di hunera nixmana pir-rengdêrîde, hemwataya navê tê wesifandin e, wate wan didirkêne. Lê belê hunera nixman di hevgirî de, li hunera nixmana pir-rengdêrînezîk dibe, ciyawazî tenha eve ye; em di hunera hevgirî de sifetekê dixin pal an pişt tiştêkîpir-rengdêrî, ku di rastî de jî di hunera nixmana pir-rengdêrî, hemwatayapir-rengdêrîan sifetê pir-rengdêriyê ji bo

²³⁹ Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî Kurdîda be Nimûne (Hemdi û Hacı Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 2010, 212.

dirkandin an tēgihiştina pir-rengdêrî bixwe ye, nek ji bo tiştêkî pir-rengdêriyê ye ku di hunera hevgirî de heye.

Me her çend temaşeyî dîwana Ehmed Muxtar Caf kir jî, me hîç nimûneyek peyda nekir ku bi hunera nixman di hevgirî de, hatibe nivîsîn, boye derdikeve ku helbestvanî bi vê hunerê helbest nenivîsîne. Lê belê me dîsa jî wek pêwîst zanî ku em pênasê û zanyariyek kurt di warê vê hunerê de bibêjin.

Behsa Sêyemîn

Girîngiya Nixman û Mebestên Wê di Helbestê de:

Nixman wek hunerek girîng û diyar ê rewanbêjiyê, li gelmanendin û xazeyê de xwediyê cihêk mezin e di nav hunera rewanbêjiyê de. Bikaranîna vê hunerê ji aliyê wêje û rewanbêjiyê ve her wisa ji xwe ve nebûye û asan nebûye, ji ber ku ev hunere xwediyê komelek erk, rol û taybetmendiyên girîng e ku di nav rewanbêjiyê de hîç hunerek din nikare wan derbibire û qala wan bike. Boye di vir de emê hin erk, rol, girîngî, mebest û bikaranînên vê hunerê rave bikin. Wek:

Yekemîn:

Veşartin û aşkerakirina wata, mebest û derbirînên raste rast. Ev yeke girîngtirîn taybetmendiya nixmanê ye ye ku tê bikaranîn. Çi axêver yan helbestvan be, bi taybetî li cem Ehmed Muxtar Caf, ev rexneyene ji bilî helbestê bi hîç rêyek din nayêne arastekirin. Boye dibe zimanê helbestê ji zimanê rastewxo an rojane dûr bikeve, ji ber vê yekê ev cure hunere tê bikaranîn. Di gelek helbestên rexneyî de li hember nefis, sofî, waîz, cîhan û ciwak tê bikaranîn.

Duyemîn:

Hunera nixman pendên pêşînan an gotinên pêşîyan di nav helbestan de bi kar tîne, hem qalib an dirûvê wan diparêze, hem di helbestê de aheng û hêzdariyekê dirust dike û bi awayî wan hem ji navçûn û winbûnê rizgar dike, hem jî bi heman

qalib û dirûvê wan ji serdemekê bo serdemek din wediguhêze. Wek Ehmed Muxtar Caf di vê beytê de dibêje:

“Seyrî reqîb (ke wek sege bo mangleşew) be şew,

Her lûre lûrî ye le firaqî cemaleket” r. 68.

Sêyemîn:

Hunera nixman ew hunere ye, “Di ziman de ji bo dirustkirina hemwata û dewlemendkirina ferhengê rolek girîng digêrîne. Boye her kesek nikare vê hunerê bi kar bîne, eger di warê ziman û rewanbêjîyê de pispor nebe. Çûnke dirustkirina her cure nixman û hemwatayekê eger di destpêkê de aîdî kesekê nebe, paşan piştî demekê dibe malê ciwakê, boye pêwîstî bi agahdarî û bingehek zimanevanî a baş heye.”²⁴⁰ Di hunera nixman de gawa gotinên pêşîyan tînan bikaranîn mebest wataya ferhengî, zimanî an rastqîne nîn e. Bo nimûne dema dibêjin; ‘Di guhê ga de razaye.’ mebest beagahî û nezanî û paşkevîbûn e.

Çaremîn:

Aliyekî din ê hunera nixman, “Ewe ye, di derheqê kesê beramberê te de, qala tiştê an sifetekî neguncaw dike, bêyî ku kesê beramberê te, ji vê yekê hêrs bibe an wê wek tiştê xirab fam bike, derdixê û araste dike.”²⁴¹ Wek di vê beytê de helbestvan dibêje:

“Weten fermûy be xendey nazewe her wek perî wame,

Ema heyfê ke çend sale esîrî pencey dêwim” r. 86.

Helbestvan di vê beytê de bi şêweyek narastewxî dagîrkerên Kurdistan û niştimana xwe wek (dêv) bi nav dike û dibêje, çend sal e dîlgir im di destê dêv de. Helbestvan bêyî ku dijmin û dagîrkeran hêrs bike û awirên wan bikêşe ser xwe, wan dişibîne dêv, wate ajalek dirende. Bi vî awayî wan xirap nîşan dide.

²⁴⁰Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 186.-187.

²⁴¹ h.ç., 187.

Pêncemîn:

Gelek jar bi riya du wêneyan hunera manendin di nav dil û hinavên nixmanyê de tê veşartin. Lê belê di vir de her du aliyên manendinê gelek ji hev dûr in, tenanet her du wêne ji hîç aliyekêve ji hev naçin.

Şeşemîn:

“Teknîka kurtbirîn û qalkirina lezgîn, yek ji teknîkên hunera nixman ye. Ev teknîke ji bo helbestvan û axêver derfet û sedeman dirust dike, bê ku helbestvan û axêver di axaftin û gotûbêjan de ji hedê xwe derkevin, hewl didin ew tiştên di dilê wan de hene derbibirin û bi kesê li beramberê xwe bidin têgihandin.”²⁴² Wek helbestvan di vê helbestê de dibêje:

“Witim bew hîze emro rojî toye,

Bixo, danê be meylit ling le ser ling” r. 74.

Helbestvanî di vir de bi riya pêkhateya (ling li ser ling) nixman dirust kiriye. Her wiha ev nixmaneye nixmaneyekî kurtkirî û qalkirinek lezgîn e, boye em yan xwendakar zû têdigihin ku mebest paldan û bêhnvedan e, çunke hemû kes dizane wataya pêkhateya (ling li ser ling), bêhnvedan, danana lingan li ser yek û paldan e.

Behsa Çaremîn:

Berawirdî di Navbera Nixman û Xaze de:

Hunera nixman û xaze ser bi zanista rûnbêjiyê ne, ji ber vê yekê di gelek waran de ji hev cihê ne an ji hev diçin. Ji hev cihêbûn û ji hevçûnên wan ev in:

Yekemîn:

Hunera nixman û xaze di her du astên (diruste) û (xaze) de kar dikin. Bi watayek din; “Nixman jî her wek xazeyê derbirînek e ku di wataya xwe de nehatiye bikaranîn û xazeyî ye.”²⁴³ Diruste û xaze jî di wan her du hunerane de du astên girîng

²⁴²Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014, 188.

²⁴³Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî Kurdîda be Nimûne (Hemdi û Hacı Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 2010, 221.

in. Diruste, wate ew tişta ku di derbirînê de heye, hem li cem helbestvan, hem li cem axêver berbiçav û diyar e; xaze jî, wate ew mebesta ku helbestvan an axêverî heye, li nivîsar û deqê bar dike û li gel wataya rasteqîn de derdibire.

Duyemîn:

Ciyawaziya serekî a di navbera nixman û xaze de jî ev e: “Di nixmanê de eger mebest wataya rasteqîn (diruste) jî be rê li nayê girtin.”²⁴⁴ Bo nimune dema ji kesekê re (dest kurt-destteng) tê goti yanî ew kes (hejar) e, ji aliyê abûrî ve rewşa wî/ê baş nîn e, lê dibe wataya rasteqîn jî bigihîne û di rastî de jî kesek hebe ku ji aliyê endam ve destê wî kurt be, wate ew kese kêmendamiyê be.

Sêyemîn:

Ji bilî van ciyawaziyane hin ciyawaziyên din hene ku di warê mebest û derbirînan de ne. Bo nimûne di hunera nixman de hinek tişt ji ber sedemên rexnekirin, şerimkîrin an hin sedemên din tîr veşartin û bi şêweyek narastewxî tîr bilêvkirin. Lê belê mebest û erka hunera xazeyê ji di vî warê de ciyawaz e.

²⁴⁴ Mihemed ‘Elî Sultanî, *El-Muxtar mîn ‘Elûm El-Belaxe ve El-‘Erûz*, Çapxaneyê ‘Esa, Çapa 1., Dîmeşq, 2008, 110.

ENCAM:

Di dawiya van lêkolînan de em ghiştin wan encamên jêrê:

1. Rûnbêjî zanistike hûr, kûr û berfireh e di nav zanista rewanbêjîyê de. Boye girîngtirîn, bihêztirîn û diyartirîn hunerên rewanbêjîyê di wan cureyane de kom bûne, ku ji hunera manendîn, xaze û nixmanê pêk tên, tenanet xwediyê rol û dewrekî girîng in di dirustkirina wêneyên hunerî û helbestî di helbestan de. Van hunerane wisa kiriye, ji bo xulqandina wêneyên hunerî ên nû û her wiha rêgirtin ji dubarebûna heman wêneyan di helbestan de, ji helbestvanî re derfetên mezin û qadên berfireh ruxsane. Bi vî awayî helbestvan derûn û xeyalên dilê xwe berceste dike.

2. Ehmed Muxtar Caf, di dirustkirina wêneyên helbestên de, ev zaniste bi selîqane û hunerane bi kar aniye. Ev yeke jî bi riya bandora helbest û helbestvanên neteweyên cîran bûye, boye helbestvanî şiyaye bi jêhatiyane vê zanistê bi kar bîne. Yek ji taybetmendiyan here diyar ên wêjeya van cîranan bikaranîna hunerên rewanbêjîyê ye û her wiha bandora zimanê Quranê jî bi şêweyek aşkira diyar e û tê dîtîn. Ev yeke jî nîşaneya şareza û bi agahbûna wan a diwarê îslamê de ye, ku di gihandina helbestvanên wê serdemê de çavkaniya serekî bûye.

3. Helbestvan, ji bilî şarezabûna wî a di warê siyaset, hespsuvarî, nêçîrvanî, kesabet û demûdezzagahên hukimranî de, di warê zanista rewanbêjî û bi taybetî zanista rûnbêjîyê de jî zana û têgihîştî bû, ku di vê lêkolînê de mebesta me a serekî ye û her wiha derdikeve ku helbestvanî bi şêweyek gelek hûr û kûr û hunerane ev zaniste di helbestên xwe de bi kar aniye. Helbestvanî ciwantirîn wêne bi riya van hunerane xulqandine û tenanet bi têkelkirina van hunerane nûjenî jî dirust kiriye. Di vir de Ehmed Muxtar Caf wek helbestvanek teknîkdar derdikeve holê, ji ber vê yekê jî di hemû dîwana wî de kême xezel û qesîde hen ku tê de yek ji hunerên rewanbêjî û rûnbêjîyê tê de bi kar nehatibe.

4. Manendin wek yek ji hunerên rûnbêjîyê di helbestên Ehmed Muxtar Beg de gelek tê dîtîn û helbestvanî bîst cureyan zêdetir ên hunera manendinê bi kar anîne. Wêneyên here ciwan bi riya cureyên manendina awejû/dij û pesendîdeyê hatine

dirustkirin. Ehmed Muxtar Begî bi riya vê hunerê mijarên jîrî û wêneyên veşartî û xeyalên xwe berceste kirine û her wiha bi berewajî jî. Her wiha helbestvanî şiyaye bi şêweyek rêkûpêk û giranbiha wêneyên hemû hestan ji me re dirust bike. Her wiha bi riya taybetmendiyên hin tiştan ve gelek tişt û taybetmendiyên din nîşanî me dane. Tenanet Ehmed Muxtar Beg bi riya van hunerane gelek wêneyên nûjen û ciwan ji me re ruxsandine ku di wêjeya kurdî de li ber çav nakevin. Helbestvanî di hunera manendî de binemaya daçekamanendî bi şêweyê daçek û nav bi kar aniye.

5. Ehmed Muxtar Beg bi şêweyek serkevtî gelek ji peywendiyên di navbera wataya dirust û xaze de bi kar anîne. Di gelek helbestan de pişt xwe daye bikaranîna van peywendiyane ku dibin sedema dirustbûna wêneyên xazeyî û her wiha helbestên wî jî, ji wêneyên xazeyê ên cur bi cur bêpar nebûn. Helbestvanî kêmezêde ji bo hemû cureyên xazeyê mînakên helbestên ciwan û balkêş dirust kirine.

6. Helbestvanî gelek serkevtiyane hunera spardeyê bi kar aniye ku hunereke binirx û bibandor e û ji bo bikaranîna wê dibe helbestvan xwediyê bingeh û şarezayî û jêhatîbûnek baş be û zanist û zanyariyek baş li cem hebe ta ku bikare bi serkevtiyane vê hunerê bi kar bîne. Hunera spardeyê ji bo dirustkirina helbestan xwediyê şiyane baş e û di vir de ji bo têkelkirin û weguhestina taybetmendiyên tiştan û bikaranîna van taybetmendiyên di cihê yektir de, gelek car rêsa û yasa tînan ladan. Ev hunere li cem Ehmed Muxtar Beg wek hunerek girîng û çalak tê dîtin û her wiha helbestvanî ew bi agahiyane bi kar aniye. Çünke sparde wek hunera kurt, hûr û kûr tê nasîn, ev nasîne jî ji bo helbestên Ehmed Muxtar Beg diguncê. Ehmed Muxtar Beg di warê vê hunerê de gelek zana û hişyar bûye, boye li cem wî gelek tê dîtin an tê bikaranîn. Ehmed Muxtar Beg nêzîkî deh cureyên vê hunerê bi kar anîne.

7. Hunera dawiyê a zanista rûnbêjiyê nixmane. Bi riya vê hunerê wataya ku mebest e tê veşartin, hewwata tê dirustkirin û her wiha wataya tiştan bi şêweyek lezgîn tê gihandin û rewanekirin. Wek hunerek girîng û binirx tê pejirandin. Derbirînan kurt, puxt û hûr û kûr dike. Ev hunere rola gotinên pêşyan û biwêjan

hildigire û wan bi kar tîne. Ehmed Muxtar Begê helbestvan jî wek helbestvanek rexnegir di derbarê kêşeyên ciwakî, siyasî û dînî de xwediyê rexneyan bû û ev rexneyane jî bi riya helbestên xwe bi şêweyek veşartî û peçavî derdibirin. Ev yeke jî nîşan dide Ehmed Muxtar Beg di warê ziman, çand û kelepûra kurdî de kesek zana û têgihiştî bûye, boye di helbestên xwe de ev her sê hunerene bi kar anîne.

8. Dema bi riya van hunerane helbestên Ehmed Muxtar Beg tîna lêkdan û şîrovekirin, têgihiştina wan asantir dibe û tama helbestbûnê jî zêdetir dibe. Ev yeke jî di encama diyarkirina beşên wêneyên dirustkîrî û destnîşankirina mijarên ku mebest in li cem helbestvanî û diyarkirina mijarên manende, lêmanende, boxwastraw û lêxwastraw de berpa dibe. Her wiha di helbestên Ehmed Muxtar Beg de pêşkeşkirina mijarên mebest, mijarên tîna sparde û nixmanyê, têgihiştina helbestên wî asantir dibe.

ÇAVKANÎ:

QURANA PÎROZ:

1. Qurana Pîroz, *Suretî El-Beqare, Ayetî*, 117.
2. Suretê El-Rehman, Ayeta 1.2.3.4.
3. Sehîh Muslîm, *El-Reqem*, 1435.

ÇAVKANİYÊN KURDÎ:

1. Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rewanbêjî le Komele Şîrî Şehîd be Tenya Piyasedekatî Qubadî Celîl Zade*, Silêmanî, 2009.
2. *Dîdarî Taybet be Şaîr Ehmed Muxtar Caf*, Çapa 1., Silêmanî, 2013.
3. Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm, *Lêkolînewey Edebî Mêjûy Ehmed Muxtar Begî Caf*, Silêmanî, 2000.
4. Ebdulkerîm Hemîd, *Ehmed Muxtar Caf Şaîr û Mirov le Kurdistanî Ew Serdemeda*, I., Bexdad, 1997.
5. Ebdulqadir Mihemed Emîn, *Wêney Şîrî le Rêbazî Romansî Kurdî de*, Silêmanî, 2002.
6. Ehmed Muxtar Caf, *Meseley Wîjdan*, Silêmanî, 2006.
7. Ehmed Seîd Elî Berzencî, *Awêney Jînim Yadaştekanî Şakîr Fetah*, Rêkxistin û Lêkolînewe, Hewlêr, 2003.
8. Eladîn Secadî, *Deqekanî Edebî Kurdî*.
9. Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanxaneya Kurdistan, Sine.
10. Eladîn Secadî, *Xoş Xwanî (Guzarekarî, Xoş Xwanî, Xoş Ciwanî, Riwanî)*, Çapxaneya Mearif a Baxdayê, 1978.

11. Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda*, I., Bexdad, 1972.
12. Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda-Watanasî*, Çapa 3., Çapxaneya Kakey Felah, Silêmanî, 1979.
13. Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebiyatî Kurdîda (Ciwankarî – El-Bedi')*, II., Hewlêr, 1975.
14. Hejar Feqê Silêman Hisên, *Rûnbêjî le Şîrî Mehwi da*, Silêmanî, 2014.
15. Îdrîs Ebdula, *Ciwankariy Şîrî Klasîkî Kurdî*, Saziya Vekolînan a Mukiryana, Hewlêr, 2012.
16. Îdrîs Ebdula, *Ciwankarî Şîrî Klasîkî Kurdî*, Çapa 1., Hewlêr, 2012.
17. Îdrîs Ebdula, *Kowanekanî Rewanbêjî*, Çapa 1., Hewlêr, 2014.
18. Îzedîn Mistefa Resûl, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Bexdad, 1986.
19. Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I.
20. Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, IV., Çapa 2., Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2010.
21. Mesud Yasîn Çelkî, *Rolê Hunerên Rûnbêjîyê di Çêkirina Wênê Hozanê Kurdî de*, Hewlêr, 2012.
22. Mihsin Ehmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî, Watasazî-Rûnbêjî-Ciwankarî*, Çapa 1., Hewlêr, 2013.
23. Samî Ebdalhamîd-Bedrî Hesun Ferîd, (W.:Zahîr Mehmud Koy), *Hunerî Rewanbêjî-Watasazî*, Hewlêr, 2007.
24. Refîq Hîlmî, *Şîr û Edebiyatî Kurdî*, I., 1988.
25. Seîd Farûq Yusif Şêx Bizinî, *Binyatî Hunerî le Şîrî Ehmed Muxtar Begî Caf da*, Hewlêr, 2011.

26. Serdar Ehmed Gerdî, *Binyadî Wêney Hunerî le Şîrî Kurdîda (1970-1991)*, Silêmanî, 2004.
27. Tehsîn Heme Xerîb, *Culey Hikmet û Bînîni Nûrî 'Îrfanî Mehwi*, 1423./2002.
28. Mihemed Emîn Esrî, *Dîwanî Tayer Beg*, Bexdad, 1969.
29. Elî Kemal Bapîr, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, 1960.



KOVAR:

1. Kemal Mistefa Me'rif, *Wêne le Şîrî Qubadî Celîl Zade*, Kovara Zanîngeha Silêmaniyê Beşa (B), hejm., 12., Çapxaneya Zanîngehê, Kanûna Yekem, 2003.
2. Kerîm Şareza, *Wêney Şîrî le Honrawey Kurdîde Çon Dirust Debê û Çi Hestêk Werdegirêt*, Kowara Raman, hejm., 9., 05.03.1997.
3. Newzad Weqas Seîd-Serdar Ehmed Hisên, *Hunerî Lêqçiwandin le Şîrî Salimda*, Kovara Zanîngeha Silêmaniyê, hjm. 4., 2000.
4. *Rojnameya Rojî Kurdistan*, hj., 24., 24/02/1922.
5. Serdar Ehmed Gerdî, *Lêqçiwandin û Rolî le Dirustkirdinî Wêney Hunerî le Şîrî (Ehmed Muxtar Begî Cafî) da*, (Kovara Zanîngeha Silêmaniyê), hjê. 5.,
6. Ebdulselar Salar, "Peybirdin be Ciyawaziy Nêwan Çend Hunerêkî Rewanbêjî", (Kovara Zanîngeha Silêmaniyê), Beşa (b), Hjm. 12., Kanûna Yekemîn, 2003,

ÇAVKANİYÊN EREBÎ:

30. Ebdulezîz Etîq, *Fî El-Belaxe El-Erebiye (Ulim El-Me'anî)*, Çapa 1., Weşanxaneya Beyrût, Lubnan, 2009.
31. Ebû Hîlal El-'Esrî, *Kîtab El-Sine'teyn*, Çapxaneya Heya, Qahîre, 1952.
32. Ehmed El-Haşimî, *Cevahîr El-Belaxe*.
33. Ehmed El-Metlub, *Mu'ecem El-Mustelehet El-Belaxe we Tetewiraha Erebî*, Çapxaneya Lubnan, Lubnan, 2007.
34. Ehmed Mistefa El-Me'ranî, *'Ulim El-Bekaxe El-Beyan ve El-Me'anî ve El-Bedi'*, Beyrût.
35. Ehmed Mistefa El-Mera'î, *'Ulim El-Belaxe*.
36. El-Bilanî Elbî El-'Ebas Mihemed Bîn Yezîd El-Berd-Remezân Ebdultewab, *Seqafe El-Dîniyê*, Weşanxaneya Qahîre, Misir, Çapa 2., 1995.
37. Elî Kemal Bapîr, *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf*, Silêmanî, 1960.
38. Evdulqahîr El-Circanî, *Dla'l El-Îcaz*, (Tehqîq: Mihemed Reşîd Riza), Qahîre, 1372 Hicrî.
39. Êbn Abdulla Se'îb, *El-Misrî fî El-Belaxe El-Erebiye*, *'Ulim El-Beyan – 'Ulim El-Me'anî – 'Ulim El-Bedî'*, *Derusu El-Timarîn, El-Cezaîr Dar El-'Edî 'Eyn Milîle*.
40. Îsa 'Elî El-Makum, *El-Mef'ul fî 'Ulim El-Belaxe El-'Erebiye*, Çapa 1., Weşanxaneya Qelem, Dubeyt, El-Îmarat, 1996.
41. Kamil Hesên El-Besîr-Ehmed El-Metlub, *El-Belaxe veltebiq*, Weşanên Wezaretxaneyê, Beşa Zanistan, Çapa 1., 1982.
42. Mihemed Zexlul, *El-Mesteleh Neqdî fî Dirasat El-Quraniye*, El-Me'arif El-Cedîd, 1988.

43. Mihemed Rebî', *'Ilûm El-Belaxe El- 'Erebîye*, Weşanxaneyaya Fikir, Urdin, Çapa 1., 2007.
44. Telxîf El-Fetah El-Qazwînî, *Şerh El-Riqûqî*, Qahîre, 1940.
45. Erîsto, *Fenî Şîir*.
46. Ebdulhemîd Hendawî, Ebu Yaquub Yusif Bîn 'Elî El-Skakî, *Miftah El- 'ilûm*, Çapa 1., Çapxaneyaya El-'ilmiye, Beyrût û Lûbnan, 2000.
47. Reuf 'Usman Me'ruf, *El-Cewanib El-Belaxiye 'Înd El-Newdehî*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Silêmaniye, 2000.
48. Yusif Ebû El-'Enus, *El-Teşbiye ve El-Îstî'are*, Çapa 1., Zanîngeha El-Yermûk, Uman, 2007/1427-h.
49. Mihemed Hiseyîn Elî El-Sexîr, *El-Sure El-Feniye fî El-Meselel-Quran*, Çapxaneyaya El-Reşîd, Bexdad, 1981.
50. Helac Silîba, *El-Îstî'are ve El-Mecaz El-Mursel*, Çapa 1., Beyrût, 1988.
51. Ehmed El-Metlub – Kamil Hesen El-Besîr, *El-Belaxe ve El-Tedbîq, Wezaretaxwandina Bilind*, Çapa 1., 1982.
52. Zeyn Kamil El-Xuskî-Ehmed Mehmud El-Misrî, *Zo 'î fî El-Belaxe El-'Erebiye, Dîrasat El-Tetbîqiye Lil-Behs 'Ulim El-Beyan*.
53. Mihemed 'Elî Sultanî, *El-Muxtar mîn 'Elûm El-Belaxe ve El-'Erûz*, Çapxaneyaya 'Esa, Çapa 1., Dîmeşq, 2008.

ÇAVKANİYÊN FARISÎ:

54. Mîr Celaledîn El-Kezazî, *Beyan 1., (Zîbaşinasî Sexenê Farisî)*, Çapxanaye Mad, Çapa 9., Tehran, 1389.
55. Meryem Amilî, *Sûr Xeyl der Şîrê Firûx Firûxzad*, Çapxaneya Mens»r, Çapa 1., Tehran, 1382-Şems.
56. Ebdulhuseyîn Naşir Hesam El-‘Ulma’î Eql Ewel, *Der El-Edeb der Feni Me’anî, Beyan, Bedî’*, Çapa 3., Çapxaneya Şîrket Samî, 1340-Ş.

ÇAVKANİYÊN KİRMANCÎ:

57. OCEK, Nezîr, *Edebiyata Kurdî*, Çapa 1., Weşanên Sîtav, Wan, 2016.

TEZÊN AKADEMÎK:

58. Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Hunerî Rewanbêjî le Şîrî Nalî de*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatîye Weşandin), 2000.
59. Ebdulselam Salar, *Hunerî Rewanbêjî le Şîrî Nalî de*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatîye Weşandin), 2010.
60. Ebdulselam Salar, *Waney Qonaxî Sêyem*, Silêmanî, 2009-2010
61. Hîtle Ehmed, *Wêney Şîr Lay Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Selahedîn, 2001.
62. Îdrîs Ebdula Mistefa, *Layene Rewanbêjiyekan le Şîrî Klasîkî be Nimûne (Hemdî û Hacî Qadirê Koyî)*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), 2010.
63. Merîwan Hiseyîn Ferhan, *Ciwankarî le Şîrî Wefayîda*, (Teza Lîsansa Bilind), 2015.
64. Newzad Ehmed Usman, *Rûnbêjî le Şîrî Klasîkî Kurdîda, Be Nimûne Melay Cizîrî û Nalî*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Selahedîn, 1991.
65. Rokan Gurîl Şî'ya, *Hunerekanî Rewanbêjî le Şîrî Folklorî Kurdîda*, (Teza Lîsansa Bilind, Nehatiye Çapkirin), Silêmanî, 2014.
66. Bekir Umer Elî Me'arif, *Mitafor le Ruwangey Zimanewaniyewe*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Çapkirin), Zanîngeha Silêmanî, 2000.
67. Ebdul Selam Salar Ebdulrehman, *Wêneyê Hunerî le Şîrî Şêx Nûrî Şêx Salih da*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Weşandin), Zanîngeha Silêmanî, 2006.

68. Ferhad Kerîm Qadir, *Binyatî Wêne le Şîrî Hemdîda*, (Teza Doktorayê, Nehatiye Weşandin), Zanîngeha Silêmanî, 2009.



FERHENG:

KURMANCÎ

“Daçeka Manendinê
Hela Manendinê
Hevtîpî
Lêmanende
Manende
Manendin
Manendina Bikitekit
Manendina Cihê
Manendina Kurtkirî
Manendina Xurtkirî
Nixman di Hevgirî de
Nixman
Nixmana Kesayetî
Nixmana Rengdêrî
Sparde
Spardeya Girtî
Spardeya Vekirî
Xaze
Xazeya Hinartî”²⁴⁵

SORANÎ

Ewzarî Çiwandin/Emrazî Lêkçiwandin
Rûy Lêkçiwandin
Regezdozî
Pêçiwênraw
Çiwênraw
Çiwandin
Çiwandinî Dirêje
Çiwandinî Ciya
Çiwandinî Puxtekiraw
Çiwandinî Cextaw
Dirke le Hawgirî
Dirke
Dirke le Xud
Dirke le Sifet
Xwastin
Xwastinî Şarawe
Xwastinî Aşkîra
Xwaze
Xwazey Berbilaw

²⁴⁵OCEK, Nezîr, *Edebiyata Kurdî*, Çapa 1., Weşanên Sîtav, Wan, 2016, 71-82.

